

Du Birayên Bedirxanî: Celadet û Kamiran BEDIRXAN

(Ji aliyê xebata sîyasî û çapemenîyê ve)

1913 -1923

Seîd VEROJ



Dara: 11 | Lêkolîn-Dîrok: 02

**Du Birayên Bedirxanî:
Celadet û Kamiran BEDIRXAN
Seîd Verroj**

Gerînendeyê Giştî: Bawer Berşev

Redeksiyon: Memê Mala Hine

Mîzanpaj: juji tasarım

Berg: Sadık Hangül

©**Weşanên Dara**

Çapa Yekem: Sibat, 2018

Sertifika: 35415

ISBN: 978-605-67943-4-6

Çap:

Enes Basın Yayın ve Matbaacılık Ltd. Şti.

Maltepe Mah. Litros Yolu Fatih Sanayi Sitesi

No: 12 / 210 Topkapı - İstanbul

Tel: (0212) 501 47 63 Faks: (0212) 501 08 40

DAVUTPAŞA V.D.: 335 007 4923

Sertifika: 12469

Mirza Grup

Kooperatifler Mah. Akkoyunlu 4. Sok.

Hukukçular Apt. No:1 Yenişehir/Diyarbakır

Tel: (0533) 377 57 17

www.pirtukakurdi.com

www.darayayinlari.com

facebook.com/darayayinlari

twitter.com/darayayinlari

instagram.com/darayayinlari

mail: darayayinlari@gmail.com

Ji xeynî danasînê, bêyî destûra nivîskêr û weşanxaneyê bi tu awayî
nayê kopîkirin

Du Birayên Bedirxanî:

Celadet û Kamiran BEDIRXAN

(Ji aliyê xebata sîyasî û çapemenîyê ve)

1913 -1923

Seîd VEROJ

Lêkolîn - Dîrok

Seîd VEROJ

Sala 1966ê li gundekî Pîrana bi ser Diyarbekirê ve ji dayik bû. Dibistana navendî, lîse û unîversîte li Dîyarbekir xwend.

Xebatên wî yê li ser kurdan, di salên xwendina unîversîteyê de dest pê kirine. Di sala 1997an de bi tevî hinek hevalên xwe dest bi weşandina kovara *Warê* kir û hetanî sala 2004ê editorîya weşanê û kovara *Warê* domand. Di Newroza sala 2005an de weşanxaneyê *Bîr* damezirand û dest bi weşandina kovara *Bîrê* kir. Ji Çiriya Pêşîn a sala 2011yê vir ve kovara *Bîr*, bi awayekî dijîtal li ser navnîşana www.kovarabir.com weşana xwe berdewam dike û ew jî sernivîskar û edîtorê vê malperê ye. Di sala 2011yê de li Unîversîteya Artuklu ya Mardînê dest bi xwendina masterê kir û di destpêka sala 2014yê de bi pêşkêşkirina têza xwe ya bi navê “*Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî/ Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî*” xwendina masterê xelas kir.

Berhemên wî yê çapkirî:

- *Rêzepirtûkên Zarokan* (li ser hev 6 pirtûk, Weşanên War, Stenbol, 2001)
- *Ferheng-Vajname: Kurmancî - Hewremanî - Dimilî - Senendajî* (Seîd Veroj- Abdurehman Uçaman, Weşanên War, Stenbol, 2002)
- *Ferhengê: Kurmancî - Dimilî - Tirkî û Tirkî- Dimilî Kurmancî* (weşanên War, Stenbol, 2002)
- *Di Dîroka Me ya Nêzîk de Bûyereke Girîng: Kuştina Seîd Elçî û Dr. Şivan* (Weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2005)
- *Dadgehkirina Pêşewa Qazî Mihemed* (Weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2007)
- *Geşepêdanên Rojhelatanavîn, Sûriye û Kurdîstana Rojava* (Weşanên Doz, Tîrmeh 2012, Stenbol)
- *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî/ Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî* (weşanên Ava, Dîyarbekir, Gulana 2014)
- *Mehmed Mîhrî Hîlav û kovara Kurdistan* (Weşanên Weqfa Îsmail Beşîkçî, Stenbol, Tebaxa 2015)
- *Abdurehman Nacîm: Edîb, Şair, Perwerdekar, Hiqûqnas* (Weşanên Weqfa Îsmail Beşîkçî, Stenbol, Hezîrana 2017)
- *Mewlânzade Rifat û Rojnameya Serbestî* (Weşanên Weqfa Îsmail Beşîkçî, Stenbol, Hezîrana 2017)

Têdeyî

Pêşgotin	9
Pêşgotin	11
Kurteya Bêjeyan	14

Beşa Yekem

1. Emîn Alî Bedirxan (1851-1926)	15
1. 1. Destpêk.....	15
1. 2. Dara malbata Emîn Alî Bedirxan	17
1. 3. Lorîya Bedirxanê biçûk	21
1. 4. Hewldana serhildanên piştî Mîr Bedirxan	23
1. 5. Xebata rêxistinî û sîyasî.....	27
2. Celadet Bedirxan (1893-1951)	37
2. 1. Zarokatî û perwerdeyî.....	38
2. 2. Destpêka nivîskarîyê	40
2. 3. Beşdarîya di Şerê Giştî yê Cihanê de.....	42
2. 4. Bîranînên Şerê Giştî yê Cihanê di cebbeya Iraqê de	45
2. 5. Celadet Bedirxan û rojnameya Serbestî	50
2. 6. Di nav hejmarên berdest ên Serbestîyê de nivîsên Celadet Bedirxan	53
2. 7. Nivîsên di rojnameya Türkçe İstanbul de	54
2. 8. Kurd û sîyaseta Cemîyeta Îttihad û Terakkî (CIT).....	55
2. 9. "Îttifaq di nav kurdan de"	59
2. 10. Krîtîkek li ser çapa nû ya Mem û Zîna Ehmedê Xanî....	63
2. 11. Gera Major Noel û bûyera Meletîyê.....	70
2. 12. Xebatên li ser ziman û berhemên nivîsandî yên kurdî û rabihûrîya bikaranîna alfabeya latînî	80
2. 13. Dawîya dewrek.....	88
3. Kamiran Bedirxan (1895-1978)	91
3. 1. Destpêka nivîskarî û berhemên sereke	95
3. 2. Nivîsên di nav Serbestîyê de	98
3. 3. Nivîsên di nav Türkçe İstanbul û Îttihadê de	99
3. 4. "Meseleya millîyetê"	100
3. 5. "Mîlîtarîzm berdewam e"	104
3. 6. "We la tektumuş-şehade [Şahidîyê neveşêrin!-Ayet]"	108
3. 7. Ermenistan û Kurdistan	113
3. 8. Rewşa bîr û raya di Kurdistanê de	119

3. 9. Reformekirina zimanê kurdî.....	121
3. 10. Naveroka hinek nivîsên ciyawaz	124
3. 10. 1. Li ser perwerdehî.....	124
3. 10. 2. Tendirûstiya malê û meseleya îmarê.....	125
3. 10. 3. Qedexkirina alkolê (meşrûbê).....	126
3. 11. Dawî	127

Beşa Duyem

1. Nivîsên Celadet Bedirhan.....	133
1. 1. Serbestî gazetesine	133
1. 2. Kürdler ve İttihat [İTC] Siyaseti	133
1. 3. Zabitanın Terfihi	137
1. 4. Develer/	140
1. 5. Geçit	143
1. 6. Kürdler ve Kürdistan:	146
1. 7. Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'a Doğru-II	148
1. 8. Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'a Doğru-III	150
1. 9. Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerde İttifak	152
1. 10. Kürdler ve Kürdistan: Kürd Edebiyatı	155
1. 11. Kürdler ve Kürdistan: Kürd Edebiyatı	157
1. 12. Borazanın Kurşunu	160
2. Nivîsên Kamiran Bedirxan	165
2. 1. Kürdler: Tarihi ve İctimai Tetkikat	165
2. 2. Kürdistan'ın Hazine-i Tabiisi	168
2. 3. Kürdler Hakkında	174
2. 4. Kürd Timsaline	176
2. 5. Kürdistan -I.....	177
2. 6. Kürdistan-II	180
2. 7. Kürdistan-III.....	182
2. 8. Kürdistan-IV.....	185
2. 9. Anadolu'ya Doğru	188
2. 10. Tahsil-i Tali ve Şekl-i Lazımı	191
2. 11. Kürdistan	194
2. 12. Milliyet Meselesi	196
2. 13. Ev Sağlığı ve İmar Meselesi	199
2. 14. "We la Tektumuş-Şehade"	202
2. 15. Hala Militarizm	204

2. 16. Kürdistan Hakkında Yetkili Olmayanlar	207
2. 17. Kuholun Memnuiyet-i Resmîyesi	210
2. 18. Kürdler ve Kürdistan	213
2. 19. Kürdler ve Kürdistan	214
2. 20. Kürdler ve Kürdistan	216
2. 21. Kürdler ve Kürdistan	218
2. 22. Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerin Emelleri.....	220
2. 23. Kürdler ve Kürdistan	222
2. 24. Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerin Hissiyatı	225
2. 25. Kürdler ve Kürdistan	227
2. 26. Kürdistan ve Ermenistan Mefhumları	228
Wêne û Kopî	233
Jêder	241
a) Weşanên peryodîk.....	241
b) Pirtûk.....	243
c) Malperên Înternetê.....	246

Pêşgotin

Şaristanî, civak û welat li ser mêrên mezin û gernas ava dibin. Wan bi berxwedana xwe paşerojêke baştir ji milletên xwe re peyda kiriye. Gandî Hindistan serbixwe kir, Mandêla Başûrê Afrîka ji nû ve saz kir û bavê min Celadet Bedirxan nasnameya kurdan da wan ko zimanê me pêşkêşî me kir. Herdem digot; zimanê me nasnameya me ye û wê her û her me biparêze.

Dema bavê min çû ber dilovaniya Xwedê, ez 13 salî bûm. Lê tiştê min dît û ez li ser amade bûm, bi min re ma, bû handan û sirûstek ji hemû jiyana min re; welatperwerî, dilsozî, rastgoyî û dilpaqijiyaya wî hişt ko bibe ev dastan. Herûher baweriya wî bi doza kurdan hebû û tu carî dest ji mafê kurdan neberda û her daxwaza wî ko bi wekhevî û dadmendî bijîn weke her milletekî din. Baweriya wî ya mezin ji bo vê dozê, rê dayê ko alfebaya kurdî pêşkêş bike, ev alfebaya ko bû bingeha zimanê kurdî yê nû.

Dilovan bû ji malbata xwe re, bavekî dilbirehim bû, em li ser şanazîya kesêtiya kurdayetîya xwe hîn kirin û digot herdem şanaz bin. Ez gelek bextewer bûm ko ez di malbata xwe de bi du kesên gelek hêja re xwedî bûm; mamê min Kamiran Bedirxan herweha karekterek mezin bû di jiyana min de, wî çiraya doza kurdan piştî bavê min berdewam kir, ko ev doz gihande astên navnetewî, her bi wan baweriyên mezin û bi wê daxwaza xurt weke bavê min.

Berdewam bû bi parastina mafên me, bê ko sist bibe û jîyana xwe hemî ji bo kurd û Kurdistanê qurban kir. Li cîhanê geriya ji bo mafê kurdan bide xwiyakirin û piştrast be ji berdewamiya vê nameyê û paşerojêke baştir ji kurdan re bi dest bixe.

Wê dîrok cihê du lûtikên bilind ji çiyayên Kurdistana me ya şêrîn bide van herdû dastanan.

Ez bi hêvî me ko ev nîfşê nû doza wan berdewam bike û nameya wan bigihîne nîfşên pey wan, ji bo xewna bavê min û mamê min Kurdistaneke bihêz û yekgirtî bi cî bikin.

31.10.2016

Sînemxan Celadet Bedirxan

Pêşgotin

*“Sed qaîme û qesîde kes naykîrrê be pûlê
Rozname û cerîde kewtote qîmet û şan.”*

Hecî Qadirê Koyî

Bedirxanî bibin mewzûya xebatekê, divê dem û dewreye-ke berfireh a dîroka Kurdistanê bête lêkolandin. Ev xebata li ber destê we, neketîye bin barekî wisa giran, li ser dem û dewreye-ke kurt hatîye kirin. Armanca lêkolîna li ber destê we, hinek ronîkirina xebata civakî û sîyasî ya Emîn Alî Bedirxan û bi taybetî jî herdu lawên wî; Celadet û Kamiran Bedirxan e, di deh salên dawî yên Dewleta Osmanî de.

Her du birayên Bedirxanî, bi rizamendîya xwe tevî Şerê Balkanê û Şerê Yekemîn ê Cîhanê bûne. Di pêvajoya Şerê Yekemîn de Celadet Bedirxan, bi wezîfeya zabitê îhtîyatê li Iraqê, başûrê Kurdistanê, Qafqasyayê (Bakû) û ciyên din de karê leşkerîyê kiriye. Di nav rûpelên vê xebatê de, hûn dê hinek bîranîn û nirixandinên wî yên li ser tevger û bûyerên wê demê bixwînin.

Eger em nameya C. Bedirxan a ji bo rojnameya *Serbestîyê* nejmêrin, kar û jîyana nivîskarîya her du birayan, di salên 1913yan de dest pê kirîye. Em karin vê demê, wek dewreya yekemîn a nivîskarîya wan binavînin. Pirranîya nivîs û pirtûkên wan ên wê demê di terzê bîranîn, çîrok û helbestan de hatine nivîsandin. Ew di naveroka helbestên xwe de, cesaret û moralê didin orduyê û pesnê Îslam, Xîlafet û Osmanîparêzîyê didin. Dema em bala xwe bidin naveroka nivîs û nêrînên wan, wisa dîyar dibe ku wê demê, her du birayên Bedirxanî jî di bin bandora fikra Îslamîparêzî û Osmanîparêzî de bûne. Kamiran Bedirxan bi xwe jî li ser rewşa fikrî ya wê demê wisa dibêje; “Ez merivek bawermend bûm, min wisa pê bawer dikir ku divê berîya her tiştî dîn bête parastin.”

Piştî Peymana Mondrosê, ji bo tevgera civakî û neteweyî ya kurd rewşeke nû hate meydane û di vê rewşa nû de rêxistinên wekî Partîya Radîkala Gel, Cemîyeta Tealîya Kurdistanê, Cemîyeta Teşkilatê Îçtîmaîyye ya Kurd, Partîya Milleta Kurd

û Partîya Demokrata Kurd û rêxistinên wd. hatin dameziran-
din. Bi xebat û armanca sîyasî ya van rêxistinan ve girêdayî,
kovar û rojnameyên wekî *Jîn, Kurdistan û Serbestî* hatin we-
şandin. Hecî Qadirê Koyî sî-çil sal berîya weşandina kovar û
rojnameyên navborî, heta berîya weşandina cerîdeya *Kurdis-
tanê jî*, pêdivî û girîngîya weşanên bi vî rengî anîbû ziman û
gotibû: “*Sed qaîme û qesîde kes naykîrrê be pûlê/ Rozname û
cerîde kewtote qîmet û şan.*” (*Sed qaîme û qesîde kes nakîrrê bi
pûlek/ Rojname û kovar bûne bi qîmet û şan.*)

Emîn Alî Bedirxan wek damezirêner û rêvebir, di piranî-
ya van rêxistinan de cî digire. Celadet û Kamiran Bedirxan
jî, dibin endamên çalak ên van rêxistinan û bi giranî di warê
çapemenîyê de kar dikin. Xebata di rojnameya *Serbestîyê* de,
dibe destpêka karê rojnamevanîya profesyonel a birayên Be-
dirxanî. Celadet Bedirxan dibe redaktorê alîkar ê rojname-
ya *Serbestîyê* û Kamiran jî wek nivîskarê herdemî kar dike.
Nivîsên wan ne tenê di nav rûpelên *Serbestîyê* de, di rojna-
meyên wekî *Türkçe İstanbul* û *Îctîhada* Abdullah Cevdet û wd.
de jî hatine weşandin. Di weşanên navborî de; zimanê nivî-
sandina her du birayan jî ne bi kurdî ye, bi turkî ye.

Di nav vê pirtûkê de 35 meqaleyên birayên Bêdirxanî
hene û bawer dikim piştî çapa yekemîn, cara pêşîn e ku li ser
hev têne çapkirin. Naveroka van meqaleyên wan ên di nav vê
pirtûkê de, ji bo ronîkirin û rastxwendina tevgera neteweyî
û sîyasî ya kurd a navbera salên 1918-1922yan pîrr girîng e.

Ji nivîs û meqaleyên wan dîyar dibe ku hetanî salên 1918yê
jî, têgehîştina wan a sîyasî di bin tesîra fehma Osmanîparêzî
ya panîslamîst de bûye. Bidestxistina mafên neteweyî yên
kurdan, di nav yekîti û parastina Dewleta Osmanî de dibînin.
Kamiran Alî Bedirxan di nivîseke xwe ya sala 1918yê de di-
bêje: “Qenaetêke giştî heye ku parastina kurdan, parastina
menfeatên turkan û Dewleta Osmanî ye.”

Piştî pêkhatina Peymana Mondrosê, ji alîyê fehma sîyasî
û rewşenbîrî ve, şexsîyetên ku pîrr zêde tesîr li ser her du bi-
rayên Bedirxanî kirine, Abdullah Cevdet û Mewlanzade Rifat
in. Ji alîyê gihîştina fikra sîyasî û rêxistinî ve, em dikarin vê

demê wek dewreya duyemîn a guhartinê binavînin. Ev guhartin, di çarçoveya nirixandina rewşa çapemenîyê de, ji alîyê Kamiran Bedirxan ve weha hatîye nivîsandin: “Me wisa pê bawer dikir û vê bawerîyê jî tesellî [dilaramî] dida me; ku li neyeke me ya çapemenîyê heye, bi rastî jî muqtedîr e û muqtedîrê jihevkirina heq û heqîqetê ye, tiştê kêrhatî û nekêrhatî ye. Lê hezar şerm û mixabin, em têgehîştin ku em bi awayekî pirr dilşewat hatine xapandin.” Ji vê têgehîştin û guhartinê şûn ve, êdî birayên Bedirxanî bi awayekî çalak ji bo pêşxistina tevgera sîyasî-neteweyî û çapemenîya kurd kar dikin.

Wekî gelek sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurdistanê, di dawîya salên 1922an de, ji alîyê rêvebirên komarê ve “Ji bo Emîn Alî Bedirxan û sê lawên wî; Sureyya, Celadet û Kamiran jî cezaya darvekirinê hate birrîn. Vê biryarê, wan bêgav kir ku terka Stenbolê bikin. Pêşiyê Emîn Alî Beg, paşê jî her du birayên Bedirxanî; Celadet û Kamiran, di 27 Îlona 1922an de cara dawîyê bi keştîyekê bendera Stenbolê terk kirin.

Di peydabûna vê berhemê de keda gelek merivên hêja heye; Sînemxan Celadet Bedirxan, bi piştgirîya wêne û dokumentên arşîva xwe ya taybet, ev xebat dewlemendtir kirîye û her weha bi nivîsandina pêşgotinek, bîranîna bavê xwe Celadet Beg û mamê xwe yê Kamiran Beg zindî kirîye. Mamoste Cemîl Amedî, bi wergera metnên osmanî, bûye yek ji kedkarên peydabûna vê berhemê, Mesûd Serfiraz di temînkirina orjînalên metnan, pêşniyar û balkişandina li ser hinek xalan de, A. Meretowar û M. E. Hêvîdar bi hesasiyeteke zimanewîniyê di rastnivîsînê de nûra çavan rijandine. Destxweşiyê li hemû kesên kedkarên vê xebatê dikim û dibêjim mala wan ava be.

Di vê xebata li ber destê we de, sî û pênc meqeleyên birayên Celadet û Kamiran Bedirxan, piştî esrekê, ji nû ve li ser hev dertên pêşberê xwendevan û lêkolîneran. Ger vê xebatê hinekî din ronahî dabe rewşa sîyasî, komelayetî û rewşenbîrîya wê demê ya civaka kurd, bi kêmanî be jî gehiştîye armanca xwe. 15.02.2017

Seîd VEROJ

Kurteya Bêjeyan

CTK	: Cemîyeta Tealîya Kurdistanê
CTÎK	: Cemîyeta Teşkilatê Îctîmaiyye ya Kurd
CÎT	: Cemîyeta Îttihad û Terakkî
CTÎ	: Cemîyeta Teşkilatê Îctîmaiyye
CTTK	: Cemîyeta Teavûn û Teraqî ya Kurdan
CNMK	: Cemîyeta Neşrê Mearif a Kurd
h.	: Hejmar
KÎK	: Komîteya Îstîqlala Kurdistanê
KMF	: Kürd Millet Fırkası
PMK	: Partîya Milletê Kurd
KPK	: Komeleya Pêşxistina Kurdistanê
KNMC	: Kurd Neşr-i Mearif Cemiyeti
KKBN	: Komeleya Kurd a Belavkirina Neşrîyatê
PDK	: Partîya Demokrat a Kurd
PRG	: Partîya Radîkal a Gel
Tİ	: Türkçe İstanbul (gazetesi)

Beşa Yekem

1. Emîn Alî Bedirxan (1851-1926)

1. 1. Destpêk

Dema Mîrnişnîya Botan û malbata Bedirxanîyan bibe mewzûya lêgerîn û lêkolînekê, bi kêmanî pêwîst e demek berfireh a dîroka nêzîk a Kurdistanê bête lêkolandin. Ger em vê demê, ji serhildana Mîr Bedirxan (1846) bidin destpêkirin û hetanî belavbûna Xoybûnê (1947) hesab bikin, serdemek yanî sed sal derdikeve pêşîya me. Di dîrokê de lêkolîna sed salan, îdeyek mezin e û ji bo wê, xebatek pirr berfireh divê. Ji ber vê yekê, ez neketime bin barekî weha giran.

Tenê lêkolînek li ser dem û dewreya ber bi dawîya serdema 19an û destpêka serdema 20an bête kirin jî, navê gelek kesayetîyên Bedirxanîyan derdikevin pêşîya me. Kesayetîyên wekî Emîn Alî Bedirxan, Abdurehman Bedirxan, Mîdhed Mîqdad Bedirxan, Abdurezaq Bedirxan, Kamîl Bedirxan, M. Salih Bedirxan, Şamîl Bedirxan, Xelîl Rehmî Bedirxan, Necîp Paşayê Bedirxanî, Sureyya Bedirxan, Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan navdarên xebata sîyasî, rêxistinî, kulturî û dîplomatîk a wê demê ne.

Mexseda vê xebatê; bi awayeke giştî bîrxistina rola Emîn Alî Bedirxan û zarokên wî di nav tevgera sîyasî û civakî ya

Kurdistanê de, bi taybetî jî xebata Celadet û Kamiran Bedirxan a di navbera salên 1913-1923yan de ye. Di navbera vê demê de, bi giranî li ser xebata wan a piştî salên 1918an û nivîsên wan ên di nav rûpelên rojnameya *Serbestî, Türkçe İstanbul* û *Îctîhadê* de hatîye rawestandî.

Du xusûsîyetên girîng ên vî dewreya nû hene: Ji alîyekî ve rêxistinên civakî û neteweyî yên dema modern têne damezîrandin; ji alîyê din ve jî girîngîya xebata çapemenî û nivîsandinê derdikeve pêş. Pêdivîya vê yekê, di gengeşe û nivîsarên salên piştî ragehandina Meşrûtiyeta Duyemîn de, hîn bi zêlalî xuya dibe. M. Salih Bedirxan, di nivîseke xwe de lawazîya çapemenîya kurd, wek kêmasîya tewr mezin dibîne û li ser têkilîya çapemenî û rêxistinbûnê weha dibêje: "Milletên ku girîngîya pêdivî nedin çapemenîya xwe û milletên ku rayagiştî ya wan xwedîyê rêyek durist û metanetê nebe, hêza wan jî wekî hêza sirûştî ya ava ku li zevîyeke berfireh belavbûyî, heder û wenda dibe. Lewra milletên wisa, ji ber vê xefletê, daîmî ji xeternakîya bêrêxistinmayin û têkçûnê xelas nabin."¹

Lêkolîna vê demê, ji alîyê tevgera nasyonalîzma kurd û çêbûna rêxistinên modern ên kurd ve, pirr girîng e. Ku em li pêvajoya geşbûna bûyerên civakî, sîyasî û neteweyî yên vê demê binêrin; li pey hev damezirandina cemiyetên kulturî û sîyasî, weşandina rojname û kovarên kurdî, li ser navê kurd û Kurdistanê çêbûna rêxistinên sîvil û sîyasî, çalakîyên rewşenbîrî û civakî yên cûre bi cûre, hemû xebatên destpêka dewreyeke nû didin nîşandan. Eger em li gor zimanê sîyasî yê demê ji vê dewra nû ya tevgera civakî û sîyasî ya kurd re li navekî kategorîk bigerin, em dikarin vê demê wek destpêka tevgera modernbûna kurdan jî bi nav bikin. Tevgera modernbûna kurdan, bi pêşengîya rewşenbîr, ûlema û arîstokratên xwendekar dest pê kirîye û li ser bingeheke kulturî û sîyasî geş bûye. Birayên Celadet û Kamiran Bedirxan jî bi xebatên xwe yên kulturî, sîyasî û çapemenîyê bûne du çalakvan û aktorên girîng ên vê dewreya nû.

¹ Salih Bedirhan, *Kılıçtan evvel kalem [Berîya şûr qelem], Rojî Kurd, h. 3, Weşanên War, Stenbol, 2002, r. 77*

1. 2. Dara malbata Emîn Alî Bedirxan



Mihemed Emîn Alî Bedirxan

Emîn Alî Bedirxan, kurê Mîr Bedirxan e. Mîr Bedirxan, mîrê dawîn ê Mîrnişîniya Botan bû û piştî têkçûna serhildana 1846an ji alîyê Dewleta Osmanî ve tête destgîrkerin û wî bi tevî hemû endamên malbatê, rêdikin Stenbolê. Mîr Bedirxan şeş meh li Stenbolê girtî dimîne, paşê biryara sirgûnkirina wî tête derxistin û wan bi tevî hemû endamên malbatê sirgûnê girava Girîdê dikin.

Dema ku ew bi malbatî li qeza Xaniyeya girava Girîdê di sirgûniyê de bûn, di sala 1856an de li hemberê Dewleta Osmanî serhildanek yunanîyan çê dibe. Mîr Bedirxan ji bo têk-birina serhildanê, bi çekdarên xwe ve alîkarîyeke girîng dide Dewleta Osmanî û ji ber vê alîkarîyê, destûra vegeza wî ya ji bo Stenbolê tête dayin.

Piştî ku Mîr Bedirxan ji Girîdê vegerandin Stenbolê, “Li vê derê heft salan dimîne.”² “Di sala 1866an de ji bo wezîfeyek fermî çûye Şamê û di sala 1870ê de, di 65 salîya xwe de çû ser dilovanîya xwe. Gora wî, li Şamê di taxa kurdan de ye û nêzîkê gora Seleheddînê Eyûbî ye.”³ Mehmed Uzun dibêje; “Gora wî, li goristana Hezretî Mewlana Xalid e û li ser kêla gorê tarîxa mirinê, 1868 hatîye lêkirin.”⁴

Mihemed Emîn Alî Bedirxan ê lawê Mîr Bedirxan, di sala 1851ê de li Girîdê ji dayik bûye. Dema zaroktîya wî, li giravên koçberîyê de derbas bûye. Perwerdeyîya hiquqê dîtîye û di wîlayetên cûr bi cûr ên dewleta Osmanî de dozgerî û dadgerî kirîye. Di destpêka salên 1880an de bi jinek çerkez re zewicîye. Piştî bûyina lawê wî yê Sureyya, dayika wî ya çerkez mirîye. Di helbesteke wî ya ku paşê bi navê “*Xîtabek ji bo Çerkesa min*” hatîya nivîsîn de, dîyar dibe ku gelek hez ji malxweya xwe kirîye û pîrr li ber mirina wê ketîye. Di helbestê de hestên xwe weha anîye ziman:

“Xîtabek ji bo Çerkesa min

Tîra qederê canê min diêşîne,
Pîrr dirêj bû veqetandina me êdî bes e,
Heyata min bêxem û bê te derbas nabe.
Ez xerîbek derbeder im, bêkes im,
Tu li ku yî zewqa heyata min, Çerkesa min.

² Lütîfî (Ahmed Ramîz), *Emir Bedirhan, 20. Yüzyıl Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek*, bgst Yayınları, İstanbul, 2007, r. 88

³ Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1999, r. 93

⁴ Mehmed Uzun-Rewşen Bedirxan, *Defter-i Âmalım*, Belge Yayınları, İstanbul, 1998, r. 23



**Mihemed Emîn Alî Bedirxan, Semîha Bedirxan (hevjîna wî) û
Mûzeyena keça wî**

Kî bû sebeb ecêb, webalê kî ye,
Agirê jihevûnê hîna jî nemirîye,
Ji van zehmetîyan bedena min bûye wek xeyalekî.

Ez xerîbek derbeder im, bêkes im,
 Tu li ku yî zewqa heyata min, Çerkesa min.
 Ji vê nexweşîya giran re dê mirin çi bike,
 Ez karim li hember her êş û elemê sebir bikim,
 Dema em bigehin hev, dê ji nû ve heyat dest pê bike.
 Ez xerîbek derbeder im, bêkes im,
 Tu li ku yî zewqa heyata min, Çerkesa min.

12yê Adara 1316 (M- 25ê Adara 1900)⁵

“Emîn Alî Beg ji mirina jina yekem şûn ve, zewaca duyem dike û vê carê jî bi navê Semîha careke din bi jineka çerkes re dizewice. Di zewaca diduyan de jî şeş zarokên wî çêdibin; pêncê wan lawîn û yek jî keçik e: Celadet, Kamiran, Tevfîk, Hîkmet, Safder û Mezîyet.”⁶ Lawekî wî yê bi navê Bedirxan, ji ber ku di biçûkayî de mirîye, ew bi giştî nayê jimartin.

Li gor agahdarîya hinek endamên malbatê, dara malbata Emîn Alî Beg weha hatîye nîşandan:

“Emîn Alî Bedirxan:

1. Sureyya
 - a- Qudret: Nafîhe, Nûzad, Huzeyme, Gazî, Sureyya
 - b- Heqî
2. Mezîyet
3. Celadet Alî
 - a- Dr. Cemşîd
 - b- Sînemxan
4. Kamiran Alî
5. Tevfîk Alî Çinar
 - a- Sefter
6. Hîkmet

⁵ *Sînemxan Celadet Bedîrxan, Arşîva taybet. Orjînalê destnivîsa helbestê bi zimanê osmanî ye, bi tevî transkrîpsiyaona wî di “beşa pêncem” de ye.*

⁶ *Prens Sureyya Bedirxan, Kürt Davası ve Xoybun, Med Yayınları, İstanbul, 1994, r. 8*

a) Bedirxan Çinar: Gûngor, Alî

b- Nerîman

7. Safder

8. Bedirxan”⁷

Ji zarokên Emîn Alî Beg ê bi navê Bedirxan, di hijdeh mehîya xwe de li menfaya keleha Ekayê diçe ser dilovaniya xwe û mirina Bedirxan gelek tesîr li Emîn Alî Beg dike. Celadet Beg li ser mirina birayê xwe dibêje: “Ev brayê ku xwedê di menfayê de da û di menfayê de standibû. Ev birayê biçûk û delal ko di nav sê-çar saetan de ser ejnûwên bavê min, di Keleha Ekayê de mir.”⁸

Ev lorîya jêrîn, di sala 1906an de li ser Bedirxanê lawê wî hatîye nivîsandin.

1. 3. Lorîya Bedirxanê biçûk

“Delalîya Zarowan

1

Binive xweşiya dil û du çavan
Dadê ji te re her rû nighban
De zû tu mezin bibî Bedir-Xan
Binive kezeba min binive lo! lo!

2

Hişyar mebe, niho ne qenc e
Mehdik ji te re bizane genc e
Bê xew mebe paşiya wê renc e
Binive kezeba min binive lo! lo!

3

Xweşhal î wekî kevok û berxan
Fekrandina te melek jî heyran
Pak e neseba te dadê qurban
Binive kezeba min binive lo! lo!

⁷ Malmîsanij, *Cizira Botanî Bedirhaniler*, Avesta Yayınları, 2. Baskı, 2000, İstanbul, r. 90

⁸ Celadet Alî Bedir-Xan, *Lorîya Bedir-Xan*, Hawar, no: 5, Şam, 20ê Tîrmeh 1932, Çapa hejmarên 1-9, Amedekar: Mihemed Bekir, Sweden, 1987

4

Dewra felekê li ser me kîn e
Bextê me reş e, kezeb birîn e
Mesken ji me re niho nivîn e
Binive kezeba min binive lo! lo!

5

Ne mal û ne saxî û ne rehet
Talan kirine hemî ji mihnet
Dişwar e gelek belayê xurbet
Binive kezeba min binive lo! lo!

6

Çerxa felekê wekî nesî e
Ho nabe Xwedê gelek rehîm e
Rûja xweşiyê dibit kerîm e
Binive kezeba min binive lo! lo!

7

Hewqas tu mebêje ev çî hal e
Bê sebr mebe welê menale
Ewn û kerema Xwedê heval e
Binive kezeba min binive lo! lo!

Emîn Alî Bedir-Xan, Sparte/1906⁹

Celadet Bedirxan dibêje dema ku rojnameya *Roja Nû* ji min nivîsarin xwest, dilê min hebû çavên xwe li borîyê bigerînim û bîrekî bav û mamekî xwe bi vê hencetê vejînim. Rojname kurdî a pêşîn berî 45 salan, yanî di sala 1898an de, li Misrê belav bûye: Di wê salê de mamekî min Mîdhet Beg, ji Stenbolê revî û çû bû Misrê. Mîdhet Beg di Qahîrê de bi zimanê kurdî rojnameyek derêxist: *Kurdistan*. *Kurdistan* rojname kurdî a pêşîn e.

Welê dixuye ku hingê, Mîdhet Beg, ji birayê xwe yê mezin, Emîn Alî Beg, yê ko hingê li Stenbolê bû, nivîsan xwesti bûn. Emîn Alî Beg, ji birayê xwe yê kiçik re, di nav nivîsarine din

⁹ *Emîn Âlî Bedir-Xan, Delalîya Zarowan, Hawar, h. 5, Çapxana Teraqî, Şam-1932, r. 4*

de, teqrîzek jî rêkiribû, lê ne bi navê xwe, ji ber ko nikarî bû, lê belê bi navê “**Lawê Şêx E. Fetah**”.

Ev e teqrîza bavê min:

Pêrûz ji te re hezar cara
Ev deng e niho li nav yara
Mizgînîya vê cerîdeya qenc
Şabaş dibîtin çîqa hebit genc
Ev şixlê mezin te kirye bid’et
Cara ewilî te kirye himmet
Ev rehbera qenc te danî binyad
Kirmanc hemî te kirne îrşad
Vê marîfetê tu ca nehîle
Daîm ji te re miîn resûl e.
Roja ko cerîde tête bajar
Her der dibitin mîsalê bazar
Çîqa hebîtin li şehîrî ekrad
Qewlê xweşîya te kirne mi’tad
Rûhanîya bab û kal û ecdad
Pê vê hinerê te kir niho şad
Beybûnîya dewleta te geş bit
Qasî tu hebî dilê te xweş bit.”¹⁰

1. 4. Hewldana serhildanên piştî Mîr Bedirxan

Piştî tevger û serhildana Mîr Bedirxan, çend carên din jî serhildanên Bedirxanîyan çêbûn. Ezdîn Şêrê ku di tevgera Mîr Bedirxan de derbasê alîyê Dewleta Osmanî bû, di sala 1853an de bi xwe li hemberê dewletê serî hilda û nêzîkê deh salan desthilatdariya wî ya li herêmê dewam kir û paşê têkçû.

Ji têkçûna tevger Mîr Bedirxan û nefikirina wan a ji bo girava Girîdê, çûyin û vegera Kurdistanê, ji endamên malbata Mîr Bedirxan re qedexe bû. Lêbelê dil û bala wan her li ser

¹⁰ C. A. Bedir Xan, *Roja Nû, h.3, Gulana 1943, Bêrût. Weşanên Jîna Nû, Sibata 1986, Uppsala*

Kurdistanê bû. Li gor agahdarîyên nameyek Bedirxanîyan, gelek caran hewldanên ji bo çûyina Kurdistanê û ji nû ve saz- kirina Mîrnişînîya Botan çêbûne.

Piştî bidawîhatina şerê Rus-Osmanî yê sala 1877an û berî- ya destpêkirina Tevgera bi serokatîya Şêx Ubeydullahê Nehrî (1880), rêxistinkirina tevgerê nû ji alîyê Osman û Husên Begê Bedirxanî ve di salên 1879an de têtê kirin. Di demeke kurt de bandora tevgerê li herêmên wekî Zaxo, Çolemêrg, Amêdî, Mêrdîn û Mîdyatê belav dibe. Navend û destpêka tev- gera birayên Bedirxanî, dîsa herêma Cizîra Botan û hawîr- dorê wê bûn. Bi tevdir û mudaxaleyeke dijwar a hikumeta Serayê, serokê tevgerê Husên Beg hate girtin û tevgera wan jî têkçû.¹¹ Lêkolîner Hasan Yıldız li ser vê tevgerê dibêje: “Di sala 1877an de ji malbata Bedirxanîyan Osman û Hisên Paşa, ji bo sazkirina Mîrnişînîya Botan diçin Cizîrê. Piştî ku Sultan Abdulhemîd pê dihese, Behrî Paşayê birayê wan rê dike pey wan da ku wan îqna bike û vegerîne Stenbolê. Her du bira, ji bona ku careke din xwîn neye rêtin vedigerin.

Hewldanên ji bo çûyina Kurdistanê û ji nû ve rêxistinkiri- na tevgera kurd, di sala 1892an de ji alîyê Xelîl û Ebdurezaq Bedirxan Beg ve jî têtê ceribandin lê bi ser nakeve.”¹²

Emîn Alî Beg, “Dema ku nefîkirîyê mecburî yê Stenbolê bû, du caran hewl da ku bireve, lakîn bi ser neket; carekê li Trabzonê û cara din jî li Beyazidê piştî berxwedanekê hate girtin.”¹³ Sureyya Bedirxan dibêje: “Piştî têkçûna Tevgera Şêx Ubeydullah, di sala 1889ê de, her du lawên Mîr Bedirxan; Emîn Alî û Mîdhet Beg ji bo rêxistinkirina tevgera kurd ji Sten- bolê bi keştiyekê çûn Trabzonê da ku bigîjin Kurdistanê. Kurd ji hatina wan agahdar bûn û mifrezeyeke kurd çûbû herêma “Cewîzlik”ê ji bo pêşwazîkirina her du Mîran. Her du alîyan bêtengasî hev dîtin û di bin serokatîya Mîrên xwe de ber bi Erzerumê ve ketin rê. Lêbelê di vê navberê de, Mistefa Nûrî

¹¹ Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi, Nûbihar Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2012, r. 222- 223. Bn.Celîlê Celîl, 1880 Kürt Ayaklanması Şeyh Ubeydullah Nehri, Avesta Yayınları, İstanbul, 2014, r. 54*

¹² Hasan Yıldız, *20. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyasası ve Modernizm, Doz Yayınları, Çapa 2., Stenbol, 2006, r. 98-100, Neqilkirina ji Dosya Kurdistanê, c. 12, r. 60*

¹³ Edward William Charles Noel, *Kürdistan 1919, Avesta Yayınları, İstanbul, 1999, r. 94*

Efendî yê ku bi karê çûyina wan re mijûl bû û xeberguhêzîya wan dikir, ji ber tirsê xwe, alîyê Serayê jî bi dizîka ji vê bûyerê agahdar kiribû. Lakîn birayên Bedirxanî îhtîmala çêbûna îxanetek wisa hesab nekiribûn. Lewma li gor nexşeya dîyarkirî, di îstiqameta çûyina xwe de rêya xwe domandin hetanî Bayburdê. Lê di başûrê Bayburdê de ji alîyê du mifrezeyên leşkerî yên Erzerum û Ezirganê ve li pêşîya wan kemîn hatibû danîn û her du Mîr bi mifrezeya xwe ve dikevin nav kemînê. Bi pevçûnek dijwar xwe digehînin çiyayên qeza Madenê. Mixabin li vê derê ji alîyê leşkerên tirk ve têne berdestkirin.”¹⁴ Paşê “di sala 1910an de Bedrî û Mîthed Beg, di salên 1917-1916an de Hisên Paşa, Silêman û Hesên Began jî hewl dan biçin Kurdistanê, didoyên wan ji alîyê hikumeta tirk ve hatin kuştin.”¹⁵

Wekî li jorê jî hate gotin Emîn Alî Beg, perwerdeyîya hiquqê dîtibû û li wê demê li Edlîyeyê kar dikir. Salên 1903-1904an li Selanîkê, paşê li Anqere û Konyayê (1906)¹⁶ kar dike û dawîyê ji mifetîşîya Edlîyeya Edirneyê teqawît dibe. Nakdîmon dibêje: “Emîn Alîyê bavê Kamiran û nevîyê Mîr Bedirxan, di dewleta Osmanî de serokatîya Mahkemeyeke bilind kirîye û bi xwe jî abûqat bû.”¹⁷

Li jorê jî hate gotin, “çûyina malbata Bedirxanîyan a Kurdistanê, ji terefê Osmanîyan ve hatibû qedexekirin. Ji ber vê yekê, Emîn Alî Bedirxan ji bo ku zarokên xwe bi çand û zimanê Kurdî mezin bike, ji Kurdistanê dengbêj, mamoste, nivîskar û helbestvan dianî. Yek ji wan jî helbestvanê navdar ê kurd, Hecî Qadirê Koyî bû.”¹⁸

Di 23yê Adara 1906an de, ji ber bûyera kuştina şehremînî Ridvan Paşa, ku Abdurezaq Bedirxan û apê wî Alî Şamîl Bedirxan wek kiryarê vê bûyerê dihatin sûcdarkirin. Dîsa bi fermana Abdulhemîd biryara nefîkirina (koçberkirina) hemû

¹⁴ Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu: Kökeni ve Nedenleri*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009, r.41-42

¹⁵ Hasan Yıldız, J. b., r. 99

¹⁶ Malmîsanîj, *Cizîra Botanli Bedirhaniler*, Avesta Yayınları, 2. Baskı, 2000, İstanbul, r. 130

¹⁷ Nakdîmon, *Şalom; Irak ve Ortadoğu'da Mosad*, Elips Yayınları, Ankara, 2004, r. 9

¹⁸ Mihemed Bekir, *Pêşgotina ji bo çapa hejmarên: 1-9ê kovara Hawarê*, Weşanxana Hawar, Sweden, 1987, r. 20

mêrên malbata Bedirxanîyan tête derxistin; pêşîyê ji Stenbol û gelek wîlayetên din ên wekî Hayfa, Yemen, Beyrûd, Rodos, Nablus, Kayserî, Isparta, Konya û Yozgatê ve ji bo wîlayet û welatên Afrîka û Rojhelata Navîn têne nefîkirin. Mustafa Turan dibêje: “Piştî jêbirina rutbe û apoletên Alî Şamîl Paşa, çiqas kurdên mensûbê Bedirxanîyan hebûn, hemû koçberê Trablusgarbê kirin.”¹⁹ Abdurrezaq Bedirxan li ser vê bûyerê dibêje: Hemû endamên malbata min yên li Konstantînopolê bûn, zêdeyê sê hezar mensûb û xizmên me, pêra jî merivên me yên dûr, yên ku li hemû aliyên Tirkîyeyê diman, hêdî hêdî hatin girtin û ew di girtîxane û kelayan de cîwar kirin, hinek jî sirgûn kirin.”²⁰

Di dema vê nefîkirinê de, bi tevî sêzdeh zarokên Bedirxanîyan Sureyya, Celadet û Kamiranê lawên Emîn Alî Beg, di klasên cihê cihê de xwendevanên Mekteba Sultanî ya ku îro bi navê Galatasaray tête bi navkirin bûn. Halîde Edîb Adıvar ku keça jina pêşîn a Alî Şamîl Bedirxan bû, dibêje: “Li ser kuştina Şehremînî Ridvan Paşa, zarokên duwanzdeh salî jî di nav de, li Stenbolê mêrek Bedirxanîyan nemabû. Pirranîya wan ji vê bûyerê jî neagahdar bûn.”²¹ Ahmed Ramîz jî vê bûyerê dişibîne muamele û kiryarên Abasîyan yên li bajarê Mekkeyê û dibêje: “Ew kiryar û tevgerên ku vê dawîyê ji bo Bedirxanîyan rewa hatine dîtin; darbeyeke namerd e û ji bo tunekirinê ye, di vir de dîn kirine wesîteya tehrîbkirina welat.”²²

Nefîkirina vê carê, wekî ya Girîdê demek dirêj najo, piştê îlankirina Meşrûtîyetê, Bedirxanî carekî din vedigerin Stenbolê.

¹⁹ Mustafa Turan, 31 Mart'ın Gizlenen Yüzü, Derin Tarih Kültür yayınları, İstanbul, 2015, r.32

²⁰ Prof Dr. Celîlê Celîl, Autobiyagrafiya Ebdurrezaq Bedirxan, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2000, r. 16

²¹ Halîde Edîb Adıvar, Mor Salkımlı Ev, çapa 3, Can Yayınları, İstanbul, 2014, r. 168

²² Lütîfî (Ahmed Ramîz), Emir Bedirhan, 20. Yüzyıl Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek, bgst Yayınları, İstanbul, 2007, r. 70

1. 5. Xebata rêxistinî û sîyasî

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta Duyemîn (24ê Tîrmeha 1908), efû hate îlankirin û Bedirxanî dîsa vegeŕîyan Stenbolê. Emîn Alî Bedirxan jî piştî ragehandina Meşrûtiyetê, vedigere Stenbolê. Di nav xebata Cemîyeta Teavûn û Teraqî ya Kurdan (CTTK) de cî digire û dibe damezirênerê vê cemîyetê.²³ Herweha dibe damezirênerê Cemîyeta Neşrê Mearîf a Kurd (1908).²⁴ Piştî Şerê Yekem ê Cîhanê jî, di nav xebata gelek rêxistinên kurd û yên mixalîfên Îtîhad û Terakkî de cî digire. Digel Seyîd Abdulqadir di nav xebata Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (CTK) de cî digre û herweha dibe damezirêner û serokê duyemîn ê CTKê.

Di sala 1918an de Emîn Beg, Mewlanzade Rifat û hin hevalên wan “di 22yê Teşrîna Ewela 1918yê de Partîya Radîkal Avamê”²⁵ damezirandibûn ku serokê vê partîyê Mewlanzade Rifat bû û paşê bi hev re tevî rêxistina Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (CTK) bûne. Her sê kurên Emîn Beg: Sureyya, Celadet û Kamiran Bedirxan jî endamê CTKê bûn. Di heman demê de li Qahîreyê jî, sala 1918 bi navê Komîteya Îstiqlala Kurdistanê rêxistinek nû ji aliyê Sureyya yê kurê Emîn Alî Beg ve hatibû damezirandin.

Emîn Alî Beg serkirdeyekî girîng ê CTKê bû û li ser navê cemîyetê beşdarê gelek hevdîtinên sîyasî û dîplomatîk bûye. Li gor raporta hejmar “FO 371/4192” ya Komîserê Bilind ê Îngiliz, di 10ê Tîrmeha 1919an de, di navbera heyeta Komîteya Kurd û Hikumeta Tirk de li ser vexwendina endamê koma wezîran Heyderî Zade civînek hatîye sazîkirin. Ji aliyê hikumetê ve Heyderîzade, Abuk Paşa yê wezîrê berê parastinê û Avnî Paşa yê wezîrê herbîyeyê; heyeta Komîteya Kurd jî pêk

²³ Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu: Kökeni ve nedenleri*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009, r. 43

²⁴ Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler (1918-1922, Cilt: 2, İletişim Yayınları*, r. 224.

²⁵ J. b., r. 105. *Listeya damezirêner û rêvebiran: Reîs: Mewlanzade Rifat, Emîn Alî Beg (malnişin e ji mifetişîya malîyeya Edirneyê), Mazlûm Beg (rojnamevan), Mehmed Faîk Beg (Bazirgan), Ragîp Beg (xwedîyê rojnameya Mûdafaa), Babanzade Aziz Beg.*

hatibû ji Seyîd Abdulqadir, Emîn Alî Bedirxan, Mewlanzade Rifat, Yarbay Emîn Beg û Bînbaşî Awnî.

Di vê civînê de, bi kurtebirî li ser meseleya ermenan û dahatûya kurd-Kurdistanê gotûbêj çê dibin. Di pêdeçûna civînê de Emîn Alî Beg dibêje; “Gelo hikumeta we dikare ji vê civînê şûn ve hebûna Kurdistanê nas bike û hikumeteke otonom qebûl bike?” “Eger hûn dixwazin îmtiyaz bidin Kurdistanê, ya baştir ne ew e ku hûn ji nûha ve walîyekî kurd û wezîfedarên kurd rêkin Kurdistanê?

Avnî Paşa soz dide ku dê ji bo Kurdistanê walîyek kurd û wezîfedarên kurd bêne tayînkirin.”²⁶

Ev biryar, di nav çapemenî û milletê kurd de hêvî û bendewarîyekê peyda dike. Bi ihtimaleke mezin ji ber vê, Celadet Bedirxan di nivîsa xwe ya bi navê “*Memûrên kurd ji Kurdistanê re*” de, pêdivîya pêkanîna vê biryarê tîne ziman û dibêje:

“Ji berê ve bona wîlayetên Kurdistanê memurên kurd bihatana tayînkirin, gelo wê netîceyek cîyawaz peyda nebûya? Em bê tereddût dibêjin belê. Lewra memurê kurd, ji ber ku bi kurdî dizane, derdê milletê baştir têdigîje û baştir jî derman dike. Ku ev bibûya, dê berê jî û nûha jî kurdan, li hemberê memûran wisa xwe bîyanî û bêxwedî nedîta. Dema zordestî û neheqî li wan bihata kirin, ji ber ku zimanê wî têdigehîşt, karibû heqê xwe hîn baştir û hîn bi xurtî mûdefea bikira û pêşî li binpêkirina edaletê bigirta. Lewra ku memûr karibe wî têbigîje, dibe yê wî/wê. Pisporekî Rojavayî jî dibêje: Yê ku min têbigîje dibe yê min.”²⁷

Noel jî dibêje “Di sala 1919an de tirkên xwest Emîn Alî Beg wek walîyê Dîyarbekir tayîn bikin, lêbelê dizanîn ku ew tu wextekî dev ji xewna serxwebûna kurdan bernade, ji ber vê yekê pêşnîyar nehate tetbîqkirin.”²⁸

Li ser pêkanîna biryara navborî, ji alîyê îngilîz û tirkên ve çî eger û sebeb têne nîşandan bila bêne nîşandan, ev biryar û gotin, qethen nehatine tetbîqkirin.

²⁶ Ahmet Mesut, *İngiliz Belgelerinde Kürdistan:1918-1958*, Doz Yayınları, İstanbul, 1992, r. 77

²⁷ Celadet Bedirhan, *Kürdistana Kürd Memurları, Serbestî*, no: 482, 1ê Gulana 1919

²⁸ Edward William Charles Noel, *Kürdistan 1919*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1999, r. 94

Piştî ku Mistefa Kemal û hevalên xwe kongreyên Erzerum û Sêwasê girêdan, heman demê roj bi roj nakokîyên nava CTKê jî zêdetir dibûn. Rewş ber bi tevlihevî ve diçû û bar garantir dibû. Di nav rêxistina CTKê de du grub çêbûbûn; beşek damezirêner û rêvebiran, di nav sînorên Dewleta Osmanî de pêkanîna muxtarîyetê (otonomî) dixwest û beşeke din jî serxwebûnê dixwest. Yanî êdî rêzên CTKê ne yekpare bûn. Li ser vê dubendîya nav CTKê, Seyîd Mihemedê kurê Seyîd Abdulqadir dibêje: “Di nav CTKê de, Emîn Alî Bedirxan, Xelîl Rehmî Bedirxan, Kamiran Bedirxan, Mewlanzade Rifat û Kemal Fewzî “îstiqlal” dixwest.”²⁹

Di atmosfereke sîyasî ya bi vî rengî de, di dawîya Sibata 1920ê de beyanatek Seyîd Abdulqadir di rojnameyan de tête belavkirin. Di beyanatê de gotibû “*Kurd daxwaza serxwebûnê nakin, ew, muxtariyetê ji bo Kurdistanê dixwazin.*”³⁰ Vê beyanata Seyîd Abdulqadirî, nakokîyên nav rêxistinê hîn bê-tir derxistin holê û ji ber vê yekê beşekî endamên rêvebir ji CTKê veqetîyan. “Ew ên ku ji CTKê veqetîyan, bi navê Cemîyeta Teşkilatê Îçtîmaîyye (CTÎ) û paşê jî Partîya Milletê Kurd (PMK) du rêxistinên nû damezirandin.”³¹ Lêbelê li ser dîroka damezirandin û bernameyên CTÎ û PMK, agahdarîyek berfirah li ber destê me nîne.

Li gor agahdarîyên Malmîsanij, piştê ku di nav CTKê parçebûn çêbû, Emîn Alî Beg, di rêza gruba serxwebûnxwazan de cî girt û digel hevalên xwe bi navê Cemîyeta Teşkilatê Îçtîmaîyye ya Kurd (CTÎK), rêxistineke nû damezirandin û ew jî bû serokê wê rêxistinê.³² Qedrî Cemîlpaşa (Zinar Silopî) navê damezirênerên vê rêxistinê weha rêz dike: Emîn Alî Bedirxan Beg, Ferîd Bedirxan, Şukrî Baban, Fuad Baban, Hîkmet Baban, Dr. Abdullah Cevdet, Dr. Şukrî Mehmed, Kemal Fewzîyê Bedlîsî, Ekrem Cemîlpaşa, Nejmedînê Kerkûkî, Mewlanzade

²⁹ Şevket Beysanoğlu, *Anıtları ve Kitabeleriyle Diyarbakır Tarihi*, cild: 3, 2001, Ankara, r. 951

³⁰ *Kurdistan Press*, no: 50, 1988, r. 8

³¹ Rohat Alakom, *Şerîf Paşa: Bir Kürt Diplomatının Fırtınalı yılları, weşanên Avesta*, 1998, İstanbul, r.102

³² Bn. Malmîsanij, *Cizîra Botanli Bedirhaniler, Weşanên Avesta*, çapa: 2., 2000, Stenbol, r. 131

Rifat û Memduh Selîm Begî.”³³ Emîn Alî Bedirxan wek nûner û serokê vê rêxistinê tête nasîn. Di hin rojnameyên wê demê de, navê Nejmedîn Huseynî jî wek serokê CTÎyê hatîye nivîsandin. Ugur Mumcu jî li ser nav û rêza damezirêneran dibêje: “Di rêvebirîya vê grubê de şexsîyetên wekî Emîn Alî Bedirxan Beg, Ferîd Bedirxan Beg, Babanzade Şukrî Beg, Babanzade Hîkmet Beg, Dr. Abdullah Cevdet, Dr. Şukrî Mehmed Beg, Kemal Fewzî yê Bedlîsî, Ekrem Cemîl Paşa, Necmedîn Huseynî yê Kerkûkî, Memduh Selîm Begî û Mewlanzade Rifat”³⁴ hebûn.

Gruba navborî dixwest prensîbên mafê çarenûsîyê ji bo milletê kurd jî bête tetbîqkirin. Lêbelê bernameyek wan a bi rêkûpêk a neteweyî jî tune bû.

Li gor hevpeyvîna Emîn Alî Bedirxan a di rojnameya *Bosfor* de: “Di nav kurdan de du daxwaz û nêrînên cûda hene; em hemû jî Sultan wek Xelîfe qebûl dikin, lêbelê terefek dixwaze ji alîyê polîtîk ve bi temamî ji Tirkiyeyê veqete û alîyê din jî, ji ber helwesta Awrupîyan û hîleyên tirkan, bi xweragirtinek oportinîst, dixwazin di bin sîwana Tirkiyeyê de otonomîyek çêbe. Lakin yên ku wisa dibêjin, beşek hindik in.”³⁵

Li gor agahdarîyên kovara *Jînê*, di nav gruba serxwebûnxwazan de kesayetîyên wekî: “Ferîd Beg, Şukrî Baban (Suleymaniye), Fuad Baban (Suleymaniye), Hîkmet Baban (Suleymaniye), Dr. Ebdullah Cewdet (Arapkîr), Dr. Şukrî Mihemed (Baqirmaden), Kemal Fewzî (Bedlîs), Ekrem Cemîlpaşa (Amed), Nejmedîn Huseynî (Kerkûk), Memduh Selîm (Wan) û Mewlanzade Rifat” hebûn.”³⁶ Ev grub di heman demê de bi navê “Demokratên Kurd” jî tête nasîn û di dameziranîna “Partîya Milletê Kurd” de jî cî digrin. Piştî ku ev partî ji alîyê hikumetê ve tête girtin, bi serokatiya Necmedîn Huseynî Partîya Demokrata Kurd (PDK) tête damezirandin

Ji çalakîyên wê dîyar dibe ku piştî parçebûnê CTÎKÊ, xebateke hîn aktîf meşandîye; rêxistinên nû yên legal û îlegal

³³ Qedrî Cemîl Paşa, *Doza Kurdistan, Weşanên Bîr, Çapa Sêyem, 2007, Diyarbekir, r. 55*

³⁴ Uğur Mumcu, *Kürt İslam Ayaklanması (1919-1925), Tekin Yayınevi, 1991, Ankara, r. 186*

³⁵ Dr. Bletch, *Chirguh, Kürt Sorunu, Avesta Yayınları, 2009, İstanbul, r. 66*

³⁶ *Jîn (Kovara Kurdî-Tirkî, 1918-1919), Cild: I, Werger û amedekar: M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng-Sweden-1985, r. 101*

damezirandine. Lêbelê nikarîye navenda rêxistinê û potansîyela xebata wê bigehîne li ser erdê Kurdistanê, destkevtiyên girîng û mayinde bi dest bixe. Wekî ku hatîye gotin; her gîya li ser koka xwe şîn tê; xebat û çalakîyên ji dûrê Kurdistanê nikarî tesîra pêdivî li ser civata kurd bike û ji ber vê yekê jiyana wê jî dirêj neajotiye. Piştî ku Tevgera Kemalîst li Kurdistanê bandora xwe xurt kir û serhildana Qoçgirîyê jî têkçû, di dawîya sala 1921 û serê sala 1922an de êdî tevgera neteweyîya kurd mecbûrê xebata îllegal bû û ji nû ve têkilî û xebatên yekbûnê dest pê kir. Bi tevî damezirandina Komîteya Îstiqalala Kurdistanê (KÎK), êdî navenda tevgera netewîya kurd li Kurdistanê bi cî bû.

Piştî parçebûna CTKê, "Li ser pêşniyara Emîn Alî Beg, komek Bedirxanîyan di dawîya Gulana 1920an de biryara damezirandina komeleyek malbatî girtin. Qasê ku tê fêmkirin ev komele bi awayekî îllegal hatîye damezirandin. Reşnivîsa nîzamnemeya komeleyê ji alîyê Celadet Alî Beg ve tete nivîsîn û di encama gotûbêjên çend rêzeczivînan de tete qebûlkin. Ji bo serokatîya komelê jî Emîn Alî Beg tete hilibjartin.³⁷ Ji naveroka ewraqên komelê wisa diyar dibe ku li ser kurd û Kurdistanê, ji bo nûnerên dewletên gewre yên wekî Brîtanîya û Fransayê serlêdanên nivîskî û devkî hatine kirin. Karê amadekirin û wergera notayên ji bo nûnerên van dewletan, ji alîyê Abdurehman û Celadet Beg ve hatiye kirin.³⁸

Ji nameya ku di 6ê Hezîrana 1920an de ji Komîserîya Bilind a Fransayê re hatîye nivîsandin diyar dibe ku Emîn Beg, ji alîyê malbata Bedirxanîyan ve wek Mîrê dawî yê Mîrnişînîya Cizira Botan tete qebûlkin.³⁹

Xusûsiyeteke rêxistina CTKê jî, têkilîyên wan ên bi mixalefeta wê demê re bû; bi taybetî jî têkilîya CTKê, bi Partîya Hurrîyet û Îtilafê û Partîya Ahrar a Osmanî re hebû. Bêguman pêşîyê li hember tevgera Îtîhad û Terakkî û paşê jî li hember tevgera Kemalîst, bi rêxistinên mixalîf re têkilî û peymanên

³⁷ Malmîsanîj, *Cizira Botanî Bedirhanîler, Avesta Yayınları, 2. Baskı, 2000, İstanbul, r. 15*

³⁸ J. b. r. 98

³⁹ Hasan Yıldız, *20. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyaseti ve Modernizm, Doz Yayınları, Çapa 2., Stenbol, 2006, r. 98-100, Ji Dosya Kurdistanê, c. 12, r. 60*

kurdan çêbûne. Di vê çarçoveyê de “Emîn Alî Beg jî heman demê Endamê Merkezî yê Partîya Hûrîyet û Îtîlafê (14 Qanûna Ewel 1919) bû.”⁴⁰

Têkilîyên bi mixalefetê re di dema darizandina rêvebirên Tevera 1925an de têne rojevê û dibin yek ji sebebên sûcdar kirina kadro û rêberên kurd. Di dema darezandinê de dozger Ahmed Sureyya Ozgeveren ji Seyîd Abdulqadir dipirse û dibêje: “Li ser têkilîya we û Partîya Hûrîyet û Îtîlafê, di navbera ewraqên we de muqawelenameyek sîyasî hatîye dîtin, li ser vê babetê dibêjî çî? ... Belê, me bi Partîya Hurrîyet û Îtîlafê re muqawelenameyek çêkirîye. Li gorî vê muqaweleweyê, dê ji bo Kurdistanê muxtarîyetîyek bihata dayin... Ew ên ku îmzeyê wan di bin vê muqawelenameyê de hebûn: ji aliyê me ve yê Min, Mele Seîd û Emîn Alî Bedirxan; ji aliyê Partîya Hûrîyet û Îtîlafê ve yê Vafî, Zeynelabîdîn û Sebrî Xoce bûn.”⁴¹

Noel dema behsa xûsuyetên wî yê şexsî dike, dibêje: “Emîn Alî Bedirxan; giregir û kesayetîyek ber bi çav û nûnerê malbata Bedirxanîyan bû. Pîremêrekî bejindirêj, rîsipî û xweşmêr bû. Kesayetîyek bihêz, bi taybetî li ser kurdên Botan û bi giştî jî li ser hemû kurdan xwedî tesîreke giran bû.”⁴²

Piştî serkevtina tevgera Kemalîst, gelek rewşenbîr, welatparêz û xanedanên kurd ji bêgavîyê cî û warê xwe terk kirin. “Emîn Âlî Bedir-Xan û sê kurên wî; Sureyya, Celadet û Kamirana jî bûn mehkûmê îdamê. Bab û Sureyya revîne Misrê. Celadet û Kamirana paşê çûne Almaniyayê ji bo xwendina bilind.”⁴³

Emîn Alî Bedirxan di Gulana 1923yan de li Misrê nexweş dikeve û sala 1926ê ji ber nexweşîya dil, di 75 salîya xwe de diçe ser dilovanîya xwe.

* * *

⁴⁰ Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler*, cilt: 2, İletişim Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 326

⁴¹ Şevket Beysanoğlu, *Anıtları ve Kitabeleriyle Diyarbakır Tarihi*, cild: 3, 2001, Ankara, r. 940-50

⁴² Edward William Charles Noel, *Kürdistan 1919*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1999, r. 94

⁴³ Aharon Cohen, *Entellektuelekî herî girîng ê Kurd: Mîr Dr. Kamirana A. Bedir-Xan, Wergêra ji Îngilizî: Yıldız Samer û Hazım Kılıç, Stêr, Danmark, 1992.*

Ahmed Sureyya Bedirxan: Lawê mezin ê Emîn Alî Bedirxan e. Sureyya Bedirxan, sala 1883ê li Mektela Sûriyê ji dayik bûye. Di Mekteba Sultanî ya Stenbolê de xwendîye û paşê di Unîversîteya Stenbolê de endazîyarîya Zîraetê xwendîye. Sala 1904ê bi tawanbarîya dirustkirina komploya li hemberê hikumetê, du sal hatîye zîndanîkirin û sala 1906ê ji ber bûyera kûştina Ridvan Paşa, careke din hatîye nefîkirin (sirgûnkirin).

Piştê ragehandina Meşrûtiyeta Duyem, Sureyya Bedirxan vedigere Stenbolê û li vê derê di navbera salên 1908-1909an de, bi zimanê kurdî-tirkî rojnameya *Kurdistanê* dide çapkirin. Piştê bûyera 31ê Adara 1909ê, ew jî dikeve ber pêlên terora hikumeta Îtîhad û Teraqîyê û bi egera mûrtecîtiyê (paşverûtiyê) tê girtin, bi cezaya mirinê tete mehkûmkirin û wî di Bolika Bekiraxa de hepis dikan. Ji ber vê yekê, dawî li çapkirina *Kurdistanê* jî tê. Paşê cezaya mirinê tete efûkirin û cezaya nefîkirinê didine wî. Ew, di sala 1912yê de dîsa vedigere Stenbolê, dest bi xebateke veşartî ya şoreşgerî dika û ji ber vê yekê dîsa tete zîndanîkirin û di dawîya sala 1913yê de ji zîndanê direve û terka sînorên Împeratorîya Osmanî dika.

Di navbera salên 1917-1918yan de li Qahîreyê bi navê mustear ê Azîz Ahmed cardin rojnameya *Kurdistanê* dide çapkirinê. Tê zanîn ku li vê derê bi kêmanî 11 hejmar hatine çapkirin. Piştî îmze kirina Peymana Mondrosê, li Qahîreyê bi navê Komîteya Îstîqlala *Kurdistanê* rêxistinek damezirandîye û bi xwe jî bûye sekreterê wê yê giştî. Li ser navê rêxistina xwe, dixwaze bi dewleta Brîtanyayê re têkilî deyne û bi piştgirîya wan, têkoşîna serxwebûna *Kurdistanê* bi ser bixe. Li gorî dîtina Nikîtin; Sureyya Alî Bedirxan, yekemîn welatparêzê kurd e ku xebatek hevaheng a bi bername û kampanyayeke nivîskî, gotarî û îsbatên modern ên polîtîk kirîye."⁴⁴

⁴⁴ Malmîsanij, *Cizira Botanlı Bedirhaniler, Avesta Yayınları, 2 Baskı, 2000, İstanbul, r. 99-100*



**Mihemed Emîn Beg û lawên wî:
Sureyya, Celadet û Kamiran Bedirxan**

Sureyya Bedirxan li ser vexwendin û daxwaza Memduh Selîm Beg, ji Misrê tê Sûriyê û tevlî xebata Xoybûnê dibe. Sureyya Bedirxan ji bo karê dîplomatîk ên Xoybûnê di Çirîya Pêşîn a sala 1928an de diçe Amerîkayê û nêzikê heft mehan li wê derê dimîne. Di dawîya salên 1929an de ji ber tevgera Agirîyê, rûniştina wî ya li Sûriyê, ji aliyê dewleta Fransîz ve tête qedexekirin û ew jî ji bêgavîyê berê xwe dide Parîsê û li wê derê nûnertîya Xoybûnê dike.

Bi zimanê Îngilîzî û Fransîzî gelek meqale, nivîs û pirtûk li ser kurd û Kurdistanê bi navên Dr. Bleç Şêrko, Azîz Ahmed û Ehmed Azîz nivîsandine. Du zarokên wî hebûne; navê lawê

wî Heqî û yê keçikê jî Qudret bûye. Sala 1938ê li Parîsê di 55 salîya xwe de ji ber nexweşîya dil çû ser dilovanîya xwe.

Safder Alî Bedirxan: Biçûkê lawên Emîn Alî Beg bû, ew jî ji bo xwendinê çûbû Almaniyayê û sala 1926ê li bajarê Mûnîhê ji ber nexweşînekê wefat dike. Di heman salê de mirina Emîn Alî Beg û lawê wî yê Safder; bextreşîyek felekê bû û li ser malbatê ve hatibû. Celadet Bedirxan pirr li ber mirina Safder dikeve û helbesta bi navê “*Alferd de Vigny [Mirina Gurî]*”⁴⁵ werdigerîne kurdî û dîyarîyê giyanê Safder dike.

Tevfîk Alî Bedirxan: Li Stenbolê ji dayik bûye û ew jî bi tevî birayên din perwerdeyîya xwe li Almaniyayê temam dike û di sala 1925an de vedigere Tirkiyeyê. Piştê derketina qanûna paşnavan, ew paşnavê “Çınar” digire û berûvajî xeta sîyasî ya bav û birayên xwe, bi rejîma Kemalîst re di nav ahengê de dimeşe.

⁴⁵ Hawar, no: 31, *Mirina Gurî*, werger: Celadet Bedirxan, çapxana Sebatê, Şam, 1ê Tebaxa 1941

2. Celadet Bedirxan (1893-1951)



Celadet Bedirxan

Celadet Bedirxan û birayê wî Kamiran Bedirxan, bêtir bi xebatên xwe yên li ser ziman û kultura kurdî têne nasîn. Ev îmajê wan, ji ber xebatên dîplomatîk û kulturî yên piştî rawestandin û cûdabûna ji Xoybûnê ye. Salên sereke yên ciwanîyê ne têde, ji salên 1918an bigire hetanî 1932an, giranîya xebat û pirranîya mesayîya wan li ser sîyaset û rêxistinbûnê bûye.

Di vê xebatê de, bi giranî li ser deh salên sereke yên wê têkoşînê; dema navbera salên 1913-1923an hatîye lêkolîn

û di vê navberê de jî bêtir li ser nivîsên wan ên di nav rûpelên rojnameya *Serbestî, Türkçe İstanbul* û *İctihadê* de hatîye rawestandî. Agahdarîyên din, bi awayekî kronolojîk di çarçoveya temamkirina bîyografîya wan de bi kurtebirî hatine nivîsandî.

2. 1. Zarokatî û perwerdeyî

Celadet Alî Bedirxan, di 26ê Nîsana 1893ê de li Stenbolê ji dayik bûye.⁴⁶ Ji ber ku bavê wî li bajarên cûr bi cûr yên wekî Akka, Selanîk, Konya, Anqera, Isparta û Edirneyê kar kirîye, li van bajaran mezin bû û beşekî perwerdeyîya xwe ya sere-tayî û navendî li van deran temam kir û paşê bû xwendevanê Mekteba Sultanî ya Stenbolê û sala 1906ê ji ber dubare fermana sirgûnkirina Bedirxanîyan, ji mektebê hate derxistin. Endamên malbatê rêkirin wîlayet û bajarên wekî Şam, Hama, Rodos, Trablusgarp, Nablûs, Yemen, Îsparta, Mekke, Qeyserî, Îzmîr û Adanayê. Emîn Alî Bedirxan û zarokên wî jî rêkirin bajarê Ispartayê. "Paşê ji vê derê jî sirgûnê keleha Akkayê kirin û li wê derê sê sal man."⁴⁷

Celadet piştî xwendina îdadî, dixwaze li Stenbolê Mekteba Herbîyê bixwîne, lê ji ber ku dayika wî pê razî nabe, dev ji vê daxwazê berdide. Ew bi xwe, sala 1932yê mesela daxwaza xwendina Herbîyê, bi vî awayê tîne ziman: "Gava ez hejdeh, niwazdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba Herbîyê. Dêya min ji min re got: Ma ji te re ne namûs e? Tu çawan bikevî mekteba Herbîyê û bibî zabîtê tirko. Ev tirko ko welatê te xistine xulamîyê, bapîrê te dîl û malbata te perîşan kirine û hon avêtine zîvarêyê."⁴⁸ Li ser van gotin û hişyarîya dayikê, ew, dev ji daxwaza xwendina Herbîyê berdide.

⁴⁶ Mihemed Bekir, *Pêşgotina* ji bo çapa hejmarên: 1-9ê kovara *Hawarê*, Weşanxana Hawar, Sweden, 1987, r. 10

⁴⁷ Celadet Alî Bedir-Xan, *Loriya Bedir-Xan*, *Hawar*, no: 5, Şam, 20ê Tîrmeh 1932, Çapa hejmarên 1-9, Amedekar: Mihemed Bekir, Sweden, 1987

⁴⁸ J. b.



Celadet Bedirxan (Zarokatî)

“Bi tevî xwendina dibistanê, bavê wî mamosteyên xisûsî yên zimanê yûnanî, farisî, frensî û rûsî jê re tanîn malê. Ew zimanê erbî û turkî jî di dibistanan de hîn bûne.”⁴⁹ Kemal Mezhâr Ahmed dibêje: “Celadetî ji xeynî zimanê dayika xwe, bi zimanê erebî, turkî, farisî, almanî, fransizî, rusî û hinek jî yûnanî zanibû.”⁵⁰ Herweha ji ber ku “karbidestên osmanî rê nedidan Bedirxanîyan ku biçine Kurdistanê, Emîn Alî, mamoste, mitrib, çirokbêj û hd. ji Cizîra Botan tanîn Stenbolê, da ku danûsendina wan digel welêt, ziman û adetên kurdî her geş bimîne.”⁵¹ Ji agahdarîyên Celadet Bedirxan xuya dibe ku “lîska Setrencê” jî, kultur û çalakîyek berdewamî ya navmalê bûye.

⁴⁹ Mihemed Bekir, *J. b.*, r. 20

⁵⁰ Ahmed, Dr. Kemal Mazhar; *Tarihin Tarihi, Kürtlerde Tarih Tarihte Kadın, Pêri Yayınları, İstanbul, 1997, r. 89*

⁵¹ Mihemed Bekir, *J.b..r. 20*

Emîn Alî Beg, zarokên xwe ne tenê ji alîyê kulturî ve, ji alîyê fikra sîyasî, neteweyî û akademîk ve jî baş perwerde kirine. Ji ber vê yekê Celadet Bedirxan dibêje: “Ew bavê ko ji min re ne tenê xwîna xwe ya pak daye,.. Ez bi dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê rêya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.”⁵²

Piştê ku Meşrûtîyeta Duyem hate îlankirin, hemû neffîkirîyên rejîma îstibdada Abdulhemîd hatin bexiştandin û efûyek giştî hate derêxistin. Li ser vê efûyê, wekî gelek sîyasetmedar, rewşenbîr û malmezinên kurd, endamên malbata Bedirxanîyan jî dîsa vegefiyan Stenbolê.

2. 2. Destpêka nivîskarîyê

Eger di quncikên arşîvxane û pirtûkxaneyan de nivîs û berhemên nû dernekevin ber ronahîyê, yekemîn nivîsa Celadet Bedirxan, nameya wî ya ji bo rojnameya *Serbestî* ye. Ev nameya Celadet Bedirxan, bi îhtimaleke mezin nivîsa wî ya sereke ye. Lewra name, di 20ê Sermaweza sala 1908ê de, di hejmara 5. a rojnameya *Serbestîyê* de hatiye neşîrkirin. Gava em dîroka jidayikbûna Celadet bînin ber çavan, di vê demê de ew xortekî 15 salî ye. Di vê nameyê de, navnîşan û mixatab weha hatiye nivîsandin: “*Harbiye Nâzırı Ali Rıza Paşa Hazretlerine*” [ji Alî Rıza Paşa yê Wezîrê Herbîyeyê re]. Mewzûya nivîsa wî: Nûçeyek rojnameya *Servet-î Fûnun* e, ku di vê nûçeyê de behsa zêdeyîya personel û karmendên “Firka Duyemîn” û îsrafa wê hatiye kirin. Di naveroka nameyê de, daxwaz dike ku rêvebirên Meşrûtîyetê, di vê dema teng û qrîza aborî de, dawî bi vî halê ku ji dewra îstibdatê mayî bîne.”⁵³


Ji xeynî vê nameyê ku berhemên nû dernekevin ronahîyê, pirtûka *Edirne Sukûtûnunun İcyüzü* [*Rastîya Sûkuta Edirneyê*], yekemîn berhema hevpar a birayên Caladet û Kamiran Bedirxan e. “Ji pirtûka *Edirne Sukûtûnunun İcyüzü* xuya dibe ku her du birayên Bedirxanî, di tazeyîya ciwantîya xwe de dest bi ni-

⁵² *Celadet Alî Bedir-Xan, Lorîya Bedir-Xan, Hawar, no: 5*


⁵³ *Bedirhanzade Celadet, Serbesti Gazetesine, no: 5, s. 4, 7 Teşrîni Sani 1324 (20ê Sermaweza 1908)*

vîsandinê kirine. Dema ev pirtûk hatîye nivîsandin (1913), Celadet Bedirxan bîst salî ye û Kamiran Bedirxan jî hijdeh salî ye.”⁵⁴

Meriv dikare bêje, gelo pirtûkek wisa çima hatîye nivîsandin û çi karê wan li wê derê hebûye? “Ji agadarîyên berfireh ên nava vê pirtûkê dîyar dibe ku Celadet û Kamiran Bedirxan di dema dorpêçkirina Edirneyê de, li wê derê kar û wezîfeya leşkerî kirine. Dema em bala xwe bidin nivîs û nêrînên wan ên wê demê, wisa dîyar dibe ku her du birayên Bedirxanî, wê demê di bin tesîra fikra Îslamîparêzî û Osmanîparêzî de bûne.



**Celadet Bedirhan &
Kamiran Bedirxan,
Edirne Sûkutunun İyüzü**



Kamiran Bedirxan, Tanin-i Harb

Çiroka Celadet a bi navê *Bobi'nin Hatası [Xeletîya Bobî]*⁵⁵ jî, di sala 1913an de tê nivîsandin, lêbelê di sala 1916an de ji alîyê Çapxaneyaya Mûdafaa ve tete çapkirin. Di heman salê de rîsaleya bi navê *Osmanlı Teyyâreciliğinin İlk Şehitleri İçin Hü-kümetten Rica [Tika ye ji bo Şehîdên Sereke yê Balafirvanîya Osmanî]*, ji alîyê Celadet û Kamiran ve hatîye nivîsandin.

⁵⁴ Malmîsanij, *Cızira Botanlı Bedirhaniler, Avesta Yayınları, çapa: 2., 2000, Stenbol, r. 235*

⁵⁵ *Celadet Alî Bedirxan & Kamiran Âlî Bedirxan, Bobi'nin Hatası, Weşanên Avesta, Îstebul, 2011, r. 35*

2. 3. Beşdarîya di Şerê Giştî yê Cîhanê de

Berî Şerê Giştî yê Cîhanê, dagirtina beşekî Kurdistanê ji aliyê artêşa Rusyayê ve û ji wê şûn ve jî di pêvajoya çar salên Şerê Giştî yê Cîhanê de, kurdan xusarek mezin dît, ji welatê xwe hatin koçberkirin, gelek ciwan û xwendevanên xwe yên hêja û welatperwer di mîhwerên şer de wenda kirin. Sureyya Bedirxan dibêje: “Li gor wesîqeyên rêvebirîya giştî ya koçberîya derve ya Stenbolê, 700.000 kurd hatine koçberkirin.”⁵⁶ Di vî şerî de Celadet Bedirxan, bi xwestina xwe tevî artêşa osmanî bûye û li cebheya Kafkas, Iraq û ciyên din bi pileya zabitê ihtîyatê kar kirîye. Di nivîseke xwe de rewşa şer û encamên wî yên li Kurdistanê weha tîne ziman:

“Dema ku ez wek zabitê ihtîyatê li Iraq, başûrê Kurdistanê, Kafkas û ciyên din de dixebitîm, min bi nalîn û girînê, gotar û kiryarên dilşewat û pêkhatî yên di derbarê tunekirina kurdan de guhdar kirin û dîtîm. Ev cînatyên ku ji bo milletekî fedekar û mezlum rewa hatibûn dîtîm, ji nav eserên şexsî yên hikumeta Îttihadê, şaheserekî tewr mezin bû. Walîyekî aktorê vê faciayê, ku bi hezaran mihacirên kurd di germşewata sehraya Mûsilê de terkî mirinê kiribû, li ser sendalîya postê daîreyeke fermî bi dilşadî gotibû: “Wekî yê ermenan, me kokbirîyeke wisa anîn serê kurdan ku...”⁵⁷

Meseleya koçberên kurd, di raport û tezkereyek Partîya Demokrat a Kurd de, ku di 31ê Tebaxa 1919an de ji bo hikumeta Brîtanyayê hatîye pêşkêşkirin weha hatîye nivîsandin:

“Bi hezaran malbatên kurd ji war û welatê xwe ber bi deverên cûda yên Anatolyayê ve hatine koçberkirin. Ev multecîyên perîşan, bûne qurbanê birçîtî, tunekirin û asîmîlasyona turkan. Hikumeta Osmanî, li miqabilê dubare serdan û ricayên me bersiv nedaye û xwe bêdeng

⁵⁶ Dr. Bletch Chirguh, *Kürt Sorunu, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009, r. 50*

⁵⁷ Celadet Alî Bedirhan, *Kürdler ve İttihad (ITC) siyaseti [Kurd û Sîyasete Îttihadê], Serbestî, no: 209, 22yê Sibata 1919*

kirîye. Em bi navê însanetî û şerefa “adilbûna” îngilizan dixwazîn ku hûn bi qudreta xwe ya bilind alîkarîya malbatên kurd û vegera wan bikin.”⁵⁸

“Xuya dibe ku mihacirên kurdan jî wekî yê ermenan rastî zulm û zordarîyeke mezin hatine, lê mixabin alîkarîyên ku bi desteka hikûmetê ji bo mihacirên rum û ermenan hatine kirin, ji bo mihacirên kurdan nehatine kirin.”⁵⁹

Celadet Bedirxan di nivîsa xwe ya navborî de, tehcîra li ser kurdan wek polîtîkayek plankirî ya Partîya Îtîhad û Terakkî dibîne û dibêje:

“Hikumeta bihûrî ya Îtîhad û Terakkî biryara tune kirina milletê kurd dabû; beşekê wan kuştin û beşek din jî bi sefalet û birçîtîyê tune kirin, çend sed hezar kurd jî koçberê Anqera, Konya û wîlayetên dewrûberê wan kirin, li van deran gund bi gund belav kirin.... Ev belgeya veşartî dide xuyakirin ku armanca vê siyasetê tune kirina milletê kurd e.”⁶⁰

Di sala 1916yê de bajarên Kurdistanê yên wekî Erzerum, Wan, Bedlîs û Mûş ji alîyê artêşa Rûsan ve hatibûn dagirtin. Di rewşeke wisa de, Enwer Paşa diçe serdana Cebheya Kafkasê ku Celadet Bedirxan jî wê demê komandarekî cebheya Kafkas bû û her du di seha cepheyê de rastî hev tîn û Enwer Paşa ji wî re dibêje: “Ji alîyê turkan ve tehlûkeya kurdan, ji tehlûkeya rusan mezintir e.”⁶¹

Celadet Bedirxan, rewşa rêvebirîya osmanî ya wê demê, seabebê tevlîbûna Şerê Giştî û bîlanço ya çar salên şer bi kurtebirrî weha tîne ziman:

“Ew şerê ku bi îhtirasê dest pê kir û bi bextreşîyê dewam kir, em ji wê bi felaket û xêrnedîtî derketin.

⁵⁸ Ahmet Mesut, *İngiliz Belgelerinde Kurdistan [Kurd di Belgeyên Îngiliz de]* (1918-1958), Doz Yayınları, İstanbul, 1992, r. 96-97

⁵⁹ Celadet Alî Bedirhan, *Kürdler ve İttihad (İTC) Siyaseti [Kurd û siyasetê Îtîhadê]*, Serbestî, no: 209, 22yê Sibata 1919

⁶⁰ Celadet Alî Bedirhan, J. b.

⁶¹ Hasan Hışyar Serdî, *Görüş ve Anılarım [Dîtin û Bîranînên Min]*, Med Yayınları, İstanbul, 1994, r. 140

Di vî welatî de her rûpelekê dîrokê, bi bûyereke şer ve dagirtîye. Di şerê dawî yê Awrupayê de xwîna çar mîlyon mirovên Anatolyayê rijîya. Ev temarên ku bi îhtîrasek dijwar û bêfayde hatin jêkirin, çar salan bi berdewamî ji wan xwîn herikî. Ev şer, tenê bi kêrê Enwer Paşa û hevlabendên wî hatîye; îdareya hikûmetê bi malbatî xistîye bin destê xwe û ev yek ji wan re bûye jêderka temînkirina berjewendîyên ferdî û şexsî. Ji xeynî grubeke pir biçûk a bijarte, her ferdekî milletê cihê cihê xistiye bin zerarê, welat bi awayeke giştî xistîye bin barê mişkulatên pirr gewre û girdavên (gerînekên) pirr kûr.

Ew lawên hêja yên Anatolyayê ku ji sehayên Yemenê bi saxî vegeryabûn û bi hezaran xwendevanên Darûl Fûnunê ku hêvîya îstîqbalê me ya nêzîk bûn, di cehenema Çeneqelê, zinarên Qefqasan û sehayên Sûveyşê de bi unwanê zabîtên îhtîyatê, bê rijandina dilopek ron-dîkên çavan û bi vî awayê hatin îsrafkirin û binerdkirin. Belê divîya bihatana binerdkirin û hatin binerdkirin jî; lewra Enwer Paşa wisa dixwest, Paşa wisa ferman dikir. Piştê ku me bi sebir, tehamûl û tewekulê, çavên xwe ji ew qas zulm û cinayetan re girtin, vê carê jî heqîqeten û bi hemû rastîya xwe ve, em bi awayeke nexweş û birîndar ji şer derketin..."⁶²

2. 4. Bîranînên Şerê Giştî yê Cîhanê di cebheya Iraqê de

Celadet Bedirxan di pêvajoya Şerê Giştî yê Cîhanê de, di herêm û cepheyên cihê cihê de û li ser çîya, newal û sehreyan çar sal di nav gurr û germayîya şer de derbas dike. Bêguman bîranînên van çar salan dikarin rûpelên gelek pirtûkan jî tije bikin, lê mixabin tenê di ber destê me de çend nivîsên wî yên li ser wê demê hene ku bi sernivîsa "*Ruznameyê Herb*" di nav rûpelên rojnameya *Türkçe İstanbul*ê de hatine belavkirin.

⁶² Celadet Âlî, *Zabitanın Terfihî [Terfihirina Zabîtan]*, T. İstanbul, no: 126, 5 Nisan 1919

Li vê derê dixwazim bi hinek têbinîyan, aliyê balkêş ê van nivîsan bi we re parve bikim. Di nav rêzenivîsa bîranînên wî yên li ser Şerê Giştî yê Cîhanê de, nivîseke wî ya balkêş jî ya bi sernivîsa “*Develer*” (*Hêştir*) e. Malum e, wê demê wasîte û hacetên şer, wekî ya îro pêşkevtî nebûn. Di sehayê de wesîteyên tewr girîng ê guhestina bar û çekan, deve bûn. Bi gotina Celadet Bedirxan, ew heywanên mibarek “şemendîferên sehayê” bûn. Ew, di vê sefera xwe de cara pêşîn deveyan jî nêzîk ve nas dîke û dibe şahidê hêşbûna boşê (êxleyê) deveyan. Dibêje:

“Me di piçûkayîya xwe de bi heyret temaşa koma van heywanên wekî peyker dikir, lê belê di derheqê ruh û tabîata wan de agahdarîyên me yên mutlaq tune bûn. Me wan bi navê deve nas dikir û ji wan re digot deve.

Lê bi rastî deve, bi cuseyên xwe balkêş in û divê bi taybetîyên xwe ve baş bêne naskirin. Bi gelek vekirî dîyare ku bi wan re ruhîyeta qabîleyek heye, her qefleyê deveyan wekî qebîleyekê ye.

Di nav qefleyê de, ji deveyan ê herî gewre û qerase wek reîs tête qebûlkin. Hemû deveyên din, bêîtiraz îteatê nîşan û tevgerên reîsê xwe dikin. Ji reîsê qefleya deveyan re dibêjin “Şeyxûl Cemal” [Mîrê Deveyan] û tu deveyek bê fermana wî tevnagere. Kesê ku dibe selwanê boşa deveyan, bi taybetî pêşîyê bi reîsê wan re meşxûl dibe. Lewra ku reîs neye aşkirin û bidestxistin, hikumkirina li ser deveyên din nemimkun e. Dema ku selwanek karibe li ser reîsên deveyan hikum bike û bi xwe ve girê bide, bi serê xwe kare bi sedan deveyan îdare bike. Kelûpelê me yên leşkerî li ser piştta qefleyek deveyan bû, ji bo parastina wan hinek leşker û ajotkarên deveyan li pey me dihatin. Di nava wan de yekî, dixwaze henekên xwe bi wê reîsê vaqur û cidî bike. Reîs, pêşîyê dixwaze bi hinek deng û tevgeran bide zanîn ku ji henekên wî nerazî ye, lêbelê camêr ji vê yekê fêhm nake. Her ku pêde diçe mesele gurr dibe, reîs hêrs dibe û kef dekeve devî, lê ciwanmêr deng ji xwe naîne.

Dawîyê reîs, li ber çavê hemû mifrezeyê bi derbekî nerm li ciwanmêr xist û bi erdê ve dirêj kir, barê giran ê li ser piştê xwe avêt û bi dengê hêşînke balkêş qefleyê terk kir.

Ji ber vê tevgerê, herkes û bi taybetî jî selwan ketibûn teşxelaya endîşeyêk, ji ber vê yekê bi tirs û dengekî lertzok deng li serselwan an jî xerbenyê deveyan kir ku li pêşiya qefleyê bi siwarê kerê bûbû û diçû:

- Ya Ebûl Merzûk!

Ebûl Merzûk ji kerê peya bû û ber bi reîs ve baz da. Lêbelê gelek dereng mabû; lewra hemû deveyan di nav çend saniyeyan de bi nêrîn û çavşikandinê mesaja (hinareya) reîsê gewre girtibûn û biryar dabûn. Ebûl Merzûk berê xwe da reîs û bi dengekî dilşewat got: Teal ya ruhî teal (were ey ruhê min were)!

Ev deng û daxwaz dereng mabû. Hemû deveyan biryarê pêk anîn, di wê hengameyê de pêleke serhildanê ketibû nav wan.

Devê wan bi kef tije bû, hawidê xwe û barê li ser piştê xwe avêtin, ji aliyê rast û çepê ve bi feryadên dilşewat direviyan. Di nav deqîqeyêk de li derûdora reîsên xwe berhev bûn, wekî pehlewanên ku barê piştê xwe avêtîye.

Hemû deve li derûdora mîrê xwe berhev bûn, hîşehîşa wan bû û pîkolî dikirin.

Min ji bo hêmkirina deveyan û pêkanîna asayîşê pêşniyara alîkariyê ji Ebûl Merzûk re kir, wî, bi tûndî pêşniyara min red kir.

Wî got; bi qedrê Pêxember bikî, min navê zabîte min. Deve û selwanên wan bi karê xwe ve mijûl bûn û me jî bi dûr ve temaşa wan dikir.

Çawa ku hemû deve li dora mîrê xwe berhev bûbûn, herweha hemû selwanên deveyan jî li derûdora Ebûl Merzûk berhev bûbûn. Ebûl Merzûk ji dil, bi şêwe û meqamekî dilşewat ê ruhê sehayê û bi dengekî lertzok dest bi xwendina qesîdeyek hezindar kir. Ew deng û awazê wan ên nerm, di bin tava germ û şewitok a seh-

rayê de dilê me mist dida, sikûnetekî bexşê me hemû-
yan dikir û hênikayî dida me.

....

Ji xwendina qesîdeyê demeke kurt şûn ve, ew milê wan ê dirêj ê ku wek şûrê serhildanê bilind bûbû, peyderpey ber bi xwar ve bû û dawîyê danîn ber xwe. Herwekî li erdê pirlantayek wendabûyî bigerin, êdî pozê wan gihîşte erdê, perdeyê çavên wan hatin xwarê û çavên wan hatin girtin.”⁶³

Çîroka bihûrandina “Altinkoprî”yê jî xalekî balkêş a bî-ranên Şer e. Celadet Bedirxan sê sal piştî destpêka şer, yanî di sala 1917an de bi tevî mifrezeya xwe ji bo tehkîmkirina pira Altinkoprîyê tête wezîfedarkirin. Di vê rêvîtiyê de jî hinek têbinîyên balkêş hene ku dixwazim bi we re parve bikim.

“Dijminan Kerkûk dagirtibû û ber bi Altinkoprîyê ve dimeşyan.

Mifrezeya me bi awayekî teqez e ji bo tehkîmkirina serê pira Altinkoprîyê, bi topên sehra yên 5.7 hatibû wezîfedarkirin.

Ku dijminan Altinkoprî derbas bikira, ji bo dagirtina Mûsilê ji xeynî “Zapê Kebîr” tu astengekî li pêşîya wan nedima. Ji ber vê yekê, Altinkoprî îstiqameteke pir girîng bû, em bi mecburî ber bi wir ve ketibûn tevgerê. Ev hêza narîn û taze, berîya sê mehan ji Stenbolê veqet-yabû û ji berê ve ji ber du sedemên texrîbkar û xedar dinalîya, di her gavavêtina me de qurbanekî dida; tavê enî û mejî dişewitand û kolerayê jî made û rodîyan diqeland.

...

Dema pêşdarê me ji milê rastê ve gihîştin ber çem, tava gurr û bişewat a sehayê çûbû ava, rengê asoya asîman bûbû wekî rengê sorê îstisna yê lêvên jinan û şopa wê wek xetên neyekrêz hêdî hêdî ber bi semayê ve bilind dibû. Di qubbeyê de wek xeteke mirekeba sor belav dibû û dibû wek ewrên gulreng.

⁶³ Celadet Alî, *Develer [Hêştir]*, *Türkçe İstanbul*, no: 129, 8ê Nîsana 1919

Kela çem rabûbû, kef dikir, diqîrîya û dinalî wekî ferya-
deke bêdawî.

Hîn berîya em bigîjin ber çem, qumandarê mifrezeya
me emir kiribû ku di serî de pêşdar, piştî wan bater-
yayên topan û ji wan şûn ve jî dê leşker ji pirê derbas
bibûna.

Çav û nihêrîna hemû endamên mifrezeya me ku li ser
orduya gewre ya şeşemîn bûn, li pirê digerîyan, digerî-
yan lêbelê pirê xuya nedikir.

Di wê hengameyê de ji alîyê qeraxê çemê ve erebekî
nîvçîplaq bi qîrîn gote me:

“Exzel mau el cisre!”

Yanî wî dixwest bibêje: “Lehîyê pir xera kirîye!”

...

Mêrikê ereb ji dûr ve keleka ber çemê bi destê xwe nî-
şan da û got: “Şahtûr ya efendî şahtûr!”

Me hemûyan fêm kir ku ancax bi van kelekan em di-
karin derbasê alîyê din ê çemê bin. Piştê bînvedanekî
kêmdem, me dest bi bihûrîna çemê kir.

...

Belê xeternakîya li ser orduya şeşemîn di mesafeya ro-
jekî de bû û me jî dixwest bi vê tevgera leşkerî, bi van
wasîteyan û bi vê lezgîniyê pêşî li wan bigirta. ...”⁶⁴

Celadet Bedirxan di mudeta Şerê Giştî yê Cîhanê de rastî
gelek xeternakî û tengasîyan, bûyerên balkêş û xemgîn tê û
di gelek nivîsên xwe yên ciyawaz de behsa wan dike. Ew, Şerê
Giştî yê ku bi tesîra Almaniyayê û bi serkêşîya rêvebirên Îtî-
had û Terakkî, Dewleta Osmanî jî kişandîye nava xwe, wek
macerayekê dibîne û dibêje xwînrêtina “mirovên Anatolyayê”,
bedêleke bêmiqabil e. “Ev rê û îstiqameta ku ji alîyê pêxem-
berên Ocaxê ve li ser nexşeya ‘sewqûl ceşş’ê, bi qelesa sor
hatiye nîşandan: Turan e.”⁶⁵

Piştê bidawîhatina Şerê Giştî yê Cîhanê, ew jî wekî hemû
zabît û serbazên di cepheyê de, vedigere Stenbolê li nik mal-
bata xwe. Peymana Mondrosê (30ê Çirîya Pêşîn a 1918) ji

⁶⁴ Celadet Alî, *Geçit [Bihûr]*, *Türkçe İstanbul*, no: 147, 26ê Nîsana 1919

⁶⁵ Celadet Alî, *Borazanın Kurşunu [Guleyê Borîjen]*, no: 191, 9ê Hezîrana 1919

bo hemû Dewleta Osmanî û bi taybetî jî ji bo milletê kurd rewşeke nû peyda kiribû. Di vê rewşa nû de; li ser navê kurdan rêxistinên nû hatin damezirandin, kovar û rojnameyên nû hatin weşandin. Pêşîyê bi serokatîya Mewlazade Rifat, Partîya Radîkal Avam (Partîya Radîkal a Gel] hate damezirandin û Emîn Alî Beg jî damezirênerê vê partîyê bû.⁶⁶ Piştê ku CTK hate avakirin, Partîya Radîkal a Gel û rêvebirên wê jî tevî Cemîyetê bûn. Mewlanzade Rifat bû endamê navendî yê CTKê, Emîn Alî Beg jî bû cîgirê serokê rêxistinê.

“Bi tevî çêbûna mutarekeyê, Mewlanzade dest bi weşandina *Serbestîyê* kir. *Serbestî*, fikrên Cemîyeta Tealîya Kurd belav dikir.”⁶⁷ Her du lawên Emîn Alî Bedirxan jî di nav xebata Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (CTK) de bûn. Di pêşxistina vê xebatê de Emîn Alî Bedirxan û zarokên wî; Sureyya, Celadet û Kamiran Bedirxan jî ciyê xwe digrin û dikevin bin barê mesûl-yetîyên girîng.

2. 5. Celadet Bedirxan û rojnameya *Serbestî*

Di vê xebata li ber destê we de, dema piştî Şerê Yekemîn û damezirandina CTKê şûn ve wek dewra duyemîn a xebat û nivîskarîya Celadet û Kamiran hatîye binavkirin. Birayên Bedirxanî, di vê dewreyê de bi tevî karê rêxistinî û sîyasî, karê nivîsandinê jî digehînin qonaxeke nû û di *Serbestîya* Mewlanzade Rifat de dest bi karê rojnamevanîyê dikin. Wê demê Celadet û Kamiran, jîyana xwe ya aborî jî bi karê rojnamevanîyê derbas kirine.

“Celadet Bedirxan, edîtorê alîkar ê rojnameya *Serbestîyê* bû”⁶⁸ û Kamiran jî nivîskarê berdewamî yê *Serbestîyê* bû. Xwedîyê îmtiyaz ê rojnameya *Serbestîyê* M. Rifat jî endamekî aktîf û navendî yê CTKê bû.⁶⁹ Neşrîyata rojnameya *Serbestîyê* jî, piştê Şerê Giştî geştiyê statuyeyeke nû. Ji vê demê şûn

⁶⁶ Tarık Zafer Tunaya, *J. b.*, r. 105

⁶⁷ Süleyman Tevfik (Öz zorluoğlu), *II. Meşrutiyet'ten Cumhuriyet'e: Elli Yıllık Hatıralarım, amd. Şaban Özdemir-Tahsin Yıldırım, Dün Bugün Yarın Yayınları, İstanbul, 2011, r. 513-514.*

⁶⁸ Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919, Avesta Yayınları, 1999, r. 95*

⁶⁹ Mewlanzade Rifat, *Türkiye İnkılabının İcyüzü*, Pınar Yayınları, İstanbul, 2000, r. 270

ve *Serbestî*, wek neşrîyateke Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê (CTKê) weşana xwe domandîye. Abdurrehîm Rehmî yê Hekarî di nivîsa xwe ya bi navê "*Kurd û Kurdistan*" de, di derheqê vê têkilîyê de weha dibêje: "Rojnameya *Serbestî*, *Jîn û Kurdistanê* ji bo parastina hiqûqa me ya millî hatine texsîskirin. Divê mutleqe li her cîyê Kurdistanê bi berdewamî bêne belavkirin, temînkirin û bi dîqet bêne mutaleakirin... Û ji bo ku abonetîya van rojnameyan bêtir bibe, divê ehemîyetekî zêde bête nîşandan û bûhayê abonetîya rojnameya rojane ya *Serbestî* û kovarên heftane yên *Jîn û Kurdistanê* rasterast ji bo navenda cemîyeta me bêne şandin... Kurdistan, li bende ye ku her kes wezîfeya xwe bêkêmanî pêk bîne."⁷⁰ Ji van agahdarîyan jî têtê fêmkirin ku *Serbestî*, piştê damezirandina CTKê, wek weşaneke rojane ya cemîyetê hatîye neşirkirin.

Tiştê ku hetanî vê gavê me tesbît kirîye, wê demê ji xeynê *Serbestî*, her du birayan, di rojnameya Saîd Molla ya *Türkçe İstanbulê* de jî nivîsandine. Di vê xebata li ber destê we de, heft nivîsên Kamiran û çar nivîsên Celadet Bedirxan ên di vê rojnameyê de hatine wergerandin û pêşkêşkirin. Ji xeynî nivîsên van herdu rojnameyan, sê nivîsên Kamiran Bedirxan jî di *Îctihada* Abdullah Cevdet de hatine belavkirin.

⁷⁰ Hekkarîli Abdurrahîm Rahmî, *Kürdler ve Kurdistan* [*Kurd û Kurdistan*], *Serbestî*, no: 483, 2 Mayıs 1919, <http://www.kovarabir.com/hekkarili-abdurrahim-rahmi-kurdler-ve-kurdistan/>, 19 Şubat 2015

Bêguman di nav endamên CTKê de, gelek şexsîyetên namdar ên xwedî wesif û meslekên cûr bi cûr jî hebûn. Çawa ku paşê di damezirandina Cemîyeta Teşkilatê Îctimaîyye û hewldanên sîyasî yên din de jî dîyar dibe, têkilîya M. Rifat ê xwedîyê *Serbestîyê* û her du lawên M. Emîn Elî Bedirxan; Celadet û Kamiran bêtir nêzîkê hev bûye. Di nav rûpelên *Serbestîyê* de jî, ji mala Bedirxanîyan, bêtir nivîsên van her du birayan hatine neşîrkirin. Qasê ku min tesbît kirîye, bi navê "*Ormançılık*" nivîsek Safder jî di rojnameya *Serbestîyê* de hatîye belavkirin. Di nav "*Kadınlar Dünyası [Cîhana Jinan]*" a ku ji alîyê hevjinê M. Rifat ve di hate neşîrkirin de jî nivîsên hin jinên Bedirxanîyan hene; Mezîyet, Fahrîye û Mes'adet Bedirxan. Ji nava van jinên Bedirxanîyan Mezîyet Xanim, keça Emîn Alî Beg bû.

2. 6. Di nav hejmarên berdest ên *Serbestîyê* de nivîsên Celadet Bedirxan

Ji ber ku hemû hejmarên *Serbestîyê* li ber destê me nîn in, nayê zanîn ku ji serî heta dawîyê û bi taybetî jî ji hejmarên 500. şûn ve, çend nivîsên wan hatine belavkirin. Û herweha *Serbestî* li ser hev çend hejmar hatine çapkirin. Di nav rûpelên berdest ên *Serbestîyê* de, li ser navê Celadet Bedirxan nivîsên li jêrê hatine neşîrkirin.

- Celadet Alî Bedirhan, *Kürdler ve İttihat (İTC) Siyaseti [Kurd û sîyaseta Îtîhadê]*⁷²

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistana Kürd Memurlar [Kurd û Kurdistan: Memurên Kurd ji Kurdistanê re]*⁷³

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistana Doğru-2 [Kurd û Kurdistan: Ber bi Kurdistanê ve-2]*⁷⁴

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan-3 [Kurd û Kurdistan-3]*⁷⁵

⁷² *Serbestî*, no: 209, 22 Şubat 1919

⁷³ *Serbestî*, no: 482, 1 Mayıs 1919

⁷⁴ *Serbestî*, no: 484, 3 Mayıs 1919

⁷⁵ *Serbestî*, no: 487, s: 1-2, 6 Mayıs 1919

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerde İttifaq [Kurd û Kurdistan: İttifaq di nav Kurdan de]*⁷⁶

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürd Edebiyatı-Zîn û Mem-1 [Kurd û Kurdistan: Edebîyata Kurdî- Zîn û Mem-1]*⁷⁷

- Celadet Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürd Edebiyatı: Zin ve Mem-2*

*[Kurd û Kurdistan: Edebîyata Kurdî- Zîn û Mem-2]*⁷⁸

2. 7. Nivîsên di rojnameya *Türkçe İstanbulê de*

Wekî ku berîya nûha jî hate gotin, di weşanên cûr bi cûr ên wê demê de nivîsên herdu birayên Bedirxanî hatine weşandin û belavkirin. Bi taybetî jî nivîsên wan, di weşanên mixalîf ên îstibdad û rêxistina İttîhad û Terakkî de hatine weşandin. Bi zelalî nayê zanîn ku nivîskarîya wan a di rojnameya *Türkçe İstanbulê de* daîmî yan demkî bûye. Li ser vê têkiliyê, Mesûd Serfiraz ji Suleyman Tevfik neqil dike û dibêje: “Li gorî bîranînên Suleyman Tevfik, Celadet û Kamiran Bedirxan di rojnameya *Türkçe İstanbul* (1918, Stenbol) a Saîd Molla de nivîskarîya daîmî kirine. Û dîsa li gorî wî, Saîd Molla, Caladet û Kamiran “İngiliz Muhibler Cem’iyeti [Komeleya Hazkirîyên İngilizan] ava kiribûn û îdarexaneyê rojnameyê jî kiribûn navenda vê komeleyê.”⁷⁹

Wek karkirina rojnamevanên profesyonel, bi daîmî nivîsandina wan a di vê rojnameyê de mimkun e. Lêbelê agahdarîya li ser endametîya her du birayên Bedirxanî ji bo Komeleya Hazkirîyên İngilizan, nehatîye piştrastkirin. Li gorî lîsteya ku ji aliyê dîrokzan T. Z. Tunaya ve hatîye çapkirin, navê birayên Celadet û Kamiran Bedirxan têde nîne. Navê Saîd Molla (endamê berê yê Şûraya Dewletê) wek serokê duyem û rojnameya *Türkçe İstanbul* jî wek weşana fermî ya Komeleyê derbas dibe.⁸⁰

⁷⁶ *Serbestî*, no: 489, 8 Mayıs 1919

⁷⁷ *Serbestî*, no: 491, 10 Mayıs 1919

⁷⁸ *Serbestî*, no: 495, 14 Mayıs 1919

⁷⁹ Mesûd Serfiraz, *Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangerîya Kitêbên Kurdî di dewra Osmanîyan de (1844-1923)*, *Weşanên Peywend*, 2015, Stenbol, r. 70

⁸⁰ Tarık Zafer Tunaya, *Türkiyede Siyasal Partiler*, Cil: 2, 4. Baskı, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r. 463, 467

Rojnameya *Türkçe İstanbul* (TI), yek ji wan weşanên mixalîf bû ku bi serpereştîya Saîd Molla hatiye belavkirin. Rêvebirên Îttîhad û Terakkî û paşî jî Mistefa Kemal û hevalên xwe, hevkarîya giştî ya mixalifan û ev cûre weşan û rêvebirên wan, bi hevkarîkirina digel tevgera neteweyî ya kurd sûcdar dikin. Di vê xebata berdest de, ji nav rûpelên rojnameya *T. İstanbul*, ev çar nivîsên Celadet Beg hatine wergerandin.

- Celadet Alî, *Zabitanın Terfihî [Terfîhkirina Zabîtan]*⁸¹

- Celadet Alî, *Develer [Hêştir]*⁸²

- Celadet Alî, *Geçit [Bihûr]*⁸³

- Celadet Alî, *Borazanin Kurşunu [Guleyê Borîjen]*⁸⁴

2. 8. Kurd û sîyaseta Cemîyeta Îttîhad û Terakkî (CIT)

Celadet Bedirxan di hengameya salên Şerê Yekemîn ê Cîhanê de li gelek cî û cebheyan bi rutbeya zabîtê îhtiyatê wezîfe kirîye, bûye şahidê gelek bûyerên girîng û trajîk. Bi taybetî jî encamên sîyaset û kirinên rêkxistina Îttîhad û Terakkî, bi giştî li hemû deverên Împeratorîyê û xusûsen jî di nav civata kurd û ermenan de birînên pîrr giran vekirine û rûxandinên pîrr mezin anîne meydanê. Bi gotina Sebrî Suleyman; “Piştî tehcîra ermenan, di 16yê Gulana 1916an de tehcîra kurdan jî dest pê kiribû.”⁸⁵ C. Bedirxan dibêje: “Ew pîlana ku ji aliyê komîteya merkezî ya Îttîhad û Terrakî ve ji bo ermen û kurdan hatibû tenzîmkirin, tetbîq bû. Di encama wê de qetlîama ermenan çêbû. Li gor pêdivîya pîlanê, kurd ji gelek ciyên Kurdistanê ve, qefle bi qefle ber bi wîlayetên rojava ve ku rûniştvanên wan turk bûn, hatin tehcîrkirin... Piştî ku Şerê Giştî xelas bû, ez gehîştim Stenbolê û min li ser ewraqên Mudirîyeta Mihaciran tetkîkek kir. Di encama vî tetkîkê de dîyar bû ku nifûseke qasê 650.000an ji Kurdistanê rêkirina ji bo wîlayetên rojava yê Anatolyayê.”⁸⁶ “Di dema Şerê Yekem de nêzîkî 700 hezar

⁸¹ *Türkçe İstanbul*, no: 126, 5 Nisan 1919

⁸² *Türkçe İstanbul*, no: 129, 8 Nisan 1919

⁸³ *Türkçe İstanbul*, no: 147, 26 Nisan 1919

⁸⁴ *Türkçe İstanbul*, no: 191, 9 Haziran 1919

⁸⁵ Sabri Süleyman, *Tarihten Bir Sayfa [Rûpelek ji Dîrokê]*, Kurdistan, no: 5, 3yê Nisana 1919

⁸⁶ Emir Celadet Alî Bedirxan, *Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektûb, Doz Yayınları, Stenbol, 2010, r. 46-47*

kurd bi zorê ji welatê xwe hatin koçberkirin û ji nivî zêdetir di rêyan de mirin. Kurd jî bûn qurbanên polîtîkaya nijadkûjîya Şerrî.”⁸⁷

Bûyer û trajediyên ku di pêvajoya Şerê Yekmîn ê Cihanê de bi serê milletê kurd ve hatine, encamên sîyaseteke plankirî ya Îtihad û Terakkî bû. Armanca wî sîyasetê; bi rêbaza koçberî, kuştin û cînayetan milletê kurd ji cî û erdê wan der bixin, wan bê war û welat bihêlin. Ji ber vê, ev sîyaseta Îtihad û Terakkî, ji aliyê Celadet Bedirxan ve, wek “sîyaseta cinayetê” hatîye binavkirin.

“Dema ku ez wek zabitê îhtiyatê li Iraq, başûrê Kurdistanê, Kafqas û ciyên din de dixebitîm, min bi nalîn û girînê, eserên maddî û tirsnakên şayîyên (deng û basê belavbûyî) di derbarê tunekirina kurdan li Stenbol û ciyên din ên memleketê Osmanî de guhdar kirin û dîtin. Ev cîneyetên ku ji bo milletekî fedekar û mezlûm rewa hatibûn dîtin, ji nav eserên şexsî yê hikumeta Îtihadê, şaheserekî tewr mezin bû.

Walî û aktorekî bi ezamet û qudret ê vê karesatê ku bi hezaran mihacirên kurd di germşewata sehra Mûsilê de terkî mirinê kiribû, piştê îcreatê vegeyriyabû Stenbolê û li ser sendalîya postê daîreyek fermî bi dilşadî gotibû:

‘Wekî yê ermenan, me kokbirrekî wisa anî serê kurdên xayîn ên dewletê ku...’⁸⁸

“Di hejmara 5ê Gulana 1919an a rojnameya *Serbestîyê* de, encam û kirinên sîyaseta Îtihad û Terakkî bi devê memûrekî dewletê weha hatine neqilkirin: “Memûrê resmî yê ku di nava vê hefteyê de ji wê deverê ve hatîye, bi zimanekî dilşewat behsa rewşa kurdên wê derê kir. Li gorî gotina wî, her roj bi hezaran kurd ji ber birçîtî û sefaletê dimirin.”⁸⁹

⁸⁷ Sovyetler Birliğı Bilimler Akademisi Doğu Bilimleri Enstitüsü, *Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketi, Jına Nû Yayınları, 1991, Sweden, r. 109*

⁸⁸ *Celadet Âli Bedirhan, Kürdler ve İttihat Siyaseti, Serbestî, no: 209, 22 Şubat 1919*

⁸⁹ *Serbestî, Kürd muhacirleri, no: 486, 5 Mayıs 1919*

Celadet Bedirxan di berdewamîya nivîsa xwe de, kirinên bi vî rengî, bi sîyaseta nijadperest a Îtihad û Terakkî ve girê dide û dibêje:

“Bi dîtina me, sîyaseta hikûmeta berê, sîyaseta cînaletê bû û me nedixwest di demeke wisa bi buhran û êşên bêhejmar ên milletê de, wan bûyerên dilşewat bînin rojevê û tevbidin.

Piştî ku me wezîfeya xwe ya di cepheyê de tamam kir û em vejeriyên Stenbolê, em rastê parastinên xeternak ên hin welatîyan hatin -em bi nîyeteke baş ji wan re dibêjin dilsaf- ku dixwazin bi nêrîneke teng li hemberî heqîqetan çavên xwe bigrin. Hikûmet di derbarê vê xusûsiyetê de îhmalkar e û vê yekê me mecbûrê şopanî û nivîsîna hinek meqaleyan kir.

Çawa ku di sernivîsa meqaleyê de “Kurd û Sîyaseta Îtihadê” hatîye lêkirin, her kesê ku wekî min di herêmen navborî de xebitîne, vê sîyaseta Îtihadê ji nêzîk ve û bi temamî dizanin. Dema ku pêwistî hebe, bêyî ku em propaganda bikin, dikarin bi tevî şahidên namdar belgeyên rastîn pêşkêş bikin.

Vê gavê ez dê bi kurtebirrî behsa vê sîyaseta cînaletê bikim:

Xulesa, ew ên ku ji bakurê Kurdistanê hatine koçberkirin, wekî kulmekî qûmê li sehayên Mûsilê hatine belavkirin; nizanim bi hezaran kurd çawa ji vî birçîtî û sefaletê xelas bûne û muwafiqê îlticakirina bajarê Mûsilê bûne. Ew ên ku gihîştine Mûsilê, bi girîn û nalînan li ser rê û cadeyên bajar dirêj bûne, bi dengêkî nizm û gotinek kurt dibêjin “Ez bextê Xudayî, serî çiçâyê!” Ji alîyê hemû gelê Mûsilê û zabîtayên orduya şeşemîn ve baş tete zanîn ku van mirovan terkî heyat bûne.

Di derbarê vî babetê de murecatê qeydên şaredarîya Mûsilê bête kirin, îsbat û dîyar dibe ku bi erebeyên şaredarîyê her roj bi sedan cenaze hatine berhevkirin.

Kurd, di her terefê wîlayetên Şerqê de rastê zilm û zordarîyê hatine, lêbelê em dikarin bibêjin yên ku rastê

darbeyên pîrr dilşewat ên xwîndar hatiye xelkê Dêrsimê ye.

Li ber destê me belgeyên serbihûrîya sefaleta bi hezaran felaketzadeyên ku ji mal û welatê xwe ve hatine koçberkirin û şhadeta bi sedan kesên ku bêşûc hatine kuştin û darvekirin hene.

Xuya dibe ku mihacirên kurdan jî wekî yê ermenan rastî zulm û zordarîyeke mezin hatine, lê mixabin alîkarîyên ku bi desteka hikûmetê ji bo mihacirên rum û ermenan hatine kirin, ji bo mihacirên kurdan nehatine kirin.

Em li gorî beyana memûrekî mulkîyeyê ku bêdestûr ji ciyê memûriyetîya xwe ve hatibû Stenbolê, di derbarê zulm û karesatên ku dema hikûmeta bihûrî bi serê vê milleta mazlûm ve hatibûn û her weha bi guhnedarî û îhmala hikûmeta nûha de, hinek notan qeyd dikin:

Hikumeta bihûrî ya Îtihad û Terakkîyê biryara tune kirina milletê kurd dabû; beşekê wan kuştin û beşek din jî bi sefalet û birçîtîyê tune kirin, çend sed hezar kurdan jî koçberê Anqera, Konya û wîlayetên dewrûberê wan kirin, li van deran gund bi gund belavkirin. Di belgeyek veşartî yê Wezaretê Daxilîyeyê de, li ser tehcîrkirina mihacirên kurd weha hatîye gotin:

1. Mihacirên kurd wê bi paş ve neyin ve gerandin.
2. Di seha memûriyetîya we de (ji bo memurên pilebilind ên wê herêmê) ji bo îskana kurdan çi arazî û gund hene?
3. Divê têkilîya mihacirên kurd bi der ve re tune be.
4. Di dabêşkirina mihacirên kurdan de nûqteya herî girîng ev e, ku di ciyê îskana wan de rêjeya xaneyên kurd ji dehan zêdetir nebin.

Di dema koçberkirinê de hikûmeta Îtihad û Terakkîyê, sê qurîş û nîv (3.5) yewmîye bexşê wan dikir lê belê li wan deran bûhayê nanekî panzdeh qurîş bû. Bi vî awayê, ev bêçareyên belengaz di koçberîyê de jî mehkûmê îdamê kirine.

Dîyar dibe ku di demên dawîyê de ew yewmîye jî hatine birrîn.

Di vî belgeyê de, bendên li ser venegerandina koçberan û di çiyê danîştinê de dabeşkirina wan a bi ser deh xanîyan ve, nîşanê zulm, çewisandin û tunerkirina vî milleta dêrîn e.

Hikûmeta Îtihad û Terakkîyê, li her derê propagandaya prensîbê milletan dike lêbelê dixwaze dahatûya xwe li ser wêrankirina milletên din ava bike. Kurd bûne qurbanê vê sîyasetê, em nizanin hikûmeta nûha hîn jî li benda kîjan firsetê ye û çima ji bo refaha kurdan alîkarîyek tewr biçûk jî nayê kirin.

Me di rêzeyên jorê de tehçîra (koçberîya) milletekî mezlum nivîsîye, anûha li koçberîyê ji ber birçîtîyê dimirin û ev mirina wan hîn jî bi tinazîya devkenîyekê tête temaşekirin.

Em kurd, dixwazin ev mesele ji alîyê hikûmeta me ve bête çareserkirin. Eger ev nebe, wekî unsirên din ên ku rastê zulma hikûmeta Îtihadê hatine, em kurd jî ne aciz in, karin mezlumîyeta xwe bi qîrîqîrê bigehînin dinyaya medenî.

Ji ber vê yekê, divê hikûmet wekî serfikirina xîreta ji bo pêkanîna îskan û îaşeya mihacirên ermen û ruman, mezinahîyê nîşan bide û heqê jibîrkirî yê vî xelkê tesdîq bike û hinek alîkarî bide mihacirên kurd jî.”⁹⁰

2. 9. “Îttifaq di nav kurdan de”

“Tarîx, dagirtîye bi nimûneyên enqazê milletên ku ji ber bê îttifaqîyê mirine.” (Celadet Bedirxan)

Meseleya îttifaqa di nav kurdan de, ji berê ve hetanî roja îro bi berdewamî hatîye gengeşekirin. Dûr û nêzîk, dema em bala xwe bidin dîroka kurdan, çî dema ku di nav komeleya kurd de bûyerên girîng pêk hatine û dewreyên nû hatine derbaskirin, meseleya yekgirtin û îttifaqa kurdan jî hatîye rojevê û pîrrî caran jî ji ber bê îttifaqîyê kurd têk çûne. Ji ber vê yekê

⁹⁰ Celadet Âlî Bedirhan, *Kürdler ve İttihat Siyaseti, Serbestî*, no: 209, 22 Şubat 1919

meseleya îttifaq û bêttifaqîyê, ji berê ve di nav kurdan de tê gengeşekirin û zeaffiyeteke girîng a komeleya kurd teşkil dike. Dîyarkirina sebebên sosyolojîk, psikolojîk û sîyasî yên vê zeaffiyetê pirr girîng in. Celadet Bedirxan jî, di destpêka pêvajoya dubendîya nav Komela Pêşxistina Kurdistanê (KPK) de, dixwaze bi hinek nimûneyên dîrokî carek din bala kurdan bikşîne li ser girîngî û pêdivîya vê meseleyê û dibêje:

“Em ji her demê bêtir mihtacê îttifaqê ne.

Di berdewamkirin û dahatûya civakan de, bi taybetî jî di dema pêkhatin û geşbûnê de, ciyê îttifaq û hevkarîyê mewqîyeke bilind û bijarte digire. Girîngîya vê heqîqeta berçav, bi awayekî berfireh ji aliyê ûlemaya rojava û şerqê ve jî hatîye îzehkirin û dubarekirin.

Li ser vê xusûsê, di dînen qedîm û yên piştê wan de jî, gelek hikum û dogma hene.

Bîlhese di dînê Îslamê de ku îftixara me ye, li ser vê xusûsê di gelek ayetên kerîme û hedîsên şerîf de îzehet hatîye kirin.

Dema em behsa lazimayî û dereca pêdivîya piştgirî û îttifaqa kurdan dikin, îro û bi taybetî jî ev dema dîrokî ya ku em ji nav derbas dibin, ji her demê bêtir pêdivîya wê bi îttifaqê heye. Lê mixabin divê em bidin zanîn ku di demên bihûrî de li ser vê xusûsiyetê hinek xeletî jî hatine kirin.

Di encama sûtîmalbûna nefsa bilind a kurdan de, di xwîyê wan de guhartin çêbûne ku em vê guhartinê wek ezezî û xudbînîyê tarîf dikin. Naye înkarkirin ku vê jî di nav kurdan de ji belavbûna fehma “menem dîger nîst” re gelek xizmet kirîye.

Kurd; ji ber ku ne weqfê bingehên îlmî yên îttifaqê ye, asabîyeta di ruhê wî de û hêrs û dijarîyên ji ber tengasîyên warê jîyana wî, bûne sebebê jîyanek berfireh, serbest û hurîyetek mutleq ku hîç qeyd û astengekê qebûl nake. Ji ber vê, yekîtî û îttifaqek bextewar, tercîhê temînkirina refah û seadeta şexs û civaka xwe kirîye.

Lazim e li ser vê xalê hinek îzehet bête kirin. Lewra mimkun e ji ber agahdarîyên ku di derheqê dilêrî û mîrxasîya kurdan de hatine dayin, hinek encamên nedirust ji wê bêne derxistin; ku ev di çarçoveyek takekesî de bêne tetbîqkirin, mimkun e ji wê zanên wisa peyda bibin ku kurd îteatê heq û neheqê, baş û nebaşîyê nake û nizane.

Lêbelê di rastîyê de bîlekisê wê, kê m ferdên civakên xusûsî û bijarte wekî yê kurdan bi nîyeteke baş dijîn, adeten wek histuxwarkirina dîndarekî îteatê reîsê malbat û qebîleyê dikin.

Hemû îxtilaf; ji ber hinek serokên qebîle û eşîretan e ku bi desthilatdarîya li ser qebîleya xwe ya biçûk kêfxweş dibê. Me sebebên vê îxtilafê erz kiribûn, heqîqeten jî di pişt vana de nîyeteke xerab nîne, lêbelê di netîceyê de pratîka dîrokê nîşan dide ku ev yek li hemberê bîdestxistin û pêkanîna armancê bûye asteng.

Ji ber ku sebebên îlmî yên vê rewşa mewcûd a hanê bi temamî nehatine têgehîştin, îro hema hema ber bi wendabûnê ve ye. Feqet bi tevî temînkirina dewamîya vê wendabûnê, divê di derheqê vê xalê de asoya kurdayetî û serokeşîrên kurdan bihête îrşadkirin û ronahîkirin.

Me behskiribû ku îxtilafê di dîrokê de çî problem derxistine meydanê. Em mînakek bidin: Her kes dizane ku Yawiz Sultan Selîmî piştî vegeza Sefera Çildêranê bi wasîteya Şerafeddînê Bedlîsî⁹¹ çawa Kurdistan bêşer bi xwe ve girêdaye. Li vê derê îzehetkirina wê ne hewce ye. Em tenê krîtîka rewşa dîrokî ya wê demê ya Kurdistanê bikin.

Piştê ku ji ber hinek tesîrên malûm hukumdarîya Merwanîyan têkçû ku wê demê navenda wan Diyarbekir bû, Kurdistan ji alîyê çend mîrnişîfîyan ve dihatte îdarekirin û her yekê wan ji komên eşîretên biçûk pêk hatibûn. Wê demê bi mîqdarê nifûsa xwe û firehîya

⁹¹ Bi îxtimaleke mezin li vê derê xeletîyek biçûk çêbûye, li şûna navê Şerafeddînê Bîtlîsî, divêya Îdrîsê Bîtlîsî bihata nivîsîn.

herêma di bin desthilatdarîya wan de konfederasyonek teşkîl kiribûn û mimkun bû ku bi têkilî û qeweteke hîn xurt dewletek damezirînin. Lêbelê ji ber terz û tevgera nexweş, mîrnişînên navborî peyderpey parçe bûne û hejmara mîrnişînên ku ketine bin nîrê Yawiz Sultan Selîm, bûye bîstûyek (21).

Ev mîrnişînên misilman, bê şerkirinê radestî Hezretî Yawiz Sultan Selîm bûn û ketin bin nîrê wî. Wî jî hesabê berjewendîyên xwe kir; bi dayina baceke hindik hemû mîrnişînan tevî nav sînoren Memalîkî Osmanî kir, statuya musteqîlî û xudmuxtarî ya di kar û barê hundirîn de neda hemû mîrnişînan.

Ev mînaka bijarte ya xudmuxtarîya îdarî, mixabin di Kurdistanê de demeke dirêj dewam nekirîye û mîrnişînên navborî ji ber îhmalkirina du tesîrên bingehîn; nifûs û sazûmana îdareya navxweyî, seabên pêkhatin û pêşveçûna wan, peyderpey esas û şiklê muxtarîyetîyê wenda kirine.

Du tesîrên girîng hene ku bûne seabê vê jihevênê: A yekem û herî bi bandor; rêvebirîya xerab a walîyên wîlayetên dorûberê ye, ku dixwazin bi fitneyan yê din mecbûrê îstifayê bikin. Ewa din jî, îxtilafa di navbera mîrên kurdan de ye ku carina tezahur dike. Ev îxtilaf hîç wextekî ji ber meseleyên bingehîn û heyatî peyda nebûye. Her wekî ku me li jorê jî got, ji xeynî îhtirasa ezezî û xudbînîyê, tu seabekî din ê vê îxtilafê nîne. Ev îxtiras û ezezîya fecî, di çêbûna kultura millî ya kurdan de xwedî roleke girîng e. Ku mîrnişînên navborî, statuya xwe ji dema Yawiz Sultan Selîm û xelefên wî ve hetanî îro berdewam bikira, dê ji çêbûn û pêşketina zimanê neteweyî yê milletê kurd re firseteke hîn musaîd peyda bibûya, heta vê gavê dê bi awayekî hîn sererast rêz û qeydeyên ziman bihatana destnîşankirin. Dîyar e ku ev sernekevtin, ji ber kêmanîya piştgirî û îttifaqeke zexm e.

Lewma, ji vir şûn ve, divê em vê xala girîng û heyatî baş îdrak bikin û her dem li hemberî îxtilafên tewr biçûk jî îtiraz bikin û bizanin ku qedera me di destê Awrupayê de ye û ew jî me bi ehemîyet û balkêşîyê krîtîze dikin. Tarîx, dagirtîye bi nimûneyên enqazê milletên ku ji ber bê îtîfaqîyê mirine.

Dostekî min ê îngiliz di axaftineke me de gotibû: Hûn bala xwe bidinê, em pêncî hezar îngiliz karin di nav du seetan de li dorûberê fikrekî berhev bibin û ku du seetên din jî derbas bibin, ew pêncî hezar dibin sed hezar. Belkî hemû naverok û esasê teşkîlata mezin a îngiliz, muvaffaqîyeta vê sîrrê ye. Qe nebe ji vê şûn ve, em vê mînaka hanê, di çûyina vê guzergaha kortal û asê de ji xwe re wek ronahîyeke bi kar bînin. Û bila dilê hemû welatîyan bibe wek ro û ronahî bide."⁹²

2. 10. Krîtîkek li ser çapa nû ya *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî

Yekemîn çapa matbû ya *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, 224 sal ji nivisandina wê şûn ve ji alîyê "Kürd Tammim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti [Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanîna û Weşanan]" ve di Nîsan 1919yan de tête kirin. Di hejmara 17 ya kovara *Jînê* de mizgînîya çapa *Mem û Zînê* weha hatiye ragehandin: "*Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, bi awayekî gelek spehî hatiye çapkirin."⁹³ Li gor agahdarîyên C. Bedirxan; hewldanek ji bo çapa berhema navborî ya Ehmedê Xanî, di sala 1310 (1894)an de ji alîyê bavê wî ve çêbûye lêbelê ev hewldan bi ser neketîye.⁹⁴

Celadet Bedirxan di krîtîka xwe ya li ser *Mem û Zînê* de dibêje:

⁹² Celadet Bedirxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerde İttifak [İttifaq di nav kurdan de]*, Serbestî, no: 498, 8 Mayıs 1919

⁹³ *Jîn: Kovara Kurdî-Tirkî (1918-1919)*, Cild: IV, Werger: M. Emîn Bozarslan, *Weşanxaneya Deng, Uppsala/Sweden, 1985*, r. 762

⁹⁴ *Emir Celadet Alî Bedirxan, Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektûb, Doz Yayınları, Stenbol, 2010*, r. 48

“*Mem û Zîn*”a Ehmedê Xanî, cara pêşî ye ku li welatê me tête çapkirin. Em di krîtîkên edebî yên Şerqê de rastî navê wî jî nayin. Lêbelê ev berhem di nezera oryantalistên Awrupayî de xwedî rexbeteke fewqalede ye. Ev berhem, di bajarên muxtelîf ên Awrupayê de, berfîya çend salan bi zimanê îngilizî, fransizî û almanî hatîye tercumekirin û gelek çapên wê yên rengîn çêbûne.”⁹⁵

Hemzeyê Muksî jî di pêşgotina çapa nû ya *Mem û Zînê* de, ji alîyê neteweyî û edebî ve girîngîya berhemê tîne ziman û dibêje: “Her gel û neteweyê ku daxwaza heyî û karîna xwe ya neteweyî bike, divê ku ji destpêkê ve girîngîyeke xurt bide edebiyata xwe û eserên xwe yên edebî.”⁹⁶

Ji ber ku yekemîn çapa *Mem û Zînê* ji alîyê Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Zanîna û Weşanan ve hatîye kirin, bi kurtayî be jî bi bîrxistina damezirandin û xebatên wê girîng e. Komeleya navborî, pêşiyê di sala 1910an de bi navê KNMC tête damezirandin û di pêvajoya Şerê Giştî de xebata wê tête rawestandî.

Di talîmatnameya wê de mexseda KNMCê weha hatîye ragehandin: “Di nava ewladên weten de yên ku herî zêde ji nîmetên perwerde û zanîna mehrûm man e; kurd in. Mexseda me; di nav kurdan de belavkirina zanîna perwerdeyî û pîşekarîyê ye.

Komeleya me dê bixebite ku ji bo zarokên kurdan li Stenbolê mektebeke seretayî damezirîne û pêdivîyên wê temîn bike...”⁹⁷

Talîmnameya komeleyê, ji 15 bendan pêk hatîye û di binê wê de navê van damezirêneran hatîye nivîsandin:

⁹⁵ Celadet Bedîrxan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürd Edebiyatı*. [Kurd û Kurdistan: Edebiyata Kurdî: *Mem û Zîn-2*], *Serbestî*, no: 495, 14 Mayıs 1919

⁹⁶ Hemze, *Pêşpeyva Mem û Zîn, Jîn: Kovara Kurdî-Tirkî (1918-1919)*, Cild: IV, Wergere: M. Emîn Bozarşlan, *Weşanxaneya Deng, Sweden, 1985*, r. 846

⁹⁷ Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye’de Siyasal Partiler (1918-1922)*, cilt: 2, İletişim Yayınları, 2010, İstanbul, r. 224

“Bedirxanzade Emîn Alî Beg
 Dr. Abdullah Cevdet
 Bedirxanzade Mîdhad Beg
 Seyfullah Begê mebûsê Erzerumê
 Taha Efendî yê mebûsê Hekarîyê
 Tewfîq Begê mebûsê Wanê
 Bedirxanzade Kamil Beg
 Bedirxanzade Abdurehman Beg
 Mihemed Efendî yê mebûsê Gêncê
 Huseyn Avnî Begê Mîr Sêfeddînzade
 Mîralay Mehmûd Samî Beg
 Mehmed Faîk Efendîyê Diyarbekirî (muvazzafê Mehke-
 meya Şerîye ya Misrê)
 Bedîûzzeman Seîd Efendî
 Xelîl Xeyalî Efendî yê Modkî
 Kurdîzade Ahmed Ramîz.”⁹⁸

Piştî rawestandina Şerê Yekem, sala 1919yê li Stenbolê bi girêdayî CTKê ji nû ve Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanîn û Weşanan tête damezirandin. Nûçeya damezirandina komeleyê di rojnameya *Serbestî* de weha hatîye ragehandin:

“Komeleya Kurd ji bo Belavkirina Neşrîyatê, bi mexseda îslehkirin û standartkirina kurdî, piştî îlankirina Meşrutîyetê hatibû damezirandin û bi tevî rêxistinên din mudetek xebitîbû. Di dema Şerê Yekemîn de xebata Komela Kurd ji bo Belavkirina Neşrîyatê hate rawestandin. Piştî xelasbûna Şer, bi çapkirina *Jînê*, Cemiyetê ji nû ve dest bi xebata xwe kirîye.”⁹⁹

Di vê dewreya nû de komele, ji bo pêşxistina xebatên li ser ziman û kultura kurdan, bi girêdayî CTKê ve wek komeke xebatên kulturî hatîye damezirandin û herweha kargêrîya kovara *Jînê* jî dewrê komeleya navborî kirine. Kêmasîyek herî girîng ev e ku desteya kargêrîya vê dewreyê ne zelal e. Di bernameyê de li ser çarçove û çalakîyên komeleyê weha hatîye

⁹⁸ J. b., r. 224

⁹⁹ *Kürd dilinin standartlaştırılması, Serbestî*, no: 480, 4 Mayıs 1919

gotin: “Sînorên xebata komeleyê û armanca karê me ev e; ku em bernamekyea ne sîyasî, temamen zanyarî û qutûbîrr pêk bînin û derxînin meydana xebatê.”¹⁰⁰ Bername û heman demî em karin bibêjin nexşerêya xebata komeleya navborî, ji 20 bendan pêk hatîye:

“Bername:

1. Komele dê kovareke zanyarî ya hefteyî biweşîne.
2. Ew pirtûk û dîwan û helbestên ku hemî bêjezan û hozan û zanyarên kurd bi zimanê kurdî afirandine, komele dê wan bi awayekî rast û bedew bide çapkirin.
3. Komele dê ferhengeke kurdî sererast bike û biweşîne; hemî zarên kurdî dê di wê da cî bigirin.
4. Ji pirtûkên rêzimanê yên heyî kîjan aqilane be, komele dê wan bide çapkirin.
5. Ji bo pêkanîna dersên bi zimanê kurdî di xwendegên pêşîn da, komele dê pirtûkên pêwîst biweşîne,
6. Komele dê kovareka peyvên pêşyan ên kurdî sererast bike û biweşîne; peyvên pêşyan ên ku di zarên cure-cure da tên gotin, ên her zarek dê di kovarê da beşek pêk bînin.
7. Komele dê haydarîyên li ser adet û toreyên kurdî yên her hêlek berhev bike; her weha, dê çîrok û kurteçîrok û stranên gelêrî yên kurdî berhev bike.
8. Komele dê li ser cografya û tarîxa kurd a mêjîn û nû pirtûkan bîne meydanê.
9. Ew pirtûkên ku bi zimanên Rojhilat û Rojava li ser Kurdistanê û kurdan hene, komele dê wan wergerîne û biweşîne.
10. Komele dê serpêhatîyên kurdên naskirî yên mêjîn û nûhayîn biweşîne.
11. Komele dê di merkeza xwe da û li ciyên pêwîst pirtûkxaneyên ji pirtûkên herêmî û bîyanî pêkhatî veke.
12. Komele dê dersxaneyên şevîn veke.

¹⁰⁰ *Jîn: Kovara Kurdî-Tirkî (1918-1919), Cild: 2, Werger: M. Emîn Bozarşlan, Weşanaxaneyê Deng, Uppsala/Sweden, 1985, r. 492*

13. Ew hêlên ku kurd li wan dijîn, komele dê heyetên lê-gerînê bihinêre wan hêlan.
14. Komele dê bixebite ji bo ku çapxaneyek ji xwe ra saz bike.
15. Komele dê bixebite ku di nava karkerên kurd da sinifên îhtiyatî û vêkxistinên kooperetîfî pêk bîne.
16. Ew zarokên kurd ên ku li Stenbolê ketine sefaletê û serî li wan gerîyaye û bêhişkî digerin, komele dê mîqdarê mimkun ji wan bi şagirdî bide bal dikandarên cure-cure û ji bo ku ew bi dûzen biçin ser karê xwe, komele dê mesrefa pêwîst jî bide.
17. Komele dê bixebite ku xwendegeheka şevîn a pîşe ji bo zarokên kurd ên sêwî û bêkes veke.
18. Komele dê hêz bide xwe ku ji bo keçên kurd ên sêwî û bêkes xwendegeheka keçan a şevîn veke da ku di wê xwendegehê da keç bêtin hînkirin ji bo pîşeyên malan û xizmetkariyê.
19. Komele dê bixebite ku muzeyek saz bike; ew muze dê ji tiştên şexsî û yên malan ên ku mêr û pîrekên kurd bi kar tînin û her tewir alet û edewatên herêmî bê sazkin.
20. Komele dê bixebite ku xwendegeheka mamostayan a kurdî saz bike.”¹⁰¹

Bi rastî jî dema em bala xwe bidin bernameya komeleyê, dîyar dibe ku ji wê demê ve projeyek pirr girîng dane ber xwe lê mixabin ew proje îro jî pêk nehatîye.

Li ser damezirandina komeleyê, komîsyona pêkhatî û xebata wê, di nûçeyek roja 28 Nîsana 1919 ya *Serbestîyê* de dibêje: “Komîsyona tetkîka eserên kurdî hate damezirandin.” Di berdewamîya sernivîsa nûçeyê de jî weha hatîye gotin:

“Li Stenbolê di navenda giştî ya Cemîyeta Tealîya Kurdistanê de, ji bo lêkolîn û çapkirina eserên şair û alimên gewre yên kurdan, komîsyonek taybet hatîye damezrandin.

¹⁰¹J. b., r. 493-494

Hinek mirovên zana yên ji ehlê îlmiye û mulkîyeyê, ji bo memûrtîya vê komîsyonê hatine wezîfedarkirin. Komîsyonê, lêkolîna xwe ya li ser berhema tîyatroyî ya manzum a *Mem û Zîna* Mele Ehmedê Xanî تمام kirîye. Heşt formayên wê bi awayekî pirr xweşik hatine çapkirin, dê beşên mayî jî di demeke kin de bêne temamkirin.”¹⁰²

Piştî ku çapa pirtûkê xelas dibe, yek ji rêvebirên CTKê Memdûh Selîm Begî, bi munasebeta çapa nû ya *Mem û Zînê* dibêje:

“*Mem û Zîn* hetanî vê gavê li her derê Kurdistanê yan bi yek-du nûskeyên destnivîs yan jî di bîra me de bi jiberkirinê gehiştîye hetanî îro. Ji vê gavê şûn ve, wê di serê rêzeya edebiyata kurdî de cîyê xwe yê payebilind bigire û bêdawî bijî. Lêkolîna edebî ya li ser *Mem û Zînê*, wezîfeya kesên ehlîkar e.”¹⁰³

Herweha Memdûh Selîm Begî di nivîseke xwe ya din de rabirdû û bîngehe afirandina van cûre berheman bi renc û xebatên rêxistinî yên berîya wan ve girê dide û dibêje: “Rêxistinên wekî Cemîyeta Tealîya Kurdistanê, Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanîna û Weşanan, Partîya Milletê Kurd û Cemîyeta Teşkilatê Îçtimaîyye ya Kurd her yek abîdeyek bawerîya Hêvîparêzan e.”¹⁰⁴

Di rojnameya *Serbestîyê* de li ser çapa nû ya *Mem û Zînê* nûçeyek din hatîye belavkirin û mimkun e ku nûçe bi xwe ji alîyê Celadet Bedirxan ve hatibe amadekirin. Lewra Celadet Bedirxan wê demê nivîskar û edîtorê alîkar ê rojnameyê bû û nivîsa ku çapkirina wê tê payîn, nivîsa wî bi xwe ye. Di nûçeyê de dibêje: “*Mem û Zîn* wek şahesereke edebîyata klasîk a kurd

¹⁰² *Kürd eserleri tetkik komisyonu, Serbestî*, no: 479, 28 Nisan 1919

¹⁰³ *Jîn: kovara kurdî-tirkî (1918-1919)*, Cild: IV, Wergêr: M. Emîn Bozarslan, *Weşanxaneyê Deng, Uppsala/Sweden, 1987*, r. 738

¹⁰⁴ *Kurd Wani (Memdûh Selîm Begî)*, *Hedyetu Kurdistan (Diyarîyî Kurdistan)*, 18yê Hezîrana 1925, hejmar: 7, Bexdad

tête qebûlkin. Piştê du rojan li ser vê berhemê, dê lêkolînek hûrbîn ji bo şiroveya xwendevanan bête pêşkêşkin.”¹⁰⁵

Ji belavkirina nûçeyê çend roj şûn ve, nivîsa Celadet Be-dirxan jî tête çapkirin û dibêje:

“Me di hejmara berîya çend rojan de behsa *Zîn û Mem [Mem û Zîn]*a şairê neteweyî Ehmedê Xanî kiribû ku ev şahesera edebî ji aliyê “**Komela Kurd ji bo Belavkirina Weşanan**” ve tête çapkirin. Di wê behsê de, me gotibû em dê ji xwendevanên xwe re yek-du meqeleyên krîtîkê binivîsin.

Bi tevî bidawîhatina çapa vê berhemê, bi vê meqeleya ber destê we, di çarçoveyek giştî de li ser *Mem û Zînê* grîzgaheke krîtîkan hatîye kirin.

Her wekî ku berîya nûha jî min got; heqîqeten *Mem û Zîn* şaheserek bilind û giranbiha yê edebiyata kurdî ye. Kutibxaneyê me ya îrfanê ne pîrr dewlemend e, *Mem û Zîn* di nav vê kutibxaneyê de xwedîyê mahîyet û qîmeteke ansîklopedîk e. *Mem û Zîn*, di eslê xwe de li ser bûyera çîrokek helbestî ya evîndarîyê hatîye honandin. Lêbelê nivîskar berîya ku dest bi bûyera çîrokê bike, bi yek-du muqadîmeyan meseleyên muxtelîf şirove dike. Di vê navberê de jî bi qelesa xwe ya bêeman, bi zimanekî zelal û bilind bextreşîya milletê kurd tîne ziman. Dema em di krîtîka li ser berhemê de, ev alîyê wê wek bingeş qebûl bikin, ev, teşwîqa qîrîn û hawareke rastîn e, ku ji rabirdûyê ve hetanî îro ji bo neslê kurd û ciwanên kurd bûye feryada xîretê û xebatê. Ev şîretên neteweyî, ji alîyê ve bi zimanekî edebî yê bilind bi dawî tîne û hemû qabîliyetên exlaqî û fitrî yên kurdan bi hemû heqîqet û zelalîya xwe ve wek lîlikek diberrîqîne, ji alîyê din ve jî digel van xusûsiyetên fitrî û bi tevî van pêkhatinên mewcud, rewşa kurdan bi zimanekî xemgîn û dilsoj ê wekî pêlên dilêş ên oqyenûseke bêbinî tîne ziman.

¹⁰⁵ *Kürd Eserleri Tetkik Komisyonu, Serbestî, no: 479, 28 Nisan 1919*

Ev beş belkî ji sed beytan zêdetir nîn e, lê wek îksîreka hişyarkirinê, her kurdekî bi lerizandinê dihejîne.

Mele Ehmedê Xanî piştî vê destpêkê, hinek behsa dîroka kurdan dike. Ev beş kurt e, lêbelê li ser mîrnişîniya Azîzan agahdarîyên faydedar hatine dayin; aktorên bûyerê, Mem û xwezûrê wî Mîr Zeynedîn bi xwe jî mensûbên vê mîrnişîniyê bûn.

Ehmedê Xanî jî wekî *Şahnameya* nivîskarê navdar ê Îranî Fîrdewsî, methîyeyên bi mubalexe kirine; di vê beşê de, di derheqê hunera lefzê de ku wê demê pîrr maqûl bû, qudretê mezîna nîşan daye û xusûsen teşbihên edebî yê wekî rumuz, kîneye, îstîfayê yê aîde şexsê xwe bi kar anîne.

Piştî van beşan ku wekî dûrê babetê têne xuyakirin, dest bi çîroka bûyera evîndarîyê dike. Bêguman alîyekê xuyayê vê berhemê jî, zimanê wê, di terzê çîroka dema nûha de hatîye lêkirin.

Em dikarin bibêjin ku terz û zimanê çîroka Ehmedê Xanî, hetanî dereceyekê wekî terz û awayê "*Leyla û Meccun*" a Fuzûlî ye. Nûbûnekî Ehmedê Xanî ji ya Fuzûlî zêdetir e. Ehmedê Xanî, berhema xwe di şiklê pêşnûmek tîyatroyî de tertîb kirîye; carina şexsan li hemberê hev dide peyivandinê. Dema lêgerînek li ser van beşan bête kirin; zimanê dema nûha yê sehneyê, zimanê rojane yê dîalogê û dîalogên manzûm ên hîn kevnare têne bîra me.

Di van dîalogan de; eger carina sikûnetên dirêj û qutbûn çênebûna, çîrokên hevdudanî yê nivîskar nebûna, berhem bi hinek sererastkirinên biçûk karibû derketa meydana sehneyê.

Babet hêsan e feqet metn bi neqşeke zirav hatîye honandin. Wekî me got, piştê wê pêşgotina biçûk, mewzûya esasî yanî çîroka evîndarîyê dest pê dike.

Ji vê nûqteyê şûn ve, em dê berhemê bi nihêrîneke pîrralî krîtîk û parve bikin. Di meqleyên me yê krîtîkê de, dê îzeheta pêdivî ji bo xwendevanan bête pêşkêşkirin."¹⁰⁶

¹⁰⁶ *Celadet Bedirxan, Kürdler ve Kurdistan: Kürd Edebiyatı, Serbestî, no: 491, 10 Mayıs 1919*

2. 11. Gera Major Noel û bûyera Meletîyê

Di nav xebatên CTKê de bûyerek herî girîng jî, rêxistinkirina gera heyeta Major Noel e. Di nav vê heyetê de çar endamên CTKê hebûn: Celadet Bedirxan, Kamiran Bedirxan, Ekrem Cemîl Paşa yê Diyarbekirî û Abdurehîm Rehmî yê Hekarî. Ekrem Cemîl Paşa di destpêkê de ne endamê heyetê bû, paşê li Helebê tevî vê heyetê dibe û Abdurehîm Rehmî yê Hekarî jî wek mamosteyê kurdî yê Major Noel di heyetê de cî digire.

Di hin çavkanîyan de şiroveyên cûr bi cûr û tevîhev li ser vê bûyerê têne kirin ku gelekê wan dûrê rastîyê ne. Hinek bi vê bûyerê ve girêdayî, dixwazin Ali Galip ê walîyê wê demê yê Xarpûtê jî wek kurdperwer yan jî piştgirê kurdperweran nîşan bidin. Alî Galîp ne kurd bû û ne jî têkilîya wî bi kurdîtî re hebû, ew tenê “mixalifekî tirsonek” ê Îttîhad û Terakkî bû. Lêbelê paşê ji alîyê Kemalîstan ve, bi egera damezirandina dewletek kurd, di Dîwanê Herb de hate mehkemekirin. Di rastîyê de bûyera Ali Galip ne pirr girîng e. Vê bûyerê, ji bo tengjandina hikumeta Stenbolê û pêşxistina tevgera Anatolayayê, firsetek ji Mistefa Kemal re peyda kiribû. M. Kemal û hevalên xwe jî, vê bûyerê ji bo propagandayê bi kar tînin. Di vê beşê de, dixwazim bi agadarîyên çavkanîyên dereceya yekem, ronahî bidime ser vê bûyerê.

Ji alîyê polîtîkaya îngilîzan ve sebebê vê gerê, di rojnivîsa Major Noel de weha hatîye lêkirin:

“Piştî hevdîtina min û Albay Wîlsonî ya roja 26ê Hezîrana 1919, biryar ev bû ku ez biçim Stenbolê, li vê derê bi endamên malbata Bedirxanî yan jî bi hin kurdên xwedî bandor re hevdîtinekê çêkim û bi tevî hin kesayetên xwedî bandor, gerînekê ji bo Kurdistanê saz bikim. Taybetîya gera me ya Kurdistanê ev bû: Divîya em polîtîkaya pan-îslamîst a tirkî, propaganda û derewên wan pûç bikin ku digotin; dê bi piştgirîya çekdarîya îngilîzan, kurd bikevin bin desthilatdarîya ermenan. Ez di 3yê Tîrmehê de gihîştim Stenbolê, di serî de bi Seyîd

Abdulqadir, Emîn Alî Bedirxan û hin serkirdeyên sîyasî yê kurd re hevdîtinên me çêbûn. Piştî çend hevdîtinan, heyetek di dereceya diduyan de hate pêkanîn û pêş-nîyarkirin. Di nav vê heyeta nûneran de herdu kurên Emîn Alî Bedirxan, Seyîd Moîn ê zavayê Seyîd Abdulqadir û Îbrahîmê Dêrsimê hebûn.¹⁰⁷

Paşê ji endamên vê heyetê; Îbrahîmê Dêrsimî û Seyîd Moîn ji ber hin sebebên tevî heyetê nabin. Herdu birayên Bedirxanî; Celadet û Kamiran Beg jî dikevîne rê û di 29ê Tebaxa 1919yê de digîjin Helebê. Li Helebê, Ekrem Cemîl Paşa jî li ser daxwaza Major Noel tevî heyetê dibe û heyet di 21ê Tebaxê de berê xwe dide ber bi Meletiyê û di 6ê Îlona 1919yê de digîjin nava bajêr.

Major Noel dibêje: “Dema em nêzîkê Meletiyê bûn, me dît ku muteserrif, serokê şaredarîyê û memûrên payebilind ên din hatine pêşwazîya me. Muteserrif Xelîl Beg ê apê Celadet û Kanuran, endam û damezirênerê Cemîyeta Kurd û rojnameya wê bû, hîsên wî yê neteweyî pirr bi hêz bûn.”¹⁰⁸

Gera Major Noel û heyeta pêkhatî, rastî dema civîna Kongireya Sîwasê tê û ji ber vê yekê dibe babetek gengeşî û nirxandinên Kongireyê jî. Mistefa Kemal di axaftineke xwe ya Kongireyê de dibêje:

“Serbazekî îngiliz ê bi navê Mister Noel bi tevî Celadet û Kamiran Bedirxan, Ekrem Cemîl Paşa û digel panzdeh siwarîyên kurd hatine nik Xelîl Bedirxan ê muteserrifê Meletiyê. Mexseda wan ev e, kurdan bi weadkirina damezirandina Kurdistanê, di aleyhê me de û dijrabere me teşwîq bikin. Em ji destpêka meha Tîrmehê ve ji vê bûyerê agahdar in, di wîlayetê navborî de tedbîrên pêdivî hatine girtin û hûn dibêjin çî? Heyeta Kongireyê bi giştî dibêjin; ji bo îcreatên wisa me bi îtifaqê destûr dabû cenabê te.”¹⁰⁹

¹⁰⁷ Edward Willim Charles Noel, *Kurdistan 1919, Weşanên Avesta, çapa: yekemîn, İstanbul, 1999, r. 7-8*

¹⁰⁸ Edward Willim Charles Noel, *J. b., r. 36*

¹⁰⁹ *Mewlanzâde Rifat, Türkiye İnkılabının İçyüzü, Pınar Yayınları, İkinci baskı, İstanbul, 2000, r. 264*

Mistefa Kemal, biryara destgîrkirina heyeta Noel, bi têlgi-rafekî ji Kazim Karabekir ê qumandarê qolorduya 15. û yên din re rêdike. Kazim Karabekir di têlgirafa xwe ya roja 6ê Îlona 1919 ya bi hejmar 529 de bersiva wî dide û dibêje: “Zabitê ecnebî bi misadeya hikumeta merkezî hatîye vira û ji bo tetkîkkirina li ser nifûsa turk, kurd û ermenan kar dike.”¹¹⁰ Li ser vê bersiva Karabekir, M. Kemal berê xwe dide qumandarên leşkerî yên din. Dawîyê Major Noel dibîne ku problem çêdibin, di 10ê Îlona 1919yê de Meletiyê terk dikin û vedigerin.

M. Rifat di pirtûka xwe ya bi navê “*Türkiye İnkılabının İç-yüzü*” de li ser gera Major û bûyera Meletiyê dibêje:

“Armanca gera Noel ji bo Kurdistanê çi bû? Divê îzeheta vê bûyerê jî li vê derê bête kirin. Komîteyên ermenan û bîlhesa jî Taşnakyutsun li Awrupa û Amerîkayê propagandayek berfireh dabû destpêkirin û kar dikir ku xaka Kurdistanê jî di nav de, Ermenîstaneke mezin bête damezirandin. Di vê çarçoveyê de bi muracatên xwe yên berdewamî, dixwest tesîr û bandorek li ser xebatên Konferansa Sulhê ya Parîsê bikin. Hin merkezên sîyasî û bi taybetî jî Amerîkayê piştgirîya wan dikir.

Meclîsa Bilind a Sulhê ku li saraya Versay a Parîsê kar dikir, li hemberî daxwazên ermenan ku li medyaya dinyayê dihatin belavkirin, ketibûn tengasiyê.

Ji ber ku di heqê nifûs û rûniştvanên wîlayetên Kurdistanê Bakur ku bi navê wîlayetên Şerqîye tete nasîn de îstatîstîkek pêbawer tune bû, qada belavbûn û mîqdarê nifûsa kurd, tirk û ermenên li van bajaran baş nedihate zanîn, pêdivî bi lêkolîna li ser van bajaran hebû. Major Noel ji ber ku bi zimanê kurdî zanibû, ji bo vî karî wek memûr hatibû wezîfedarkirin.

Bêguman encama pêkhatina lêkolînên Major Noel, wê bi kêrê Dewleta Osmanî bihata. Lewra di wîlayetên Şerqê de pirranîya nifûsê kurd bûn, ermen kêm bûn.

¹¹⁰J. b., r. 268

Dema ku Major Noel bi vê wezîfeyê ji Parîsê digîje Stenbolê, ji aliyê rêvebirên Babê Alî ve pêşwazîyek gelek xwes ji bo wî tete kirin.

Major Noel dema ku hate Stenbolê, ji bo pêkanîna têkilî û bingeha lêkolînên xwe, serî li Cemîyeta Tealîya Kurdistanê jî da. Piştî pêkhatina têkilîyan û întibaya pê re çêbûyî, ji me daxwaz kir ku di vê seyhata tetkîkê de, serokê cemîyetê cenabê Seyîd Abdulqadir Efendî û endamê merkeza giştî Mewlanzade Rifat, digel wî tevlî vê seyhata bibin û vê hewldana xwe jî bi wesîteya sefareta îngiliz a Stenbolê dabû bilêvkirin. Ev teklîf, ne ji alî min ve û ne ji aliyê cenabê şehîd Seyîd Abdulqadir Efendî ve hate qebûlkirin. Digel vê, me nedixwest Major Noel jî tenê bi serê xwe vê seyhata bike. Bi biryara civîneke merkezî, me her du lawên Emîn Alî Bedirxan ê serokê duyem ê komeleyê, Celadet û Kamiran Beg ji bo vê seyhata digel Major Noel rêkirin.

Sebebê seyhata Major Noel, ji aliyê Bab-ê Alî ve dihate zanîn. Bab-ê Alî pê bawer bû ku lêkolînên Major Noel, dê bide dîyarkirin ku di wîlayetên Şerqê de îslam-kurd ekseriyet û ermen jî eqalîyat in; ev yek jî dê ronahî bidana karê Meclîsa Bilind a Sulhê û îdeyên xeyalî yên komîtacyên ermenan jî pûç bikira. Lewra Mistefa Kemal jî ji bo vê meseleyê rêkiribûn Anatolyayê. Ji ber vê yekê Bab-ê Alî, ji bo alîkarîya Major Noel, hin pêşniyar kiribûn û bi biryarnamêyek hemû wîlayet jî agahdar kiribûn.”¹¹¹

Xelîl Rehmî ye Bedirxanî ku wê demê miteserrîfê Meletiyê bû, li ser wezîfe û armanca gera Noel weha dibêje: “Mîster Noel destûra gera ji bo hemû wîlayetên Rojhelatê, ji hikumetê wergirtibû, pêre nivîseke fermî ya Wezaretê Daxilîyê hebû ku tede gotibû: Bi her awayî asankarî û alîkarîya pêdivî nîşan bidin, dema bixwaze defterên nifûsê û qeydên fermî yên bi girêdayî wî nîşan bidin, her weha ku bixwaze rê bidin bila bi serok û giragirên eşîretan re hevdiînan pêk bîne.”¹¹²

¹¹¹ Mewlanzade Rifat, *Türkiye İnkılabının İcyüzü*, Pınar Yayınları, İkinci Baskı, İstanbul, 2000, r. 270, 271

¹¹² Osmanlıdan Milli Mücadeleye Seçilmiş Mülakatlar, s.125, 126, 127, Alemdar gazetesi, 1 Kasım 1919

Major Noel bi vî awayê digel Celadet, Kamiran Beg û Abdurehîm Efendî ji Gara Heyderpaşayê bi trêne ketin rê û çûn Helebê. Wê demê Heleb di bin desthilatdarîya îngilîzan de bû.

Çend roj li Helebê man û di vê navberê de Major Noel jî bi balefirekê çû Bexdayê û vegeriya. Heyet dema ku li Helebê diman, bi tesadûfî rastê Ekrem Cemîl Paşa yê Diyarbekirî têne ku ew jî endamekî Cemîyeta Tealîya Kurdistanê bû. Heyet, Ekrem Beg jî bi tevî xwe dibe û bi rêya Arga û Elbîstanê digîjin Meletiyê.

“Mistefa Kemal li ser meseleya Major Noel, di *“Nutuqa”* xwe de dibêje:

“Dê Kurdistanek bihata teşkîlkin.”

Ev ehemîyeta ku M. Kemal wê demê ji bo vê seyhete tîne ziman, qethen nerast bû.

Wê demê nêrîn û armanca esasî ya Cemîyeta Tealîya Kurdistanê ev bû: Milletê kurd ji aliyê neteweyî ve bête hişyarkirin û pêşveçûnek di nav wan de çêbe. Cemîyeta me di vê baweriyê de bû ku pirranîya tewr zêde ya van deveran kurd in, ermen li van deveran eqalîyeteke biçûk e. Bi eger û bûhayê çî dibe bila bibe, em qebûl nakin ku van deveran bikeve bin desthilatdarîya ermenan. Ji xwe di encama xebat û hewldanên Cemîyeta Tealîya Kurdistanê de, Meclîsa Bilind a Sulhê mecbûr mabû ku li ser wîlayetên Şerqê lêkolînê bike. Di vê babetê de, xebata Şerîf Paşayê kurê Seîd Paşa hêjayê teqdîrkinê ye.”¹¹³

“Piştî ku Noel vê tevlihevîya rewşa Anatolyayê dibîne, ji bo ku ew bi xwe nebe sebebê meseleyeke sîyasî, seyhata xwe qut dike û di 10ê Îlona 1919yê de bi serbestî Meletiyê terk dikin û bi tevî hevalên xwe vedigerin Helebê. Rastîya meseleya Major Noel ev e.”¹¹⁴

Ev rastî, di hinek belgeyên veşartî yên Brîtanayê de jî hatîye nîşandan ku di raporta hejmar “FO 371/4193” ya îstixbarata leşkerîya Brîtanayê de hatîye gotin: “Serkirdeyên ne-

¹¹³ *Mewlânzâde Rifat, Türkiye İnkılabının İcyüzü, Pınar Yayınları, İkinci Baskı, İstanbul, 2000, r. 270, 271, 272*

¹¹⁴ *J.b., r. 271, 272*

teweyî yê turk vê bûyerê wek kompoyek Brîtanyayê dibînin û dibêjin armanca wan damezirandina Kurdistanek serbixwe ye.”¹¹⁵ Ji agadarîyên aktorên bûyerê jî diyar dibe ku tesawirên tevgera Kemalîst dûrî rastîyê bû. Lêbelê wan ev bûyer, bi awayekî serkevtî li hemberê hikumeta merkezî û tevgera kurd bi kar anîn.

Ekrem Cemîl Paşa yê ku bi xwe jî di nav vê heyetê de bû, vê bûyerê, di bîranîn xwe de ji serî bigire heta dawîyê bi kurtahî weha tîne ziman:

“Ji bo ku xwendina xwe ya li Belçîkayê tamam bikim, ez di nîvê meha Tebaxê de ji Diyarbekir çûme Helepê û ji wê derê ve jî dê biçûma Stenbolê. Li Helebê rastî lijneyeka ji kurd û îngilizan pêk dihat hatim. Kurd; Bedirxanî Celaded û Kamiran Beg bûn. Serokê lijneya Brîtanyayê jî Major Noel bû. Major Noel bi destûra hikumeta osmaniyan berî du mehan hatibû Diyarbekirê û bûbû mêvanê şaredariyê. Min ev begê Brîtanyayî hindek caran li Diyarbekirê dîtiye û di havîngeheka me de xwarinek dabû Major Noel û yê digel wî. Ji bo gera Major Noel, Celaded û Kamiran Beg ferman ji Sultan Wahdetîn hatibû girtin. Qaşo dê vê lijneyê li Kurdistanê serjimara kurd û ermenan destnîşan bikira. Major Noel pir dixwast ku ez jî beşdarî wan bibim. Min ji wan qasê 24 saetan mohletek xwest. Li Helebê hindek hevalên min hebûn. Ez dê bi wan re bişêwiriyama. Ji bo ku perwerda xwe tamam bikim, min pir dixwest ku biçime Belçîkayê. Piştê ku ligel hevalan axiffim, min xizmeta neteweyî ji berjewendiya kesani guncawtir dît. Piştê du rojan bi lijneya navborî re me terka Helebê kir, ketin ser rê...

Piştê ku me zozanên Sîne, Mîlî û Atmanan terk kirin, roja pêncê meha Rezberî em gehîştin Meletîyê. Demê em gehîştin Meletîyê, me dît Xelîl Begê mamê Celadet û Kamiran Beg, muteserrifê Meletî ye. Ev her du beg bûne

¹¹⁵ Ahmet Mesut, *İngiliz Belgelerinde Kürdistan: 1918-1958, Doz Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul, 1992, r. 106*

mêvanê mamê xwe yê muteserrif. Ez û Major Noel bûn
 mêvanê şaredarê bajêr Arpacî Mihemed Efendî. Şaredar
 kurdperwerekî germ bû, kesekî mêvanperwer û
 kerembexş bû. Xwe şaş kiribû, nizanibû dê çawa îkra-
 ma min û Major Noel bike. Her roj beyanî Major Noel û
 Celadet Beg diçûne avahîya hikumetê. Serjimara kurd û
 ermenan destnîşan dikirin û dinivîsin. Me jî bi rêberiya
 şaredar hevalên xwe yên kurdperwer didîtin, me digo-
 te hev û layangirên xwe zêde dikirin... Civîna me ya ku
 ji muteserrif Xelîl Bedirxan Beg, şaredarê Meletîyê Ar-
 pacî Mihemed Efendî û serokê eşîra Rişwan Hecî Bedir
 Axa û ji me pêk dihat, Meletî kiribû hêlîna kurdînyê.
 Me li Diyarbekirê di dema damezirandina Komeleya
 Kurdistanê de bi rêka hewalgêrîyê li Maden, Elezîz û
 Meletîyê gelek hevalên kurdperwer nas kiribû. Berî sa-
 lekê ew hevalên ku min xiyaben nas dikir, nûke dihêne
 beramberî hevûdu, bi kêfxweşî hevûdu hembêz dikin.
 Civînên şevan çê dikin û bi saetan diaxifin û gengeşîyan
 dikin.

Di encamê de, çaremîn roja me ya Meletîyê bû ku berî
 berbanga sibehê dergehê derve hate lêdan. Jûra min
 ber bi hewşê bû. Bi dengê dergehê ez ji xewê şiyar bûm.
 Min serê xwe ji pencereya vekirî re dirêj kir û pirs kir
 got, tu kî yî? Dengê nermik got, "ka zû were." Bi bê-
 dengî ji pêlikan hatime xwarê. Ber bi dergehî ve çûm.
 Min pirs kir "Tu kî yî, çi dixwazî?" Bi dengê xwe yê ner-
 mik ve got, ez im. Min ev deng nas kir. Ew hevalê me
 ye, yê ku têlgrafan belav dike, eve çar roj e ku her dihê
 serdana me. Min yekser dergeh vekir. Piştê ku dergeh
 daxist, em çûne kenarekî. Hevalê têlgrafafa belav dike
 got: Em ji telgrafeka ku şev ji Elezîzê hatiye hinartin tê-
 gehîştin ku ji bo bi ser me ve bigirin, bi fermana Mistefa
 Kemal ji Elezîzê lîwayek piyade, tabûrek topavêj, bolu-
 kek siwarî, bolukek mîtralyozê hatiye veguhastin. Berî
 zertavê dê li Meletîyê me derdest bikin. Ji ber vê çendê,
 diviya me demûdest bajêr biterikanda. Hevalê li ser têl-
 girafan piştê ku ev zanyarî da me, vegeriya. Ez derketim

serî. Çûme jûra Major Noel. Min Major ji xewê rakir. Em bi pêk ve hatine xwarê. Me hevalên xwe yên li xwarê ji xew şiyar kirin. Ez bi demanca xwe û tifenga xwe ve di tariyê de ber bi jûra Xelîl Begê çûm. Hevalên wê derê jî şiyar kirin. Yekser vegeriyam. Hetanî ez hatim kelûpelên me amade bûn û li hespan siwar kiribûn. Kami-ran û Celadet Beg jî bêyî ku dereng bimînin hatibûn. Hespên wan jî amade bûn. Me xatirê xwe ji Mihemed Efendî xwest û bi rêberîya Remoyê çekdar, çalak ku ji eşîra Rişwan e, ji bajêr derketin.

Em ber bi çiyayên rojavayê başûrê ve diçûn. Hêj roj bilind nebûbû. Ji piştê ve yên bi ajelên bar re dihatin gazî kirin. Gotin siwariyên tirkan nêzîkê me dibin. Em siwarî yekser vegeriyan. Me ajelên xwe yên barkirî ajotin pêş. Bi rastî jî bi qasî 150 siwarîyan, me ji çarsed mêtroyî ve dişopandin.... Em ji heft siwarî û deh piyadeyan pêk dihatin. Hevdeh kes bûn; sisêyê wan îngilîz, çardehê wan jî kurd bûn. Piştî deh saetan em gehiştin zozanên Hecî Bedir Axa.

Demê em gehiştin wê derê, me ev kes li wê derê dîtin: Muteserrif Xelîl Beg, parêzgerê Elezîzê Galîp Beg (mîrovê Sultan Wahdedîn, berhingarê Mistefa Kemal bû, ji Elezîzê reviyabû û xwe gihandibû Meletiyê), Arpacîzade Mihemed Efendî û Hecî Bedir Axa. Van kesan bi rêkeka kurt û ewle hatibûn wê derê. Me li vî zozanê heşt rojên xweş derbaz kirin. Di rêya vegeerê de, em şevêkê li Urfayê man û derbasî Helebê bûn. Çend rojan em li Helebê man, paşê bi rêka şîmendîferê derbasê Mersînê bûn. Ji Mersînê bi vapûrê ve em çûn Stenbolê."¹¹⁶

Dr. Nûrî Dêrsimî jî dibêje: "Konferansa Aşitîyê ya Parîsê ji bo ku çareserîyek ji daxwazên kurd û ermenan re bibîne, Bînbaşî Noel ji bo lêkolîna sicîlên nifûsa sehayê, di Îlona 1919yê de rêkiribûn herêma Meletiyê."¹¹⁷

Wekî ku Noel, M. Rifat, Dr. Nûrî Dêrsimî û Ekrem Cemîlpaşa bi berfirehî gotiye, "Rastîya bûyerê ev e." Lêbelê Mistefa

¹¹⁶ Ekrem Cemîl Paşa, *Kurtejiyana Min, Weşanên Bîr, 2007, Dîyarbekir, r.34-39*

¹¹⁷ Dr. Nûrî Dêrsimî, *Kurdistan Tarihinde Dersim, Doz Yay., 2004, İstanbul, r. 135*

Kemal û çapemenîya Îttîhad û Terakkî, dixwestin bi hinceta vê meseleyê, hikumeta merkezî bixin tengasîyê; wek yekemîn serkevtina Tevgera Anatolîyê û herweha wek sernekevîna hewldana tevgera çekdarî ya kurd bidin nîşandan. Wê demê li ser vê bûyerê rojnameya *Millîyetê* wisa nivisandîye: Alî Galîp û Xelîl Rehmîyê Bedirxanî bi xîreta ceribandinek dawî xebitîn ku eşîrên kurdan serhildaneke bikin, lêbelê tev-dîr û tertîbatên ku hatin girtin û şiddeta ku hate nîşandan, hewldanên wan pûç kirin û eşîret jî belav kirin.”¹¹⁸

Li ser çêbûna vê bûyerê, ji aliyê nêrîna fermî û kemalîstan ve gelek derew û agahdarîyên nedirust hatine belvakirin. Ji vana yek jî xebata bi navê “*Millî Mücadele Dönemi Beyannameleri ve Basını*” [*Beyanname û Çapemenîya Dema Mîcadeleya Millî*] ye ku bûyerê wisa neqil dike:

“Berîya mudetekê xayînekî bi navê Alî Galîp ji aliyê hikûmeta merkezî ve ji bo walîtîya Xarpûtê hatibû tayînkirin. Merkezê ev walîyê xayîn û komek namerd û xwefiroşên wekî miteserrîfê Meletiyê Bedirxanî Xelîl, Bedirxanî Kamiran û Celadet, Ekrem Cemîlpaşazade yê Dîyarbekirî û Mewlanzade Rifat ku di şûna wijdanê de lîreyên îngiliz tercîh kirine, sewqê wê derê kirine. Digel wan jî bi navê Nowel bînbaşîyekî Brîtanayî heye ku dixwaze bi teşkîlîkirina Kurdîstanekê, memleket parçe bike. ...”¹¹⁹

Fatih Mehmed Sancaktar jî di çarçoveya vê nêrîna fermî de ku ji pirtûka Ahmed Suleyman a bi navê “*İngiliz Muhibler Cemiyetinin Esrarı*” [*Esrara Cemîyeta Hezkirîyên Îngiliz*] neqil dike û dibêje:

“Teşebûsa serhildana kurdan bi teşwîqên Saîd Molla çêbûye. Wî, bi teşwîqîkirina serhildana kurdan, dixwest di cebheya rojhelatê de Hereketa Anatolyayê bixe tengasîyê û îrtîbata fîzîkî ya Rûsya û Tirkiyeyê qut bike. Ji

¹¹⁸ *Mewlanzade Rifat, Türkiye İnkılabının İcyüzü, Pınar Yayınları, İkinci baskı, İstanbul, 2000, r. 271, 272*

¹¹⁹ *Zekai Göner & Orhan Kabataş, Millî Mücadele Dönemi Beyannameleri ve Basını, Atatürk Kültür Merkezi Yayını, Ankara, 1990, r. 81*

bo tetbîqkirina vê planê; bînbaşî Nowel, Cemîlpaşazade Ekremê Dîyarbekirî, Celadet û Kamiran Bedirxan digel hinek siwarîyan bi rêya Elbîstan û Argayê re derbasê Meletiyê bûn. Li vê derê ji aliyê muteserrifê bajar Xelîl Bedirxanî ve hatin pêşwazîkirin. Piştî hatina wan, Alî Galîp Beg ê walîyê Xarpûtê jî ji bo beşdarbûna wan hate Meletiyê.”¹²⁰

Di dawîyê de dîyar dibe ku wekî gelek bûyeran, bûyera hanê jî, ji aliyê M. Kemal û terefdarên wî ve hatîye şêlûkirin. Lêbelê wekî ku ji aliyê bapîran ve hatîye gotin; roj bi bêjingê û rastî jî bi derewan nayin veşartin. Kemalîst çî bûhtan û derewan rêz dikin bila bikin, rastîya dîrokî ya vê bûyerê; wekî gotin û agahdarîyên M. Rifat, Noel, Xelîl Rehmî Bedirxan, N. Dêrsimî û Ekrem Cemîl Paşayê Dîyarbekirî ye.

2. 12. Xebatên li ser ziman û berhemên nivîsandî yên kurdî û rabihûrîya bikaranîna alfabeya latînî

Babeteke girîng a weşanên wê demê jî, nivîs û gengeşeyên li ser xebata ziman û eserên kurdî ye. Di vê çarçoveyê de; ji nû ve çapkirina berhemên klasîkên kurdî, nivîs û nûçeyên di derheqê xebatên rêxistinên kulturî û siyasî yên kurdan de, sansora li ser zimanê kurdî, meseleya şêwe û dîyalektan, hewldanên standartkirina zimanê kurdî û çêkirina alfabeyê ke nû, babetên tewr girîng ên nivîs û nivîskarên weşanên wê demê bûn.

Feqet îro dema ku behsa bikaranîna alfabeya latînî ji bo nivîsîna zimanê kurdî bête kirin, pêşîyê Celadet Bedirxan têtê bîra me. Bêguman di pêkanîna şiklê dawî û tetbîqkirina vê alfabeyê de para Celadet Bedirxan û ekola Hawarê gelek zêde ye. Lêbelê di kudandina vê rê de keda gelek mirovên berîya wî jî hene, divê ew jî bêne bi bîrxistin û ev encam, wek pê-

¹²⁰ *Fatih Mehmet Sancaktar, Said Molla ve Türkçe İstanbul Gazetesi, T. C. İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 1996, r. 42*

vajoyeke gehiştî û kolektîf bête dîtin. Lewra li ser vî babetê nêrînên cihê cihê hene.

Qedrî Cemîl Paşa, di bîranînên xwe de li ser rabirdûya xebata bikaranîna alfabeya latînî û gengeşeyên li ser vî babetê dibêje:

“Pêşniyara qebûlkirina tîpên (herfên) latînî, cara yekemîn di sala 1913yê de ji layê memurê posteya Stenbolê Fewzî Beg ve hatîye kirin ku bi xwe jî endamê Komela Hêvî bû. Her weha Dr. Abdullah Cevdet jî di nivîsên xwe yê nav rûpelên kovara *Rojî Kurd* de ji bo nivîsandina zimanê kurdî pêşniyara bikaranîna alfabeya latînî dike û dibêje tîpên erebî nikarin bi temamî zimanê kurdî îfade bikin.”¹²¹

Dr. Abdullah Cevdet di hejmara yekem a *Rojî Kurd* de li ser girîngî û pêdivîya perwerdeyî û guhartina alfabeyê weha dibêje:

“Divê rêjeya xwendin û nivîsandina kurdan bi kêmtirîn bigîje 40%. Ya din, divê zarokek 7-8 salî, tewr zêde di nav mehek de fêrê xwendin û nivîsandinê bibe û karibe rast bixwîne. Ji bo pêkanîna vê jî, divê dev ji herfên kevnare bête berdan û yê nû bêne qebûlkin.”¹²²

Dema em bala xwe bidin nav rûpelên *Rojî Kurd*, dîyar dibe ku li ser alfabeyê gelek gengeşî çêbûne û pêşniyar hatine kirin. Digel pêşniyarên li jorê, nivîskarê *Rojî Kurd* Mesûdê Silêmanîyeyî jî îşaret û herekeyên alfabeya erebî wek bargiranîyeke dijar dibîne û pêdivîya nûkirina alfabeyê tîne ziman û dibêje:

“Ji bo hînkirina 33 herfan, ji dusedî zêdetir şekil ji xwendevanan re tene nîşandan. Ev, xwendevan û mamosteyan gelek diwestîne û pêdivîya performansek gelek zêde ji wê re divê. Bi giştî sebebêkî nezaniyê jî ev e.

¹²¹ Qedrî Cemîl Paşa (*Zinar Silopî*), *Doza Kurdistan, Weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2007, r. 138*

¹²² Abdullah Cevdet, *Bir Hitap [Xîtabetek], Rojî Kurd, h: 1, 30ê Gulana 1913, Weşanên War, Dîyarbekir, 2007, r. 16-17*

Çareserîya vê yekê jî; divê di destpêka perwerdeyîyê de ji bo her herfekê tenê şiklek bête destnîşankirin û dest ji yên din bête berdan.”¹²³

Wê demê komeleyek bi navê Îlîmlerîn Genelleştirilmesi ve Harflerîn Düzenlenmesi Cemiyeti [Cemiyeta Belavkirina Îlim û Serrastkirina Tîpan] hebû û ew jî tevî van gengeşeyan dibe û ji bo rêvebirên kovara *Rojî Kurd* pêşniyarek wisa dikin:

“Sebebê tewr girîng ê paşvemayina me, kêmasîya herfên (tîpên) me ye. Heta roja îro li ser vê babetê gelek dîtin hatine pêşkêşkirin; beşekî gotine bila herfên latîni, ermenî bêne qebûlkin û beşekî din jî vê pêşniyarê wek xeterîyek dîtine û gotine bila herfên erebî yê ku ji alîyê alema îslamî ve têne bikaranîn bêne sererastkirin û qebûlkin...”

Bi dîtina me, zimanê kurdî, bi herfên dervayê alfabeya erebî bête nivîsandin, dê ziman bête xerakirin. Ji ber vê yekê, ji bo zimanê milletên misilman qebûlkirina alfabe-yên bîyanî, ne munasib e; xeternak e. Em nabêjin ne mimkun e, em dibêjin ne munasib e. Ger ji vê xeternakîyê nebe, dikare mimkun be. Ji ber vê yekê, divê herfên erebî li gorî zimanê hemû milletên misilman ji nû ve bêne sererastkirin.”¹²⁴

Li ser meseleya alfabe-yê, M. S. Azîzî jî di hejmara duyemîn a *Rojî Kurd* de, pêşniyarên Cemiyeta Belavkirina Îlim û Sererastkirina Tîpan erênî dibîne û dibêje:

“Meseleya lêkolandin û amadekirina alfabe-yeke hêsan û nû ya ji bo kurdî, berdewamî serê min meşxul kirîye; ez wisa bawer dikim ku pêşniyara Cemiyeta Belavkirina Îlim û Sererastkirina Tîpan a li ser alfabe-yê, ji her kesî bêtir bi kêrî me kurdan tê.”¹²⁵

¹²³ Suleymaniyeli Mesûd, *Harflerimiz ve okuma kolaylığı, Rojî Kurd, no: 1, 6 Haziran 1329 (1913), Weşanên War, İstanbul, 2002, r. 29*

¹²⁴ *İlimlerin Genelleştirilmesi ve Harflerin Düzenlenmesi Cemiyeti, Rojî Kurd mecmuası yüce müdürlüğüne, Rojî Kurd, no: 2, Weşanên War, İstanbul, 2002, r. 56-57*

¹²⁵ M. S. Azîzî, *Harflerimiz ve okuma kolaylığı, Rojî Kurd, no: 2, 6ê Temûza 1329 (1913), Weşanên War, İstanbul, 2002, r. 55*

Di heman hejmara *Rojî Kurd* de Modanî Xelîl ku bi kurteya "M. X." nivisindîye dibêje: "Elifbayek li ser tarzekî nû lazim e."¹²⁶

Ji *Rojî Kurd* şûn ve di nav kovar û rojnameyên wekî *Jîn, Kurdistan* û *Serbestîyê* de jî li ser alfabe, zimanê kurdî, sansura li ser nivîsandina kurdî, perwerdeyî û çapkirina berhemên klasîk ên kurdî nirxandin û pêşniyarên ciyawaz hatine kirin.

Sansur, wê demê jî babeteke girîng a çapemenîyê bû û bi taybetî nivîsên kurdî jî hatine sansurkirin. Dema em bala xwe bidin hin hejmar û rûpelên weşanên wê demê, dîyar dibe ku valayî di nav de heye û ew valayî ji ber sansur û qedexeya li ser zimanê kurdî bû. Li ser meseleya sansurê, di hejmara 29ê Nîsan 1919 ya *Serbestîyê* de weha hatîye gotin: "Ji ber ku di nava îdareya matbûatê de mutercîmekî şarezayê zimanê milletê kurd nîne, gelek astengî li pêşîya neşriyata kurdî çê dibe. Ji ber vê yekê, roja bihûrî, helbesteke kurdî ji nav rûpelên rojnameya me hatîye sansurkirin."¹²⁷

Ji ber vê sansurê, di nav rûpelên *Serbestî* de bi navê "*Neşriyata Kurd*" daxuyanîyek hatîye belavkirin û dibêje:

"Ji alîyê îdareya sansurê ve helbesteke kurdî ji nav rojnameya me hatîye derxistin. Helbest bi tevî tercumeya xwe hatibû nivîsandin û rakirina wê ne li gorî teamulên heyî bû. Gelek rojname 20-30 rêzik û qitayên bi zimanê fransîzî û farisî çap dikin û rastî tu astengîyekî nayin, em hêvî dikin ev qaîde ji bo neşriyata me jî bêne tetbîqkirin."¹²⁸

Digel van rexne û balkêşîyan, di nav rûpelên weşanên kurdan de gengeşe û nivîsên li ser vê babetê têne domandin. Naveroka paneleke CTKê bi sernivîsa "*Di heqê zimanê kurdan de*" weha hatîye ragehandin:

"Ji alîyê xortê çeleng ê kurd Abdurehman Rehmî yê Hekarî ve, do li navenda Cemîyeta Tealîya Kurdistanê li ser

¹²⁶ M. X., *Ziman, Rojî Kurd*, no: 3, 6ê Temûza 1329 (1913), *weşanên War, İstanbul, 2002, r. 88*

¹²⁷ *Serbestî, Kürd sansürü [Sansora kurdî]*, no: 480, 29 Nisan 1919

¹²⁸ *Serbestî, Kürdçe yazılar [Nivîsên kurdî]*, no: 480, 29 Nisan 1919

giringîya ziman û pêşxistina qabîlîyeta kurdî panelek muhîm hate sazkin.

Axaftvanî hinek berhemên şairên kurd bi dûr û dirêjî tetkîk kirin û li ser kultura neteweyî ya kurd, hin esasên balkêş dane dîyarkirin.”¹²⁹

Du roj piştî belavkirina vê nûçeyê, li Stenbolê di navenda CTKê de, komîsyonek taybet ji bo lêkolîn û çapkirina eserên alim û şairên kurd tête damezirandin. Di nûçeyê de hatîye gotin ku “Hin zatên îlmîye û mûlkiyeyê hatine wezîfedarkirin ku di heqê eserên îlmî yê kurdî de xwedî malumat in. Vê komîsyonê, lêkolînên xwe yên li ser *Mem û Zîna* Mele Ehmedê Xanî tamam kirine. Heşt formayên vê eserê hatine çapkirin û yên mayî jî di demeke kurt de têne çapkirin. *Mem û Zîn*, şaheserekî edebîyata klasîk a kurd tête qebûlkin.”¹³⁰ *Mem û Zîn*, bi vê çapê, cara yekemîn dikeve nav lewheyên matbeayê.

Li ser xebatên standartkirina zimanê kurdî û hewldanên Cemîyeta Neşrê Mearîf ê Kurd [Komela Kurd a Belavkirina Zanîne], di hejmara 480ê ya *Serbestîyê* de, bi sernivîsa “*Tedvîna lîsanê kurdî*” [*Standartkirina zimanê kurdî*] nivîseke wisa hatîye belavkin:

“Piştî îlankirina Meşrûtiyetê, ji bo îsleh û standartkirina kurdî, Komela Kurd a Belavkirina Zanîne û hin rêxistinên din hatibûn damezirandin. Van rêxistinan di dema destpêkirina Şerê Giştî de xebat û weşana xwe dabûn rawestandin. Ji dawîhatina Şerê Giştî şûn ve, van rêxistinan bi belavkirina kovara *Jînê*, dest bi berdewamkirina xebata berê kirine.

Komela navborî ji berê ve dixebite ku li ser esasê cihê nivîsandina herfan, gramereke zimanê kurdî binivîsîne û bide çapkirin. Alfabe hatîye amadekirin û hetanî çend rojên din dê bête çapkirin. Alfabeya ku nûha tê çapki-

¹²⁹ *Serbestî, Kürd lîsanî hakkında [Li ser zimanê kurdî]*, no: 477, 26ê Nîsana 1919

¹³⁰ *Serbestî, Kürd eserleri tetkik komisyonu [Lijneya lêkolîna eserên kurdî]*, no: 479, 28 Nîsan 1919

rin, ji alfabeya berê bêtir mifedar û mukemeltir e. Em mûteşebbîs û nivîskarên wê pîroz dikin.”¹³¹

Kamiran Bedirxan jî di nivîsa xwe de behsa girîngîya xebata vê komelê û karê standartkirina zimanê kurdî dike û dibêje: “Ew milletên ku zimanê xwe reforme bikin, qaîdeyên gramera xwe sererast bikin, herfên sade û sivik çêbikin û pê binivîsîn, asteng li ber îstiqbal û pêkhatina hêvîyên wan namînin.”¹³² Nivîskar di çarçoveya vê dîtinê de, bala komîsyona navborî dikişîne li ser van xûsuyetên û dibêje:

“Xusûsiyetên tewr girîng ên ku komîsyon dîqet bike ev in: 1- Alfabeya ku ji bo xwendin û nivîsandina kurdî bête duristkirin, divê gundî jî karibin di demeke kurt de bi wê alfabeyê hînê xwendin û nivîsandinê bibin. 2- Meseleyek tewr dijwar jî, şikil û rêbaza alfabeyê ye; gelo ev alfabe dê ji milê çep ber bi milê rast ve yan ji milê rast ber bi milê çep ve bête nivîsandin. Dema em bala xwe bidin girîngîya vê babetê, divê em bi hîssa fa-alîyetek azamî û têgehîştinek nûjenîyê tevbigerin.”¹³³

Li ser vê babetê gengeşeyek balkêş jî, meha Tebaxa sala 1919yê di navbera Noel û şanda wî ya kurd de çêdibe. Di rêwîtiya Meletiyê de, li ser zimanê kurdî du xusûsiyetên balkêş dibin meseleya rojeva gengeşîya Noel û endamên heyeta wî ya kurd; cûdatîya şêwe-dîyalektên kurdî û alfabeya nivîsandina kurdî. Ji ber ku bi rêya Entab û Meraşê re diçûn, dema heyet digîje qeza Pazarciq a Meraşê, tiştêkî girîng bala Noel dikişîne, dibîne ku axaftvanên şêwe û dîyalektên van herêman û yên herêmên din ên Kurdistanê bi hêsanî hev têdigîjin. Lewra endamên heyeta wî yek ji Botan, yek ji Hekarî û yê din jî kurdê Diyarbekirê bû, di têkilî û hev têgihîştina wan û yê van herêman de tu problemk tune bû. Li ser vê yekê Noel dibêje:

¹³¹ *Serbestî, Kürd lisanının tedvini [Standartkirina zimanê kurdî], no: 480, 4 Mayıs 1919*

¹³² *Kamiran Bedirhan, Kürdler ve Kurdistan: Kürd lisanı [Kurd û Kurdistan: Zimanê Kurdî], Serbestî, no: 486, 5ê Gulana 1919*

¹³³ *J. b.. 5ê Gulana 1919*

“Bi pirranî dihat gotin ku zimanê kurdî zimanek têkel e, li gorî herêman diguhere û hev tînağîjin. Rast e, baba kurdî ya ku li başûrê rojavayê Kurdistanê tete axaftin, di navbera wê û kurmançî de ferq heye, lê ku em bêjin şeweyên cûda yên kurmançî di esasê de ji hev cûda ne, ev nerast e. Li nik min kurdên Botanî, Hekarîyî û Dîyarbekirî hene, ew di navbera xwe de û bi kurdên tewr bakurê Kurdistanê re bi rehetî hev tîdigîjin. Di nav çend hefteyan de dikarin bi temamî wekî kurdên binekî yên li vê deverê biaxivin. Ferqa bingehîn a di navbera axaftina wan de, bikaranîna tîpên dengdêr in.”¹³⁴

Xûsusiyetek din jî bikaranîna alfabê ye;
“Noel dibêje, min notên xwe yên li ser zargotinên herêmî yên kurdî bi alfabeya latînî dinivîsand û hevalên min ên kurd jî bi alfabeya erebî dinivîsandin. Bi tevî ku ez hîn baş bi kurdî hîn nebûbûm jî, di dema xwendinê de, min ji wan baştir dengên kurdî derdixist û xwendina min jî ji ya wan bêqisurtir bû. Wê demê min têgehîşt ku herfên erebî ji bo tîpên dengdêr ên kurdî têr nakin û ne bes in. Piranîya wan ciwanan bawer dikir ku tîpên latînî bêtir dikarin dengên kurdî derbixin û dixebitîn ev dîtinên hanê li Kurdistanê jî bêne qebûlkin. Lêbelê neslên berîya wan û ulema, ji ber sebebên dînî, li hemberê gorandinek weha ne.”¹³⁵

Encam û gengeşeyên rêwîtiya serdana Meletiyê, di serê Celadet Bedirxan de fikra bikaranîna alfabeya latînî ya kurdî peyda dike. Celadet Bedirxan bi xwe jî li ser bihûriya peyda-bûna fikra alfabeya latînî ya kurdî dibêje:

“Ev elfabeya hanê ku îro em zimanê xwe pê dinivîsînin paşîya xebateke salinên dirêj e.

Di sala 1919an de me da bû çiyayên Meletiyê. Em ketibûn nav eşîra Reşîwan. Mêcer Noel jî digel me bû. Mêcer zarê

¹³⁴ Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919, Weşanên Avesta, İstanbul, 1999, r. 22-23*

¹³⁵ J. b., r. 23

nîvro dizanî bû, dixebitî ko hîne zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin.

Carinan me çav li nivîsarên xwe digerlandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilêvkirineke biyanî, lê bi dişwarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (û, ۆ) ji (o, ۆ) û (î, ى) ji (ê, ە) h. p. derdixistin dikedim ber hezar dişwarî. Ma çima?.. Ji ber ko Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabeyek lêkanî. Êdin min bikarîya destnivîsa xwe paş hezar salî jî bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê dihat sekinandin.”¹³⁶

Piştî van nirixandin û gengeşeyên dûr û dirêj, cara pêşîn di sala 1928an de li Erîvanê yekemîn pirtûka kurdî ya bi alfabe ya latînî hatiye çapkirin. “Elfabe ya Kurdî ya bi tîpên latînî cara ewilî di sala 1928an de li Ermenîstanê ji teref nivîskarên kurd Erebe Şemo û Îsahak Maragulovê Asûrî ve hatiye çêkirin. Ji aliyê hikumeta Ermenîstanê û herweha hikumeta yekîtîya Sovyetê ve jî hatiye pejirandin.

Di sala 1929an de bi vê elfabeyê pirtûka perwerdekirina zimanê kurdî hat weşandin. Navê vê pirtûkê “*Xo xo hînbûna xwendina nivîsara kurmançî*” bû. Ev pirtûka hînkê li Erîvanê hat weşandin. Divê bê zanîn ku ev pirtûka kurdî, pirtûka bi tîpên latînî ya pêşîn e li cîhanê. Ev pirtûk, niha di pirtûkxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de ye.”¹³⁷

Ev pêvajoyê bi van gengeşî û pêşniyaran digîje hetanî destpêka salên 1930an. “Di sala 1931ê de li Şamê di mala Elî Axayê Zilfo de civînek tête darxistin û Celadet Bedirxan, Hemzeyê Miksî, ji kurdên Şamê Musa Beg û Ekrem Cemîlpaşa wek lijneya amadekirina elîfbaya kurdî/latînî dihêne hilbijartin. Ligel vê yekê, ji layê hevalan de çend elîfbaya hatine derxistin.”¹³⁸

¹³⁶ Celadet Bedirxan, *Pêşgotinek, Hawar, hejmar: 13, 14yê Çileyê-Berê 1932, Weşanên Nûdem, cild: 1, Stockholm, 1998, r. 263*

¹³⁷ <http://www.kovarabir.com/2015/07/mir-osmane-deriki-mir-celadet-ali-bedirxan-1893-1951/>, 21 Temmuz 2015

¹³⁸ Qedîrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan, Weşanên Bîr, Dîyarbakir, 2007, r. 138*

Nûredîn Zaza sala 1931ê digel kekê xwe Dr. Nafiz ji Helebê diçin Şamê û li wê derê dibe temaşevan û guhdarvanê gengeşeyên li ser alfabeya latînî/kurd. Dibêje: “Celadet Bedirxan, elfabeya kurdî, bi tîpên latînî, pêk tanî û dil dikir ko bi van kovarekê derêxe. Ekrem Cemîl Paşa, hemzeyê Miksî û hinekên din tê de pir kêmanî didîtin û bi hişkî lê radibûn. Lê, rehetî Celadet bi gelek zimanan dizanî, pir li Ewropa mabû, bi ser de jî zor zîrek, bi hiş û hûner bû, bala xwe dida rexne û gotinên xelkê û dixebitî ko şaşiyên xwe binase, elfabeya xwe li gora dengên zimên û ji şîwe û zaravayên têvel rêz û dûzanên bingehîn derêxe. Ew ji zû da li vî tiştî hûr dibû, lê li Şamê ev karê ha bûbû mijûlayîya wî ya hergavî. Di sala 1932an de, piştî ko elfabeya xwe danî û rêzimanek jî dirust kir”¹³⁹, dest bi derêxistina kovara *Hawarê* kir.

Ev gengeşiyên ku berîya bîst salan dest pê kiribû, di sala 1932yan de digîje radeyek bilind û dibe pêngavek nû. Bêguman ev radeya nû jî, encam û berhemê ew gotar û gengeşeyên berîya bîst salan bû.

Piştê ku alfabeya latînî di kovara *Hawarê* (1932-1943/ 57 hej.) de hate ceribandin û qebûlkirin, paşê kovarên wekî *Ronahî* (1942-1945), *Roja Nû* (1943-1946/ 73 hej.) û *Stêr* (1943-1945/ 3 hej.) jî bi vê alfabeyê hatin weşandin. Îro, ziman û diyalektên kurdî, pirranî bi vî alfabeyê têne nivîsandin, bi taybetî jî di nav kurdên bakur û rojavayê Kurdistanê û dîasporayê de tête bikaranîn.

2. 13. Dawîya dewrek

Eger em deh salên (1913-1923) destpêka xebata nivîskarî û sîyasî ya her du birayên Bedirxanî bikolin, divê em van deh salan bi ser du dewreyan ve dabeş bikin. Dewreya yekemîn, ji salên 1912-13yan bigre hetanî dawîya Şerê Yekemîn ê Cîhanê dom dike; pirranî û giraniya xebatên wan ên vî demê, di çarçoveya fehma “yekgirtina osmanî” û “umetparêzî” de li ser kultur û edebîyatê ye. Dewreya duyemîn, ji rawestandî-

¹³⁹ Dr. Nûredîn Zaza, *Pêşgotin, Hawar (1934-1943)*, h.: 24-57, çapxanên: Mindik el-Mibkî, Teraqî, Şam

na Şerê Yekem ê Cîhanê şûn ve bi damezirandina Cemîyeta Tealîya Kurdistanê dest pê dike û hetanî derçûna ji Stenbolê dom dike; giranîya nivîsandin xebata vê demê jî li ser karê rêxistinî û sîyasî ye. Hemû berhem û nivîsên wan ên vê demê, bi zimanê osmanî hatine nivîsandin.

Wekî ku di destpêka vê beşê de hate gotin, piştî parçebûna rêxistina CTKê, bi navê Cemîyeta Teşkilatê Îçtîmaîyye ya Kurd (CTÎK) û Partîya Millet a Kurd (PMK) du rêxistinên nû hatibûn damezirandin. Emîn Alî Bedirxan, nûner û serkêşê vê gruba nû bû. Herdu zarokên wî; Celadet û Kamiran Bedirxan jî endamên çalak ên rêxistinê bûn û herweha di weşanên rêxistinê de kar û barê rojnamevanîyê dikirin. Digel vê, di rojnameyên muxalif ên wê demê de, bi nivîs û meqeleyên xwe, dîtîn û sîyaseta rêxistinê û tecrûbeyên xwe yê şexsî parve dikirin. Wê demê Sureyya Bedirxan jî li Qehîreya Paytexta Misrê, rêxistinek bi navê Komîteya Îstiqlala Kurdistanê damezirandibû, bi kar û barê wê rêxistinê re mijûl bû.

Li gor agahdarîya Qedrî Cemîl Paşa, piştî parçebûna CTKê, weşandina kovara *Jînê* dikeve bin rêvebirîya CTÎKê û di formata rojnameyê de ji nû ve tête weşandin. Herweha beşeke endamên vê grubê; kesayetîyên wekî Ekrem Cemîl Paşa û Hemzeyê Mûksî ji bo pêkanîna çalakîyan, belavkirina armanc û fikra rêxistinê, di sala 1921an de berê xwe didine Kurdistanê. Beşeke din jî, ji bo pêşxistina peywendîyên bi hikûmeta Şêx Mehmûdê Berzencî re, berê xwe didine başûrê Kurdistanê. Di nav vê komê de kesayetîyên wekî Xelîl Rehmîyê Bedirxanî, Mistefa Paşayê Yamûlkî, Kemal Fewzî û Mewlanzade Rifat hebûn.¹⁴⁰ Mixabin Ekrem Cemîl Paşa û Hemzeyê Mûksî, di dawîya sala 1921an de bi destê Ebdilkerîmê axayê eşîra Hevêrkan ve li herêma Mêrdînê têne destgîrîkirin û wan radestê hikûmeta Anqerê dikin. Gruba din jî, çûyina wan a ji bo başûrê Kurdistanê, ji alîyê Brîtanyayê ve tête astengîkirin. Bi vî awayî hewldana derbasbûna Kurdistanê û geşkirina xebata rêxistinî ya li ser erdê Kurdistanê bi ser nakeve.

¹⁴⁰ Qedrî Cemîl Paşa (*Zinar Silopî*), *J.b.*, r. 55

Bi tevî hemû hewldana CTÎKÊ, ew jî wekî CTKê nikare li ser erdê Kurdistanê bi cî bibe û rêxistina xwe pêş bixe. Her çiqas bandora tevgera Kemalîst li ser axa Kurdistanê xurt dibe, ewqas jî xebata rêxistinî, sîyasî û çapemenîya kurd lawaz dibe. Peryoda derçûna kovar û rojnameyên kurd têk diçe û peyderpey digihîje qonaxa betalbûnê. Hejmarên çapbûyî, bi rastî nayin zanîn. Mîsal; ji aliyê hinek lêkolîneran ve behsa 700 kusûr hejmarên *Serbestî* têne kirin, lêbelê hejmara dawîn a ber destê me ya 601an e û di 25ê Nîsana 1920an de hatîye weşandin. Em nizanin hejmara dawî çî wext hatîye çapkirin û her du birayên Bedirxanî hetanî kengî di rojnameyê de nivîsandine.

Piştî ku di navbera dewletên emperyal ên wekî Brîtanya, Fransa, Rusyaya Bolşewîk û Tevgera Kemalîst/Meclîsa Anqerê de hinek peymanên veşartî û aşkere pêk hatin, Meclîsa nû ya Anqerê hate naskirin. Di 1ê Çirîya Paşîn a sala 1922yan de, ji aliyê Meclîsa Millî ya Anqerê ve betalkirina sîstema Seltenatê hate ragehandin. Di 4ê Çirîya Paşînê de jî Stenbola paytexta Osmanî bi Meclîsa Anqerê ve hate girêdan. Ji vê demê şûn ve, êdî cî ji tevger û şexsiyetên muhalîf re teng bû. Ji bêgavîyê her yekî bi awayekî terka Stenbolê kirin, ji bo ku nekevin li ber pêlên xezeb û zordariya desthilatdarî û rêxistina nû ya îtiha-parêzên Kemalîst.

Celadet Bedirxan di 58 salên jîyana xwe de û bi taybetî jî di salên dawî yê Împeraetoriya Osmanî de govanîya (şahidîya) gelek bûyerên girîng û balkêş kirîye. Li ser vê demê, tiştên ku ji pozê qelema wî hatine darijtin pir kêm in, yaxud hinekê wan hîn derneketine ronahîyê. Ji hin nivîs û rêzeyên wî dîyar dibe ku ceribandin û hewldanên ji bo nivîsînê çêbûne. Wekî ku ji aliyê lêkolîner Dilawerê Zengî ve hatîye neqilkirin, di nivîseke wî ya sala 1929an de dibêje: “Ji mêj de, min dil hebû ko bîranên xwe di pirtûkekê de bicivînim. Berî niha bi demekê, min hin jê civandin. Lê mixabin li bajarê Xarpûtê, ji hêla Dadgeha Îstiqlalê ve bi kaxizên min re hatin girtin.”¹⁴¹

¹⁴¹ *Komkirin û werger: Dilawerê Zengî, Bîraninên Celadet Bedir-Xan (1893-1951), Çapa Didiwan, Beyrût-Libnan, 2010, r. 11*

Wekî gelek pêşeng û endamên tevgera neteweyî û sîyasî ya kurd, kesayetîyên wekî Emîn Alî Bedirxan, Mewlanza-de Rifat, Memduh Selîm Begî, Xelîl Rehmî Bedirxan, Celadet Bedirxan, Kamiran Bedeirxan û wd. mecbur man ku terka Stenbolê bikin û biçin derveyê welat. C. Bedirxan di nameya xwe ya ji bo M. Kemal de dibêje: “We hinek mixalifên xwe bi peymaneke navdewletî ji welat dûr xistin, qismekî din jî, ji xweber ve terkî welat bûn. Derçûna wan a ji welat, hetanî vê gavê jî berdewam e.”¹⁴²

¹⁴² *Emir Celadet Alî Bedirxan, Bir Kürt Aydınından Mustafa Kemal'e Mektûb, Doz Yayınları, Stenbol, 2010, r. 32*

3. Kamiran Bedirxan (1895-1978)



Kamiran Bedirxan

Kamiran Bedirxan, lawê Emîn Alî û nevîyê Mîr Bedirxan e. Li ser cî û sala ji dayikbûna Kamiran Bedirxan nêrînên cûda hene. Li gor Aharon Cohen ew, "Sala 1894ê li bakûra Suriyê û 100 km dûrî Helebê li bajarê Jerablosê hatîye dinyayê."¹⁴³ Joyce Blau jî dibêje: "Emîr Kamiran di 21ê Tebaxa 1895ê li Şamê ji dayik bûye"¹⁴⁴ Di sernivîsa çapa nû ya rojnameya *Roja Nû* de hatîye nivîsandin ku "Kamûran Alî Bedirxan, di 21ê Tebaxa

¹⁴³ Aharon Cohen, *Entellektuelekî herî girîng ê Kurd: Mîr Dr. Kamiran A. Bedir-Xan (Gulan/Hezîrana sala 1979ê), Wergêrîya meqalê: Yıldız Samer û Hazım Kılıç, Stêr, Weşanxan Xani & Bateyî, Danmark, 1992*

¹⁴⁴ Bn. "Pêşgotin" a pirtûka Malmîsanij a bi navê "Cizre Botanlı Bedirhaniler", Weşanên Avesta, çapa duyem, İstanbul, r. 9

1895an de li Stenbol ji dayik bûye û xwendina xwe ya ewil jî li Stenbolê xelas kirîye.”¹⁴⁵

Dema ku Bedirxanî ji ber bûyera kuştina Şehremînî Ridvan Paşa (24ê Adara 1906) carekî din bi tevî malbatên xwe ve têne nefîkirin, wê demê Kamiran Bedirxan, zarokek yanzdeh salî bû û di Dibistana Sultanî de xwendevanê pola seretayî bû. Kamiran Bedirxan, ji ber vê bûyerê, ji alîyê polîsan ve destgîr kirin û birina zarokên Bedirxanîyan ji dibistanê weha tîne ziman:

“Piştê xwarina firavînê min li bexçeya dibistanê dileyîzt, ez gelek tî bûbûm û ji bo vexwarina avê ber bi kanîyê ve dibezîyam. Kekê min ê Celadet ku du sal ji min mezintir bû, ji hewşa din a dibistanê hate nik me û deng li min kir. Hatina wî ya vê derê, ji bo min ne tiştêkî adetî bû, lewra ew du sal li pêşîya min bû. Min û wî tenê êvaran li yataqxaneyê hevûdu didît. Bi dîtina wî matmayî bûm. Ji min re got, ‘were em dê biçine yataqxaneyê’. Min wisa fikir dikir ku kekê min tiştêkî ji min vedişêre. Wê gavê çavdêrê me yê dibistanê Cemal Beg hate nik me. Bi ken ji min re got, tu dê bi çûyina malê memnûn bibî yan na. Bi rastî jî ez, yek ji zarokên nerehet ê dibistanê bûm. Ev halê hanê, kekê min xemgîn dikir û bala neh pismam û dotmamên min ên li vê dibistanê jî dikşand. Me berê xwe da jûra mudir Abdurehman Beg û min dît ku hemû pismam û dotmam li ber derî berhev bûne û paşê em bi hev re çûn jûra wî. Li min nihêrt û gepa min mis da. Ji wezîfedarê li wê derê re got, hemû tamam in, yanzdeh kes in. Em digel kesên redîngotî, ji derîyê giştî derketin, bi tevî polîsan hinek yek bi yek û hinek jî dido bi dido siwarê faytonên sergirtî bûn û ketin rê.

Di rê de polîsan hinek pirs ji me dipirsîn û bi taybetî jî digotin li mala we çend mêr hene. Di rê de dîyar bû ku me nabin malê. Faytonan berê xwe dabû Bab-î Zabtîyee

¹⁴⁵ *Roja Nû, Jîyana Kamûran Alî Bedirxan, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, Sibata 1986, r. 6*

û me birin asayişa giştî û xistin eywanek mezin. Wezî-
 fedarek hat navê me pirsî û ji ber ku biçûkê hemûyan
 bûm, navê min jî di listeyê de li dawîyê hatibû lêkirin.
 Cara yekemîn bi destpêka vê bûyera tuhaf, em yanzdeh
 kurdên biçûk û yanzdeh Bedirxanî hatibûn ber hev.
 Tewr mezinê me Silêmanê kurê apê min ê Xalid bû û
 panzdeh salî bû û ew ji bûyerê agahdar bû. Li wê derê ji
 me re gotin, serokê Şaredarîya Uskudarê Ridvan Paşa, ji
 alîyê kurdan ve hatîye kûştin; ji ber vê yekê apên min û
 kekê min ê Sureyya ji alîyê hikumetê ve hatine destgîr-
 kirin. Piştî nîv saetê, ji bo îfadegirtinê em yek bi yek ji
 eywanê derxistin, lê yê ku diçû nevedigerîya. Şev bi ser
 me da hatibû, dema bangê kekê min ê Celadet kirin û ew
 çû, ez tenê li odê mabûm. Wê gavê ne ku ez ditirsîyam,
 qasê tê bîra min ez gelek bi hêrs û kîn bûm, lê niza-
 nim li hemberê kê bû. Dema derî vekirin û gotin “Ka-
 miranê kurê Emîn!”, min xwe wenda kir, lewra ez hînê
 xîtabeteke wisa nebûbûm. Min vê yekê wek neheqî dît
 û li nik xwe sonda tolhildanê xwar... Polîsê ku ez birim
 ji min nav, sal, îkametgah, navê kesên li malê dimînin
 pirsîn, bi taybetî jî gotin dema bavê te ne li malê be - li
 Anqera û Konyayê wezîfeya mifetişîya Edliyeyê dikir-
 kî malê îdare dike? Min got: dayika min. Gotin: Çawa
 jinekê kare malek wisa îdare bike, divê mêrek li wê
 malê hebe. Polîsê din jî di dema lêpirsînê de, ji paş ve
 milê min digûvaşt. Min ji wî re got; ‘destê min berde, tu
 min diêşînî.’ Wan guh neda min, gelek aciz bûm û min
 bi kurdî û dengêkî bilind got ‘Beraz!’...

Piştê lêpirsînê, dawîyê ber bi nîvê şevê ve me birin
 malê. Cara pêşî min rondikên çavan û hûzin li wê derê
 dît. Polîsê ku digel me hatibû, ji dayika min re got ‘ji
 bo teslîmgirtina zarokan, divê hûn kefflekî nîşan bidin.’
 Dayika min got: ‘Berîya nûha we bav û apê wan destgîr
 kirin, hûn dixwazin kî bibe keffil? Ger hûn pê bawer na-

bin, ya baştir ew e ku hûn wan jî bibin nik merivên wan ên destgîrkirî'...

Di vê navberê de, dûr-nêzîk bi sedan kesên ku têkilîya wan bi me re hebûn hatibûn destgîrkin.... Dawîyê, me rêkirin li nik bavê min ku wê demê li Konyayê wezîfedar bû. Di sibeya meha Çirîya Pêşîn a 1906ê de, derûdora mala me ji alîyê leşkeran ve hate dorpêçkirin, em siwarê seyareyeke kirin û berê me dan otogarê. Dema em gehîştin otogarê, birayên min Hîkmet, Sureyya û pis-mamê min Şerîf Beg jî li wê derê bûn. Berê me hemûyan bi hev re dan ber bi Konyayê. Em hemû malbat hatibûn nik hev; dayika min, sê kekê min, birayekî min ê biçûk û xuşka min Mezîyet.

Bavê min li Konyayê, di daîreyeke şaredarîyê de hatibû binçavkirin... Piştî çûyina me, walî hat nik bavê min û got, hûn hemû bi fermana Sultan hatine nefîkirin ji bo bajarê Îspartayê."¹⁴⁶

Nefîkirina vê carê ya Bedirxanîyan, hetanî ragehandina Meşrûtiyetê dewam dike. Piştê ragehandina Meşrûtiyeta Duyemîn, efûyek giştî tête derxistin û piranîya malbatên Bedirxanîyan jî vedigerin Stenbolê. Emîn Alî Beg, ji ragehandina Meşrûtiyeta Duyemîn şûn ve, vedigere Stenbolê û ji ber karê xwe neqlê bajarê Edirneyê dibe û li wê derê, ji demekî kurt şûn ve teqawit dibe. Em vê yekê ji agadarîyên Tarik Z. Tunaya hîn dibin; dema behsa damezirêner û rêvebirên Partîya Radîkal Avamê [Partîya Radîkal a Gel] dike, li ber navê Emîn Alî Beg, di nav kevanekê de gotîye "Ji mifetîşîya Malîyeya Edirneyê teqawit bûye."¹⁴⁷ Lêbelê baş nayê zanîn ku di navbera kîjan salan de li wê derê xebitîye.

Ji xeynî salên nefîkirinê, piranîya jîyana zaroktî û ciwanîya her du lawên Emîn Alî Bedirxan li Stenbolê derbas bûye. Dema Şerê Balkan dest pê dike, Kamiran Bedirxan, bi riza-

¹⁴⁶ Malmîsanîj, *İlk Kürt Gazetesi Kurdistan'ı Yayınlayan Abdurrahman Bedirhan (1868-1936), Weşanxaneyê Vateyî, 2011, Stenbol, r. 48-49*

¹⁴⁷ Tarik Zafer Tunaya, *Türkiye'de Siyasal Partiler, cilt: 2, weşanên İletişim, çapa 4., İstanbul, 2010, r. 105*

mendîya xwe di 17 salîyê de tevî Şerê Balkan bûye. Di vê demê de, wekî gelek rewşenbîrên kurd, ew jî di bin bandora fikiryata Osmanîparêzî û Îslamîparêzîyê de dimînin. Ev bandor, di helbest û nivîsên wan ên wê demê de bi zelalî xuya dibe.

Ji mexlubîyeta Şerên Balkan şûn ve, ji xeynî bajarê Edirneyê, hemû erdê Meqedonyayê ji destê Îperatorîya Osmanî der ketibû. Di vê hengameyê de Îtihad û Terakkî carekî din bi darbeyek desthilatdarî bi dest xist.

3. 1. Destpêka nivîskarî û berhemên sereke

Yekemîn berhema nivîskarî ya her du birayan, pirtûka bi navê *Edirne Sûkutunun İçyüzü [Rûyê Hundirîn ê Sûkuta Edirneyê]* ye û di Hezîrana sala 1913yê de li Stenbolê hatîye nivîsandin. Dema em li naveroka pirtûka wan binêrin, wisa tê fêmkirin ku her du bira jî wê demê li bajarê Edirneyê di cebheya Şerê Balkan de bûne. Dema em bala xwe bidin mukadîme û naveroka vê pirtûkê, wisa jê der tê ku wê demê her du bira jî li ser zemîna fikra osmanîparêzî û îslamparêzî de bûne.¹⁴⁸ Ev fikir û têgehiştin, di nav rewşenbîrên kurd de wê demê di rewacê de bû. Paşê Kamiran Bedirxan bi xwe jî fikrên xwe yên wê demê wisa tîne ziman; “Ez merivek bawermend bûm, min wisa pê bawer dikir ku divê berîya her tiştî dîn bête parastin.” Naveroka pirtûkê jî, vê rastîyê bihêztir dike.¹⁴⁹

“Li paş bergê vê pirtûkê, behsa hinek xebatên din ên birayên Bedirxanî tête kirin, lêbelê em nizanin ku ew xebatên wan hatine çapkirin yan na. Ew heşt pirtûkên ku navê wan hatîye lêkirin, wekî li jêrê hatine nivîsandin û rêzkirin:

1. *Dindaşlarımıza [Ji Hemdînên Me re];*
Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan
2. *Saltanat-i Edebiyye [Seltenatê Edebîyê];* çar cild e,
Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan

¹⁴⁸ Malmîsanij, *Cızıra Botanlı Bedirhaniler, Weşanên Avesta, çapa: 2., 2000, Stenbol, r. 236-237*

¹⁴⁹ J. b., r. 236

3. *Hacle [Jûra Bûkê]*; du cilde e, Kamiran Bedirhan
4. *Kadının Vazife-i İctimaiyyesi [Wezîfeya Civakî ya Jînan]*, nivîskara wê, Madam Anna Lamperber e û ji alîyê Sureyya Bedirxan ve hatîye tercumekirin.
5. *Felaketler Karşısında Milli İnfialler [İnfialên Millî li Hemberê Bextreşîyan]*, Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan
6. *Kurd Aziziye Hükümeti [Hikumeta Kurdî ya Azîzî]*, Sureyya Bedirhan û Kamiran Bedirhan
7. *Muhasara Kivılcımları [Çirûskên Dorpêçkirinê]*, Celadet Bedirhan
8. *Paris Sen Muhakemesinde Otomobilli Caniler [Kûjerên bi Otomobîl di Muhakemeya Sen a Parîsê de]*, Sureyya Bedirhan”¹⁵⁰

Pirtûka çîroka *Bobi'nin Hatası [Xeletîya Bobî]* ya li ser navê Celadet Alî, 18yê Eylûla 1329ê hatîye nivîsandin û ji alîyê çapxaneya Mûdaffa ve sala 1915yê hatîye çapkirin.¹⁵¹ Rîsaleya bi navê *Osmanlı Teyyâreciliğinin İlk Şehidlerİ İçin Hükümetten Rica [Tika ye ji bo Şehîdên Pêşîn ên Balafirvanîya Osmanî]*, ji alîyê Celadet û Kamiran Bedirxan ve hatîye nivîsandin û sala 1329 [1915]ê di çapxaneya *Seday-i Millet* de hatîye çapkirin. Naveroka pirtûkê, pêşnîyarên li ser bîranîna du balafirvanên osmanî ye ku di Sibata 1914yê de bi ketina vê balafirê li Sûriyê şehîd bûne.¹⁵²

Pirtûka *Tanin-i Herb*; “Di dema Şerê Yekem ê Cîhanê de, di sala 1916an de wek broşorek bi navê *Tanin-i Herb* ji alîyê Kamiran Bedirxan ve hatîye nivîsandin û sala 1331ê di Çapxaneya Yenî Osmanî de hatîye çapkirin ku di naveroka wê de, helbestên ku cesaret û moralê bidin orduyê û pesnê Îslam, Xîlafet û Osmanîyetîyê bidin hene.”¹⁵³

¹⁵⁰ J. b., r. 240-41

¹⁵¹ *Celadet Alî Bedirxan & Kamiran Alî Bedirxan, Bobi'nin Hatası, weşanên Avesta, İstanbul, 2011, r. 35*

¹⁵² J.b., r. 8, 27

¹⁵³ J.b, r. 8

Çawa ku di rêzeyên destpêkê de jî hatibû gotin; piştî îmzekirina Peymana Mondrosê, yekemîn partîya sîyasî, di 22yê Teşrîna Ewel a sala 1334an (1918) de bi navê **Radîkal Avam Firkasi [Partîya Radîkal a Gel]**, hatîye damezirandin. Mewlanzade Rifat serokê Partî ye û Emîn Alî Bedirxan jî yek ji damezirêner û rêvebirê partî bû. Ji malbata Babanan jî, Azîz Beg damezirênerê partî bû. Ev partî, wek yekemîn partîya modern û legal e ku ji aliyê kurdan ve hatîye damezirandin. Ji ber ku di nivîsên me yê berîya niha de behsê vê babetê bûye, li vê derê naxwazim dubare bikim. Yê ku bivê, dikarin ji wan nivîsan îstîfade bikin.

Piştê ku PRG tevî xebat û rêxistina CTKê bû, rojnameya Serbestî jî wek weşanek CTKê, bi rêya şube û endamên cemîyetê tête belavkirin. Di vê demê de, li ser babetên cûr bi cûr gelek nivîs û meqaleyên birayên Bedirxanîyan di nav rûpelên *Serbestîyê* de têne weşandin. Dema em bala xwe bidin hejmarên nivîs û meqaleyên wan, wisa xuya dibe ku nivîsên Kamiran bêtir hatine belavkirin. Kamiran Bedirxan, wê demê nivîskarê berdewamî yê *Serbestîyê* bû, lê belê hinek nivîsên wî di rojnameya *Türkçe İstanbul* û *İçtihat* Abdulah Cevdet de jî hatine bilavkirin.

3. 2. Nivîsên di nav *Serbestîyê* de

Me di hejmarên berdest ên *Serbestîyê* de panzdeh nivîsên Kamiran Bedirxan destnîşan kirine. Navê meqaleyên nivîskar û dîroka weşandina wan, di rêzeyên jêrê de hatine destnîşan-kirin:

1. Kamiran Bedirhan, *Kürdler hakkında [Di derheqê kurdan de]*¹⁵⁴
2. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan-I*¹⁵⁵
3. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan-II*¹⁵⁶
4. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan-III*¹⁵⁷
5. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan-IV*¹⁵⁸
6. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan*¹⁵⁹
7. Kamiran Bedirhan, *Kürdistan hakkında selahiyetdar olmayanlar [Ew ên ku di derheqê Kurdistanê de ne selahiyetdar in]*¹⁶⁰
8. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'da haleti fikriye [Kurd û Kurdistan: Li Kurdistanê rewşa fikrî]*¹⁶¹
9. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Nazik bir vaziyet karşısında [Kurd û Kurdistan: Li hember wezîyetek nazik]*¹⁶²
10. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kurd lisanı [Kurd û Kurdistan: Zimanê Kurdî]*¹⁶³
11. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerin amali [Kurd û Kurdistan: Amelê kurdan]*¹⁶⁴

¹⁵⁴ *Serbestî*, no: 181, 21ê Kanun-î Evvel 1918

¹⁵⁵ *Serbestî*, no: 186, 26ê Kanun-î Evvel 1918

¹⁵⁶ *Serbestî*, no: 188, 28ê Kanun-î Evvel 1918

¹⁵⁷ *Serbestî*, no: 193, 2yê Kanun-î Sanî 1919

¹⁵⁸ *Serbestî*, no: 198, 7ê Kanun-î Sanî 1919

¹⁵⁹ *Serbestî*, no: 462, 7ê Nêsan 1919

¹⁶⁰ *Serbestî*, no: 470, 19yê Nîsan 1919

¹⁶¹ *Serbestî*, no: 477, 26ê Nîsan 1919

¹⁶² *Serbestî*, no: 485, 4ê Gulana 1919

¹⁶³ *Serbestî*, no: 486, 5ê Gulana 1919

¹⁶⁴ *Serbestî*, no: 488, 7ê Gulana 1919

12. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'a göz dikenler [Kurd û Kurdistan: Yên çav berdana Kurdistanê]*¹⁶⁵
13. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*¹⁶⁶
14. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*¹⁶⁷
15. Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*¹⁶⁸

3. 3. Nivîsên di nav *Türkçe İstanbul* û *Îçtihadê de*

Rojnameya *Türkçe İstanbul* (TÎ), bi serpereştîya Saîd Molla hatîye weşandin û ew bi xwe jî mixalifekî dijwar ê Îttîhad û Terakkî bû. Ji ber vê yekê têkilîyên wan bi hemû gurubên mixalif re hebû û di serîyê de jî têkilîyên wan bi rewşenbîr û sîyasetmedarên kurd û ermenan re baş bûn. Wisa xuya ye ku ji ber van têkilîyan e ku herdu birayên Bedirxanî di vê rojnameyê de jî nivîsandine. Digel vê, divê em qelem û karê wan ê rojnamevanîyê jî bidin ber çavê xwe.

Qasê me tesbît kirîye, di nav rûpelên vê rojnameyê de nêzîkê deh nivîsên Kamiran Bedirxan hatine belavkirin. Ji van; 7 nivîsên wî hatine wergerandin ji bo turkîya îro û yên mayî ji ber kêmanîya hin hejmarên rojnameya navborî, nehatine wergerandin.

- Kamiran Alî, *Anadolu'ya doğru*

*[Ber bi Anatolyayê ve]*¹⁶⁹

- Kamiran Alî, *Kat'i ve adil tasfiye*

*[Tesfiyeya qethî û adil]*¹⁷⁰

- Kamiran Alî, *Tahsili tali ve şekli lazımı*

¹⁶⁵ *Serbestî*, no: 490, 9ê Gulana 1919

¹⁶⁶ *Serbestî*, no: 496, 15ê Gulana 1919

¹⁶⁷ *Serbestî*, no: 497, 21ê Gulana 1919

¹⁶⁸ *Serbestî*, no: 498, 21ê Gulana 1919

¹⁶⁹ *Türkçe İstanbul*, no: 119, 29ê Marta 1919

¹⁷⁰ *Türkçe İstanbul*, no: 120, 30ê Marta 1919

*[Tehsîla talî û şiklê pêdivî]*¹⁷¹

- Kamiran Alî, *Milliyet meselesi*

*[Meseleya millîyetê]*¹⁷²

- Kamiran Alî, *Ev sağlığı, imar meselesi*

*[Tendirûstiya malê û meseleya îmarê]*¹⁷³

- Kamiran Alî, *“We la tettektumuş-şehade”*

*[Şahidîyê neşeşêrin]*¹⁷⁴

- Kamiran Alî, *Köleliğin memnuiyeti resmiyesi*

*[Bi fermî qedexekirina koletîyê]*¹⁷⁵

- Kamiran Alî, *Kiliseler İttihadi*

*[Îtîhada kelîseyan]*¹⁷⁶

- Kamiran Alî, *Hala militarizm*

*[Mîlîtarîzm berdewam e]*¹⁷⁷

- Kamiran Alî, *Kuholun memnuiyeti resmiyesi*

*[Bi fermî qedexekirina alqolê]*¹⁷⁸

3. 4. “Meseleya millîyetê”

Di bin vê sernivîsê de, rasterast wergera du meqaleyên Kamiran Bedirxan hatine kirin, da ku têgehîştin û nêrîna wî ya li ser meseleya neteweyî bête fêmkirin. Lewra têgehîştin û nêrîna kabirayên rewşenbîr û pêşengên tevgera rizgarîya kurd, ji alîyê ve nêrîn û sîyaseta rêxistinên wê demê dide nîşandan. Ji ber vê yekê, ev cûre nivîsên sîyasî, ji bo têgehîştina ast û rewşa sîyasî ya wê demê pîrr girîng in.

¹⁷¹ *Türkçe İstanbul, no: 126, 5ê Nisana 1919*

¹⁷² *Türkçe İstanbul, no: 128, 7ê Nisana 1919*

¹⁷³ *Türkçe İstanbul, no: 132, 11yê Nisana 1919*

¹⁷⁴ *Türkçe İstanbul, no: 138, 17yê Nisana 1919*

¹⁷⁵ *Türkçe İstanbul, no: 147, 26ê Nisana 1919*

¹⁷⁶ *Türkçe İstanbul, no: 150, 29ê Nisana 1919*

¹⁷⁷ *Türkçe İstanbul, no: 139, 18yê Nisana 1919*

¹⁷⁸ *Türkçe İstanbul, no: 147, 26ê Nisana 1919*

Kamiran Bedirxan di nivîsa xwe de dibêje:
 “Di Şerqê de hişyarîya neteweyî, -di nava hinek milletan de- piştê nivê esra nozdeyan tesîra xwe nişan daye.”¹⁷⁹
 “Serokkomarê Amerîkayê Mr. Wilson, di xîtabeteke xwe de bi dengê bilind dibêje; heqê hemû milletan heye ku bigîjin mafê xwe yê rewa yê xudabexş. Ev serkirdeyê bijarte yê Dewleta Amerîkayê, bi vê gotinên xwe heqîqeteke ebedî tîne ziman. Ev rewşa komelayetî ya ku ji sedsala nozdeyan vir ve wek esra millîyetê tête qebûlkin, wek aqîdeyekê roj bi roj girîngîya wê bêtir û xurttir dibe. Eger milletekî hebûna xwe, bi unwanên nexwezayî ve girê bide û guhdarîya dîrok û qewmê xwe neke, dê rastî aqîbetên dilşewat bêt. Qurbanekî mûdhîş ê vê heqîqetê jî, memleket û milleta me ya masûm û mexdûr e ku îro em bi girîn û xemgînîyeke bêdawî şîna wê dikin. Di derheqê girîngîya prensîbên millîyetê û qudreta ebed zindîbûna van qenaetan de çî bête gotin ne bes e. Ew mirovên ku di heman rojê de bextewar bin, bi heman xemgînîyê bigirîn, heman muqaderatê bi hev re parve bikin, di delhîzên dirêj û berfireh ên welat de jîyana xwe di gelek esir û dewran de bi hev re derbas bikin, hevgerîna di navbera layengirîya wan de û xweşikîya xwezayîya lihevkerîna ruhiyeta wan a bi bêaxaftinê, çî hîseke mûdhîş e. Di vê xusûsê de ne pêwîst e ku zêde bête fikirandin. Dema mueseseyên ku ne li gorî tabîatê bin, avabûn û demeke dirêj li ser pîyan mayîna wan, di jîyanê de berhemdarbûna wan zahmet dibe û pêşiyê dereceya lihev-bûna babetên xwezayî yên milletê xuya dibin. Emê îro behsa prensîb û tevgerên hişyarkirîna millîyetê û tesîra wan a îroyîn bikin ku -qaşo- berîya pênc salan dest pê kiribû. Yekemîn: Di bingehe de divê ev bête qebûlkin, ew milletperwerê ku xweperest nebe, girîngîya îstisnabûna (cihêtîya) milletê teqdîr dike û li hemberê millet-

¹⁷⁹ Kamiran Âlî Bedirhan, *Kürdistan-IV, Serbestî, no: 198, 7ê Kanuna Sanî 1919*

perwerên din kîndar nabe, bîlakîs hûrmeteke pirr zêde û bêdawî nîşan dide. Bi vê hîsiyatê mûtehassîs dibe û tevdigere.

Duyemîn: Milletperwerek, berîya her tiştî naxwaze ferdên milleta xwe xerc bike û ji ber vê yekê jî welatperwerek hiqûqî -ku pêdivîyeke fewqalede û îhtiyaceke heyatî çenebe- û aştîxwaz e. Ne ku ji mirina sê mîlyonan re, li ser mirina birayekî xwe jî direcife.

Sêyemîn: Milletperwerên rewşenbîr û samîmî ji bo tekamûlkirina milletên xwe di rêya xwezayî ya îlm, medenîyet û esrê de diçin û milletên xwe jî di vê rê de dimeşînin.

Li ser vê babetê îzehet û hejmartina bendên çaran, pêncan û şeşan mimkun e.

Li vê derê li ser ew gurubên ku di bin navê Turk Ocaxî û hinek unwanên din de xebat û rêxistinkirina tevgera mîllî ji xwe re kirine armanc, sikût dikim.

Lêbelê anûka dixwazim vê bibêjim; hinek mirov ne têde, hîn ew milletperwer û rewşenbîrên ku bi cewhera xwe ve girêdayî bin, mirovan biheyirînin, hêja, ji dil û xwedîhûrmet bin negihîştine.

Di rastîyê de rewşa îro ya memleket; weziyeta perîşan a xemgîn û bedbext, wisa dide xuyakirin ku milletperwerên turk ên bijarte, gihaştî, saf, bêihtiyat, bi bawer, mûsemahakar û xemxûrê yên din nîne.

Hestên mîllî yên rastîn, wekî muvafaqiyeteke îlahî tesîrên fewqalede dikin û berhemên wisa peyda dikin ku eqlê mirov pê diheyire.

Zihnîyetên wesat jî bi evîna mîllîyetê bilind dibin û di bin xwedîyê hêz û qudretê.

Îro bi awayekî giştî ew ên (fîkrê) ku di çarçoveya îmkânên heyî de parastina gihaştina mirovatî dikin û bê rewstan herî zêde ji bo pêkanîna sazîyên civakî dixebitin, milletperwer in. Û mezinayîya hîssîyata mîllî, bêîstîsna milletên herî mezin û herî biçûk ên li Awrupayê xistine daîreya pêşkevtinê.

Bi awayekî minasib di îzehatkirina van rastîyan de mexseda me ev e; pêşîlêgirtin û hişyarîdayina alîgirên tevgerên li dervayê milletperwerîyê ku roj bi roj li welatê me çarçoveya xwe berfireh dikin.

Em hemû dizanin ku prensîbên exlaqî yên herî fewqalede jî di destê kesên kêrnehatî de çawa encamên neyînî derxistine holê.

Bêyî ku em vê rastîyê ji ber çavan dûr bixin û ji bîr bikin, divê em nefsa xwe biparêzin ji ew aksûl-emela [reaksîyona] ku ji aliyê mecnûnên di bin unwanên neteweperwerîya turkan de û di serîyê de jî li hemberê millîyet û milletê turk û bi giştî jî li hemberê bextewarî, refah, hizur û jîyana hemû mirovan hatîye kirin.

Ev mesele, meseleyek meşrû ye û ji her tiştî bêtir muxtacê pêkanîna qeweteke manewî ye. Ji ber vê, divê ev mesele bi nêrîneke rewşenbîrî û minasib bête vekolandin û şirovekirin, ji wê şûn ve jî bi tevgerêke maqûl a millî ve bête girêdan.

Divê hemû mesayî ji bo pêkanîna vê qeweta manewî bête serfikirin û ji bo ku zeafiyeta têkoşîna millî çênebe, çi alîkarî ji destê me bête divê em bikin.

Ku em di nav daîreya hestên xwe de bimînin, şiroveyên maqûl û rastîyên berçav nebînin yan jî bibînin û qebûl nekin, dê aqîbetên êşdar ên wisa derxînin meydanê ku wê hidudê tesawirên gelek dilêş derbas bikin. Ji ber vê yekê, divê em xwe ji xerabîyên ku li jorê hatin gotin biparêzin, ruhê xwe bi cewhera eslî ya hîssîyata millîyetê û bi heraret û ronahîya vê hîssîyatê têr bikin.

Ji bo keştîvanan wateya wezîfeya stêrka Qurixê çi be, millîyet... namzetê ebedî û berdewamîya hişyarîya milletan e. Îstiqamet û piştgirîya pêdivî ya milletan, her dem û daîm ew temîn dike.

Li gorî vê yekê, wek zarûrîyeteke tabîî (sirûştî) wezîfeya me ya civakî ev e, ku em bibin milletperwerekî dilpak, jêhatî û dilxwazê xebatê.”¹⁸⁰

¹⁸⁰ Kamiran Âlî, *Milliyet Meselesi [Meseleya millîyetê]*, *Türkçe İstanbul*, no: 128, s. 1, 7 Nisan 1919

Kamiran Bedirxan di nivîseke xwe ya din de jî, di derheqê meseleya neteweyî de bersiva rexne û pêşniyarên hinek rojnameyan û bi taybetî jî bersiva rojnameya *Yeni* dide û dibêje:

“Me, daxwazên kurdan bi dîr û dirêj anîn ziman.

Di çarçoveya pêdivî û xwestekên rastîn de, daxwaz û tesewirên milletan meşru ne û armanca wan a neteweyî jî digire nava xwe.

Di dereceyeke tewr bilind de û bi awayekî mîsoger (miheqeq) rêzgirtina li hemberê heqê hevûdu, di rêya azadbûn û bextewarîyê de riayetkirina ji bo azadî û bextewarîya her milletê, di rêya hereketa gihîştina armancê de nuqtayên tewr bingehîn in û divê kurd teqîba (peyçûna) wan bikin.

Kurd; nafikirin û naxwazin ku pêşkevtin û bextewarîya wan zesarê bide milletekî din. Em rîayetê prensîbên neteweyî yên Serokkomarê Amerîkayê Mister Wilsonî dîkin ku ew yek ji serwer û ustadê herî bêteref ê dinyayê ye û gihîştîye qencîyeke esasî ya îlahî. Dil û daxwazên me, ber bi pêşkevtina vê usulê ve ye.”¹⁸¹

3. 5. “Mîlîtarîzm berdewam e”

Hikûmeta Îtihad û Terrakî, ji bo veğerandina erdê wendakirî yê Împeratorîya Osmanî, Şerê Yekemîn ê Cîhaê wek firseteke nû nirixand û di sala 1914yê de ligel Dewleta Almanî tevî şer bû. Meyleke mîlîtarîst a Dewleta Osmanî ji berê ve hebû. Di sed salên dawî de ev xusûsiyet hîn bêtir derketîye pêş. Ji bo ku bibin dewleteke mîlîtarîst, di van sed salan de mirov û pareyên gelek zêde hatin windakirin, lêbelê di miqabilê wan de eserê serkevtinek herî biçûk jî nehate meydanê. Di van sed salan de netîceyên hewldanên dîrokî û leşkerî yên dewletê, mexlûbyetek berdewamî dide xuyakirin. Bi tevî alîkarîya leşkerîya almanan, mexlûbîyeta di Şerê Giştî de, dawî li Dewleta Osmanî anî. Lewra rêvebirên hikûmeta Îtihad û Terakkî, serkevtinê, tenê bi hêzkirina teşkîlatên leşkerî ve girêdabûn. Bi

¹⁸¹ Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerin Emelleri [Daxwazên kurdan], Serbestî, no: 488, 7 Mayıs 1919*

gotina Kamiran Bedirxan; ji ber ku dilên medenî û civakî nehatin teqewîyekirin, hemû teşkîlatên leşkerî encameke sernekevî û zerareke mûdhîş anîn meydana. Rizgarîya vî milletê, bi ordîyê-leşkerîyê nabe, ancax bi destê alîkar ê îlim, marîfet, medenîyet û perwerdeyîyê dibe. Ordîya milletekî perwerde nebûyî, bi tevî hemû fedekarîyên însanî ve nikare xelasbûna memleket pêk bîne. Divê êdî em têbigîjin ku mexlûbîyeta me, ne ji ber sebebên leşkerî bû. Berîya ordî û leşkeran, divê em çaksazî di mûesseseyên komelî û îlmîyeya xwe de pêk bînin. Divê em heyat û heraret bidin armancên wekî pêkanîna edaletê, avadanî û çaksazîya welat, temînkirina asayîşê, geşepêdana çandî û îqtîsadî.¹⁸²

Kamiran Bedirxan di berdewamîya nivîsa xwe ya bi navê "*Millîtarîzm berdewam e*" de, rexne li vê sîyaseta millîtarîst digire û dibêje:

"Bi rastî jî hîn îstiqbala însanîyetîyê pêk nehat û nehate dîyarkirin.

Em hîn nikarin îddîa bikin û bibêjin însanîyetî; qasê ku bêje welatê min rûyê zemîn e û milleta min însanîyet e, bilind bûye.

Lêbelê çî dibe bila bibe, dahatû, bi gaveke bilind û bi ferqeke mezin ji rabirdûyê veqetiyaye.

Hîsên bilind ên însanan nebe jî, berjewendî, endîşe û meseleya pêkanîna aramîyê pêdivîya aşîtîyeke demdirêj tîne rojevê.

Însan ji bîna xwîn û barûdê kerixîne, hewldanên bêaram û fedekarîyên bînavbir di her kesî û her bajarî de îhtîyaciya hizur û pêdivîya sikûneteke lezgîn peyda kirîye.

Beşek însanan bi rizamendîya xwe, beşeke din jî ji bêgavîyê û beşeke mezin jî bi kêfxweşiyê sikûnetê daxwaz dikin.

Ku meriv bibe tecelîgaha heqîqetan, ji ber memnûnîyetî ye. Ew ên ku muqaderata me û rewşa welatê me yê nebaş bi dest xistine, bi îsrarê naxwazin heqîqetên

¹⁸² Kamiran Âlî, *Hala Militarizm [Militarizm berdewam e], Tûrkçe İstanbul, no: 139, s. 1,18 Nisan 1919*

ku ji bêgavîyê di çarçoveya neh deh rêzikan de hatine ragehandin bibînin.

Agahdarîyek gehîştîye ber destê me ku heyret û te-
esûfeke mezin dide meriv; ji mamoste û memûrên ku
di dema şer de hatibûn tecîlkin, qîsmekî wan ji bo
perwerdekirina zabîtan rêkirine talîmgahê.

Pêşîyê me got belkî ev nûçeya hanê henekek trajîk e, lê
dîyar bû ku ev fikra xerab, bûye heqîqetê de dehşet. Di
vê rewşa hanê de hîn bi hêsanî têtê fêmkirin, ew kesê
ku di nava van tengasîyên bêsinor de be, li hemberê vê
tevgera nedîtî û neyê tehamûlkinê de wê bikeve çi
halî.

Li Rojhelatê welatê me bifikrin; li wê derê xwendin
û nivîsandin ji alîyê pirr kêman kesan ve têtê zanîn û
perwerdeyî jî belav nebûye. Eger hûn ji vir bîst hezar
ciwanên mûnewer û mûtefekîran, bê ku xizmeteke xêr-
dar bikin ji bo tiştêkî bêmxesed û bêarmanc ji jîyan û
mueseseyên pêdivî yê jîyanê veqetînin û bixin binê
axê, tebeqeya mayî ya mûneweran jî rêkin qîşleyan û bi
vî awayî jîyana civakî felc bikin, têgihîştina vî zahmet e
û mexseda zîhniyeta we çi ye?

Îro di derbarê leşkerîyê de û li ser sînorê talîm û şiklê vî
îhtiyacîyê de, bi îzehatên dirêj û fireh nivîsandin nepê-
divî ye. Nuqteya ku em diwxazin îzehat bikin ev e; em
bi dinya û memleketê xwe re bidin zanîn ku rêvebirên
dewleta me xwedîyê nêrîneke teng û keyfî ne.

Ev wezîyeta hanê çiqas dibe sebebê şermezariyê? Em
nabêjin îhtiyacî bi ordîyê nîne û bila bête belavkin.
Gotina me ev e; ordî ne muhtacîya me ya sereke ye.
Heqîqet ev e, ku me bi salan para herî mezin a dahatû-
ya xwe ji ordî û leşker re veqetand. Di dawîyê de, ne
weqîst û ne jî neqîst ji karê teşebûsên girîng ên wekî ten-
dûrîstî, perwerdeyî, zîreat, sinayî, daristan û madenê re
ma. Lêbelê ev teşebûsên girîng, çavkanîyên qeweta bin-
gehînan a memleket in. Me hemûyan dît ku encamên van
hewldanên mîlîtarîst ên mezin û bêsinor çi peyda kirin.

Ji bo ku bibin dewleteke mîltarîst, di van sed salan de mirov û pareyên gelek zêde hatin windakirin, lêbelê di miqabilê wan de eserê serkevtinek herî biçûk jî li meydana nîne. Di van sed salan de netîceyên hewldanên dîrokî û leşkerî yên dewleta me, mexlûbîyetek berdewamî dide xuyakirin.

Ciwanên bijarte yên ku ji mirin û kuştinê re amade ne, vê bizanin ku çek û muhîmatên bêhesab nikarîn pêşî li mexlûbîyeta herbê li Mora, Sirbîstan, Bogdan, Eflak, Cezayîr, Tunûs, Qibris, Misir, Trablus, Bîngazî, Gîrît, Ūskûp, Selanîk, Kosova, Yanya, Manastir, Edirne û Herbê Umumî bigire.

Ji ber ku dilên medenî û civakî nehatin teqewîyekirin, hemû teşkilatên leşkerî encameke sernekevtî û zerareke mûdhîş anîn meydana. Ev rastî û tiştên pêkhatî li ber çavan e, evana zeka û muhakemeyê dikujin. Lêbelê ji aliyê wan ve hîn jî hinek hewldanên ji bo xizmeta sehneya civakî têne kirin, em têngajîn û nizanin ev hewiladan dê bi gotineke çawa bêne wesifkirin. Îro pêdivîya memleket bi takekesên ordiyên pîşekarî yên wekî mamoste, senaetkar, tabîb, zîraetkaran heye.

Divê em heyat û heraret bidin armancên wekî pêkanîna edaletê, avadanî û çaksazîya welat, temînkirina asayîşê, geşepêdana çandinî û îqtîsadî.

Ev jî, bi wê ordîya (artêşa) leşkerên ku musîbetên bêdawî yên li ser serê me kêr dikin, êşa me ya bêsînor didin rawestandî, me ji ketina kendalên bilind diparêze nabe. Ev rastîyek wisa ye.

Erê xwîna hêja ya vî milletî, ji aliyê ordîya me ya bi qîmet a ku hêjayê tebrîk û teqdîrkirina dost û dijmin e, hatîye rijandin. Lêbelê rizgarîya vî milletî, bi ordiyê-leşkerîyê nabe, ancax bi destê alîkar ê îlim, marîfet, medenîyet û perwerdeyîyê dibe.

Milletekî pêşketî û medenî bi hêsanî dikare bibe xwdiyê ordîyeke baş; ji bo vê meseleyê dewletên wekî Brîtaniya û Amerîkayê mînakên herî ronahî û dîyar in.

Feqet vê rastîyê jî da îspatkirin ku ordîya milletekî perwerde nebûyî, bi tevî hemû fedekarîyên însanî nikarî xelasbûna memleket pêk bîne. Divê êdî em têbigîjin ku mexlûbîyeta me ne ji ber sebebên leşkerî bû. Berîya ordî û leşkeran, divê em çaksazî di mûesseseyên komelî û îlmîyeya xwe de pêk bînin. Ku vê carê jî xelêtî û gendelî werin veşartin û meseleya çaksazîyên bingehîn were îhmalkirin, ji nûha ve dîtîna û nîşandana paşeroja me xuya ye.

Ez temenî dikim ku em nebin qurban û temaşevanê vê dîmena dilşewat (trajîk).

Bi dîtîna me, îro hereketê ku pêşîyê bête kirin ev e; divê bêlayenîyek çêbe ji bo pêkanîna û domandîna jîyanekê di nav aşitî û aramîyê de, ji wê şûn ve jî heta ku mimkun be, kadroyên teşkîlata leşkerî bêne kêmkirin.

Bi van çaksazîyan (îslehata) unsûr û serwetê zînde yê ku bête bidestxistin, divê ji bo refaha welat û welatîyan bête veqetandin.

Îro em ji mirinê bêtir, herî zêde muxtacê jîyanê ne.

Divê em di guhê milletê de bi zelalî biqîrîna û bibêjin; Êdî ji mirinê bêzar bin” berîya ku hûn hemû rewşenbîr bêne kuştin.”¹⁸³

3. 6. “We la tektumuş-şehade [Şahidiyê neveşêrin!- Ayet]”

Di 31ê Çirîya Pêşîn a 1918an de li Mondrosê bi navê Dewleta Osmanî şanda Husên Raûf ê Nazirê Behrîyeyê û qumandarê Brîtanyayî Amîral Calthorp Peymana Mondrosê hatibû îmzekirin. Peyman, encamnameya Şerê Cîhan ê Yekemîn bû, di nav de ji bo Dewleta Osmanî şertên pîrr giran hebûn û îmzekirina peymanê dihat wateya radestbûna osmanîyan. Cemîyeta Îttihad û Terakkî du hefte berîya îmzekirina peymanê, desthilatdarîya hikumetê dewrê Ahmed İzzet Paşa kiribû. Gelek serok û rêvebirên CÎT, bi minasebeta meseleya tehçîrkirina ermenan, ji ber tirsê girtin û darizandinê, di 1ê

¹⁸³ Kamiran Âlî, *Hala militarizm [Militarizm berdewam e], Türkçe İstanbul, no: 139, s. 1, 18 Nisan 1919*

şeva Çirîya Paşîn de terkê welat kirin û revîyan. Paşayên wekî Enwer, Talat û Cemal, Behaddîn Şakir ê serokê komîteya cîbicîkirinê û Doktor Nazim bi keştîyek binbehrî ya Almanan revîyan Odessayê. Hinek serokên herêmi yê CÎT jî, xwe ji ber çavan dûr kirin. Wek nimûne, çend endamên CÎTyê ji bo dazandîna hatin girtin, lêbelê mehkemeyeke rastîn nehate damezirandin, delîl û îsbatên pêdivî jî nehatin berhevkirin. Berpirsyar û rêvebirên hikumetê alîkarîya pêdivî nedikir, xelkê jî, ji ber tîrsa kuştinê nediwêriya şahidîya qetl û xerabîya îttihadparêzan bikin.

“Herkes ji bîranîna navên van mirovan dixerixê, ji ber kiryar û karesatên wan ên ku bihîstine û dîtine, bi wijdana xwe bawerî bi tawanbarîya wan dikin û ji ber vê yekê jî mutmaîn in. Lê mixabin newêrin heqîqetê li ber mehkemeyê bînin ziman.

Em bang li wan kesên ku heqîqet dîtine û naxwazin bibêjin dikin:

‘Hey mirovên muqawement lawaz!’ Ev lehî dê we jî bide ber xwe.”¹⁸⁴

Kamiran Bedirxan, bi vê ayeta ku kirîye sernivîsa meqeleya xwe, bang li xelkê sivil dîke û dibêje: “Ez bi êşa giran a ruhê xwe bang li hemû kesên xwedîşexsîyet dikim û dibêjim metirsîn, heqîqetê bibêjin.

“Hêza tewr mezin heq e û ji Heq ve tê.”¹⁸⁵

Hûn jî werin di mehkemeyan de şahidîya xerabîyên îttihadparêzan bikin.

“Şahidîyê neveşêrin!

Em li ber vê emrê bilind ê Xudayî, hûrmet û îteatê dikin, li ber wî histûyê xwe xwar dikin û tabihê wî dibin.

Divê ji bo dazandîna ew ên ku memleket xerab û wêran kirin, xan û manê me mehkûmê aqûbeteke xerab kirin, bilezînin. Ev karesat û cinayetên ku di nav van pênc salan de milleta Îslamê duçar bû, mîsalên wê di dîrokê de nînin.

¹⁸⁴ Kamiran Âlî, *We la tektumuş-şehade, Türkçe İstanbul, no: 138, 17 Nisan 1919*

¹⁸⁵ Kamiran Âlî, *J., b.*

Ewên ku navê bilind ê însanetîyê lekedar kirine, xera-
bîyên bêdawî û bêsinor kirine, bûne qatîlê hal û îstiq-
lala milleteke gewre û di navbera dewletan de bûne
xwedîyê mewqîyeke reş, wê li ber edaleta Cîhanê bêne
darizandin.

Hinek muesese (sazî) ji şeş mehan vir ve bi hemû qewet
û qudreta xwe îddîa dikin û dibêjin em tevî kiryarên vê
zulma pênc salan nebûne, lêbelê zeman û mekanên ku
millet li wê dijî, delîlên aşkera yên vê heqîqetê ne. Ew
dê bêne vexwendin. Bila ew li nik xwe bi hemû qeweta
xwe îddîa bikin û bibêjin em tevî vê zulmê nebûne, ev
hiç tiştêkî temîn nake.

Em dixwazin ev qaîdeya fiqihê bibe “delîlê amel” ku
dibêje “Heqîqeten pêzanîna karên ku bi veşartî hatine
kirin, ancax bi delîlên aşkere mimkun dibe.”

Dema ku biryar li ser vê esasê bête girtin, helwesta se-
reke ya ku ji alîyê herkesî ve bête nîşandan ev e; herkes
bêyî ku berjewendîyên xwe yên şexsî bifikre, divê ji bo
bilindkirin û parastina berjewendîyên pîroz ên miro-
vatî û milletê, hemû agahdarîyên xwe yên di derheqê
kiryarên bedbext de, li ber Dîwana Herbê bi qîrîn û
dengêkî bilind beyan bike û bide zanîn.

Bi qabîliyeta îfadekirina peyvan nasandina rêxistin-
karên van cîneyetan ne mimkun e. Ku millet, vê koma
melûnan, bi hêza heq û edaletê îtham û mehkûm bike,
li welatê me qanûn û edalet jî tête tesîskirin.

Şopa kiryarekî herî sivik, li nik dadger wek çirûskên
ronahîya fikrekê tête pêşkêşkirin. Ji dadger re; îlham
nasîb e, îcraya wî edalet, îhqaqa wî heq e, ew ên ku ji
alîyê kiryar û îcreatê ve bêtawan bin dîyarkirina bê-
tawanîya wan, bi cezakirina tawanbaran mimkun dibe.
Ev mefkûreyên xelaskar ên ebedî bi vî awayê derdike-
vin meydana heqîqetê.

Herkes ji bîranîna navên van mirovan dikerixe, ji ber
kiryar û karesatên wan ên ku bihîstine û dîtine, bi wij-
dana xwe bawerî bi tawanbarîya wan dikin û ji ber vê

yekê jî mutmaîn in. Lê mixabin newêrin heqîqetê li ber mehkemeyê bînin ziman.

Em bang li wan kesên ku heqîqetê dîtine û naxwazin bibêjin dikin:

“Hey mirovên muqawemet lawaz! Ev lehî dê we jî bide ber xwe.”

Êdî dem hatîye, divê ev rastî bi dengêkî pirr bilind û xofdar were qêrîn. Di vê xusûsiyetê de nûqteya herî girîng a ku li ber çavan bête girtin ev e; derxistina rastî û heqîqetê ye.

Di nav ew ên ku îro bûne mehkûmê îtihama wijdana milletê de; mimkun e yên bêguneh jî hebin û yên ku sûcên (tawanên) wan ji zankirina me zêdetir bin jî hebin. Belkî jî ew ên ku em wan mexdûr dizanin, karesatên herî xerab kirine û li heyatê ne.

Digel her tiştî, ji bo ku rastîyên li ser vê meseleyê derkevin meydanê, divê em hemû zanînen xwe bibêjin û guhdariya dengê bilind ê wijdana xwe bikin; ev rastî di leh û alehê kê de dibin bila bibin, divê ber dîwana edaletê bi awayekî berfireh bêne beyankirin û îzahkirin. Ne pêdivî ye ku em bi zalimane tevbigerin û xwedîyê qesteke mexsûs bibin, li meydanê ji her alî ve; ji alîyê xusûsî yan jî giştî ve welat û milletekî xopan û têkçûyî heye. Ji nava wan tawanbaran (sûcdaran) pênc kes wenda bûne û ne xuya ne, yên mayî li vir in.

Îro daxwaza heq û edaletê ev e; divê takekes bi hêza xwe ya yekgirtî, bêtirs û bi awayek lez û lezgînî hewldanên ji bo derxistina heqîqetê bikin. Ger wisa nebe, divê em dev ji heqîqetên domandina jîyanê û paydarbûnê berdin.

Dema meriv mewcudîyeta hinek ehmeqên ku virde û wêde bawerî bi virr û derewên bengîxwaran dikin dibînin, girîna meriv tê.

Do naskirîyekî min ê saf got: “Yekgirtina Mîllî” belavnebûna, mahîyeta wê nehata fêmkirin, dê piştî panzdeh rojan bûyerek servegirtinek Babê Alî bihata serê me.”

Gelo “Yekgirtina Mîllî” ji bo tevgereke wisa misaîd e? Li ser vê xusûsiyetê, vê gavê bêdengmayinê tercîh dikim. Vê gavê lerizîna bi tesewira xeternakîyên xîyalî! Ya Reb! Ev çi nesîb e, di vê jîyana me ya zelil de?

Ez dilrehet im, beşekî zêdeyê ew ên ku heqîqetê vedişêrîna û ji aşkerekirina heqîqetê ditirsin, di paşerojê de jî bi tesewirkirina mewcûdîyeteke wisa ditirsin. Ez bi êşa giran a ruhê xwe bang li hemû kesên xwedîşexsîyet dikim û dibêjim metirsin, heqîqetê bibêjin.

“Hêza tewr mezin heq e û ji Heq ve tê”

Divê em pê bawer bin û pê îtiqad bikin; ew ên ku ne heqperest bin û nikaribin di rêya heqê de fedekarîyê bikin, ji bo wan mafê jîyanê nîne.

Divê em xwe ji cînayeta ruhî biparêzin, ji nîşandana bêhêzî û lawazîyê bi dûr kevin. Sedsala bîstan ji lawazan re dibêje: “Lawazbûn cînayetek e û cezaya wê jî îdam e.” Ew ên ku hez ji heqê nekin, îcab bike mirina di vê rê de negirin ber çavan, divê kefen û darbista xwe amade bikin.

Ev deng û ev hukmê vebirî, heman demî dengê heq e û biryara tabîatê ye.

Ev deng, dema tewafuqê tabîatê bike û di nav hişkîya qanûnên tabîatê de bibe îfadeyeke herî dijwar, dê bi me bide dîyarkirin ku em çi qasî mecbûr in ku bi qetîyeten dengê wijdana xwe guhdar bikin.

Welhasil vê gavê esra bîstî ya ku bi çirûskên heqîqetê hatîye ronîkirin û Xwedayê ku gelê wî kaînat e, hafizê kevn û mekan e; beşer, wijdan û edaleta ku ji alîyê ruhî ve nêzîkê asta Xweda ye, bi emrê Celîlê Rebbanî taqîb-kirina heqê ji bo me ferman dike.

Em guhê xwe bidin rûpelên payebilind ên Quranê û guhdar bikin: “*We la tektumuş şehade*” [*Şahidîyê veneşêrin*].¹⁸⁶

¹⁸⁶ Kamiran Âlî, *We la tektumuş-şehade*, *Türkçe İstanbul*, no: 138, 17 Nisan 1919

3. 7. Ermenistan û Kurdistan

Dema em li ser bûyerên sedsala 19 û destpêka sedsala 20an hûr bibin, bêguman meseleya ermenan yek ji bûyerên girîng ê wê demê bû. Ji destpêka sedsala 19an şûn ve, Împeratoriya Osmanî her ku pêda çû erd wenda dikir û sînorên wê teng dibûn. Veqetandina pêşîn di sala 1821an de bi Yunanistanê dest pê kir û paşê bi veqetandina Krîstiyanan Balqanan dewam kir. Piştî Konferansa Berlînê jî Romanya, Sirbîstan, Qeredax, Bosna-Xersek û Bulgarîstan ji Împeratoriyê veqetiyan. Pêla fikra neteweyî ya milletên Krîstiyaniyan û veqetandina wan a ji Împeratoriyê, bandoreke girîng li ser ermenan jî kir. Bi taybetî jî Peymana Berlînê (1878), pîlanên îslehetê (çaksazîyê) û bûyerên 1895-96an, dema geşbûna vê dewreyê didin nîşandan. N. Dêrsimî, di *Bîranînên* xwe de hemû bendên peymanê îsleheta (çaksazîya) ji bo ermenan bi dût û dirêj nivîsîne.¹⁸⁷

Cara pêşîn peyva “şêş wîlayetên” ermenan yan jî “wîlayetên sîtte”yê, reform û îslehetên ji bo van wîlayetan, piştî Peymana Berlînê hatin rojevê. “Li gorî pîlana îslehatê, dê ji şêş wîlayetên navborî (Erzerom, Wan, Bedlîs, Dîyarbekir, Mamuretulazîz û Sêwaz) du wîlayet bihatana teşkîlkîrin û ji bo rêvebirina karûbarê ermenan jî du mifetişên awrupayî bihatana tayînkirin.”¹⁸⁸

“Ji nivê sedsala 19yan şûn ve, rewşa ermenên nav Împeratoriya Osmanî gihîşte qonaxeke sîyasî ya navdewletî. Her ku zeman derbas dibû, Împeratorî jî ber bi lawazbûn û rûxandîna ve diçû. Digel vê lawazbûnê, li ser împeratoriyê nifûz û bandora hêzên dewletên Awrupayî û reqabeta di navbera wan de jî zêdetir dibû... Dîrokzan, bi awayeke giştî şerê salên 1877-78 ê navbera Osmanî û Rusan, wek destpêka peydabûna meseleya ermenan qebûl dikin....”¹⁸⁹

¹⁸⁷ Bn. Dr. Nûrî Dêrsimî, *Hatîratım [Bîranînên Min]*, Weşanên Doz, 1997, Stenbol, r. 52

¹⁸⁸ Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919*, Weşanên Avesta, Stenbol, 1999, r. 139

¹⁸⁹ *Derleyenler: Joost Jongerden- Jelle Verheij, Osmanlı Döneminde Diyarbekir'de Toplumsal İlişkiler (1870-1915)*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 2015, r. 93

Destpêka peydabûna îdeolojîya neteweyî di nav ermenan de, digîje salên 1870an. Ji bo hîn bêtir bidestxistina mafên neteweyî û serxwebûnê, di sala 1887an de li Cenevreyê bi navê Hinçaqyan yekemîn rêxistina veşartî û şoreşgêr a ermenan hate damezirandin. Ji wê sê sal şûn ve, li Rusyayê jî bi navê Taşnaqsutyun (1890) rêxistineke çepgir hate damezirandin. Damezirandina rêxistinên neteweyî û xebata wan a di nav ermenan de, meseleya ermen û Ermenîstanê hîn zêde geş kir û di rojêva sîyasî ya navdewletî û rayagiştî de bêtir derxist pêş.

Piştî Peymana Berlînê, meseleya ermenan çend qonaxên xwînî derbas kirîye. Di vê navberê de, bala rejîma Abdulhemîdê II. jî li ser tevgera ermenan bû. Pêşiyê di dema wî de, di navbera salên 1890-96an de, tevgera ermenan bi dijarî û xwîndarî hatibû têkbirin. E. W. Charles Noel dibêje: “Qetlîamên ku di navbera salên 1865 û 1895an de bi ser ermenan ve hatine, temamî bi fermanên Osmanîyan hatine pêkanîn.”¹⁹⁰ Hemîd Bozarşan jî di heqê bûyerên wê pêvajoyê de gotina G. Meyrier neqil dike û dibêje armanca: “Qetlîamên 1894-1896an ev bû, ku bibe pêngavên pêşîn û şênber ên ber bi ji nû ve pêkanîna Anatolya ji bo koma tirk û Misilmanan.”¹⁹¹

Abdulah Cevdet, piştî van bûyeran, di nivîseke xwe de miqayeseya veqetandina milletên Krîstîyanên Balqanan û ermenan dike, pêdivîya wekhevîya mafê milletên nav împeratorî tîne ziman û dibêbe: “Kurd, ermen, tirk û yên din mehkûmê vê yekê ne ku di jîyana xwe de bi hev re û qasê hev nîmet û zehmetan bibînin; di heman rewşê de û qasê hev bextewar yan jî nebextewar bin.”¹⁹²

Dewletên Awrupayî (Rusya jî di nav de), ji bo pêkhatina Peymana Berlîn û pîlanên îslehetê, roj bi roj li ser rêvebirên Dewleta Osmanî zixtên xwe zêde kirin. Hewldan û zixtên van dewletan, di nav rêvebirêya dewleta Osmanî de şuphe û ten-

¹⁹⁰ Edward William Charles Noel, *Kurdistan 1919, Weşanên Avesta, Stenbol, 1999, r. 139*

¹⁹¹ Hamit Bozarşan, *Türkiye'nin Modern Tarihi, Avesta Yayınları, İstanbul, 2004, r. 20*

¹⁹² Abdullah Cevdet, *Kürdistan ve Ermenistan mefhumları, İctihad, no: 50, 16 Kanuni Sani 1328/29 Ocak 1913*

gezarîyek peyda kiribû. Pîlana îslehetê di Sibata sala 1914an de wek qanûn hate erêkirin. Rêvebirên osmanîyan jî, ji bo nûtralîzekirina tevgera ermenan, di nav milletên misilman û bi taybetî jî yê kurdan de gotar û propagandayeke nû dan destpêkirin û gotin: “Dê Kurdistanê bikin Ermenîstan.” Bêguman vê gotara wan, tesîreke girîng li ser civaka kurd kir. Bandora vê gotarê, pîlan û teşwîqên nihênî yên rêvebirên dewletê; paşê bûn sebebê bikaranîna şîdeta girseyî, çêbûna hinek bûyerên civakî û tevkujiya ermenan.

Digel ku dewletên Awrupayî û Rusya bi meseleya ermenan re mijûl dibûn, her yek ji wan li gor sîyaseta xwe ya li ser herêmê, bi hev re di nav reqabeteke dijwar de bûn, xwedî ajanda û hesabên taybet bûn. M. Rifat ê xwediyê rojnameya *Serbestî*, encama nakokiyên sîyaseta dewletên navborî li ser ermenan weha tîne ziman: “Di navbera reqabeta sîyasî ya Îngiliz, alman û rûsan de kê-m-zêde ermen hatine perçiqandin. Ji ber ku ermen bi dîplomasîya Awrûpîyan hatin xapandin, felaketek xemgîn bi ser wan ve hat.”¹⁹³

Ji ber van nakokî, dijayetî û hewldanan meseleya Kurdistan û Ermenîstanê, ji Peymana Berlînê şûn ve, bû meseleyeke girîng û rojane ya sîyaseta osmanî û navdewletî. Lêbelê ew cografya ku di çavkanî û çapemenîya ermen û Awrûpîyan de wek erdê Ermenîstanê dihate nîşandan, heman demê beşeke girîng a cografya Kurdistanê teşkîl dikir. Vê rewşa hanê, di navbera kurd û ermenan de munaqeşe û nakokîyek nû da destpêkirin. Di dema Şerê Cîhan ê Yekemîn de, ji aliyê hikumeta Îttihad û Terakkî ve fermana “tehcîrkirina” ermenan hate derxistin û di dawîya vê tehcîrê de tevkujiya ermenan çêbû. Dr. Nûrî Dêrsimî dibêje: “Di pêvajoya çar salên Şerê Yekem de, hemû biryarên Îttihad û Terakkî ji aliyê Teşkîlatê Mahsûsa ve dihatin tetbîqkirin... Qetlîama ermenan di 15yê Adara 1915an li herêma Zeytûn dest pê kir, peyderpey li gelek herêman belav bû û hetanî dawîya sala 1916an dewam

¹⁹³ *Mevlanzade Rifat, Türkiye İnkılabının İçyüzü, Pınar Yayınları, İstanbul, 2000, r. 90-91*

kir.”¹⁹⁴ Ev tevkujî û tundrewîya ku ji aliyê hikumeta Îttihad û Terakî ve li hemberê ermenan hate pêkanîn, encama sîyaseta merkezîbûn û damezirandina netewe-dewlet a tirk bû.

Hikumeta Osmanî û peyrevên wan, di platformên navdewletî de her carê hewl didan ku tawanên xwe yê di derheqê tevkujiya ermenan de bidin ser piştta kurdan. Ji ber ku kurd milletekî bêdewlet bû, rêxistinên wan ên sîyasî û hewldanên wan ên dîplomatîk jî pirr lawaz bûn, dengê wan gelek kêr derdiket. Gelek dîrokzan û pisporên tevkuji û jenosîdê, rastîyek pirr girîng dîyar dikin û dibêjin; pêkanîna jenosîdê ancax bi destê rêxistinên wekî dewletan mimkun dibe.

Ji ber ku wê demê çapemenî û ragehandina kurdan gelek lawaz bû, kurdan nedikarî deng û raya xwe bilind bikin, derewên rayedarên Osmanî û paşê jî yê Cîmhuriyetê pûç bikin. Piştê bidawîhatina Şerê Yekemîn, tenê bi rêya rojname û kovarên wekî *Jîn*, *Kurdistan* û *Serbestî* gotin û dîtinên xwe dianîn ziman, buhtan û manîpulyasyonên rêvebirên osmanî û rêxistinên ermenan diderewandin.

Dema em li ser meseleya Kurdistan û Ermenîstanê, bala xwe bidin dîtin û nivîsên rewşenbîr û rûpelên çapemenîya kurd, xuya dibe ku bi awayekî giştî û di dereceya yekemîn de serî li çavkanîyên herêmî û raportên lêkolînerên rojavayî dane. Piştî çêbûna Peymana Mondrosê, amedekarî û hewldanên ji bo Konferansa Aşitî ya Parîsê dest pê kirin. Her aliyek parastina pêkanîna daxwaz û dîtinên xwe dikir. Di vê hengameyê de, di navbera kurd û ermenan de jî têkoşîn û hewldana dîyarkirina îstatîstîkên serjimêrîyê dest pê kirin û di pêvajoya berîya Konferansa Aşitîyê de gihîştin qonaxa tewr bilind. Rojnameya *Serbestî* û nivîskarên wê jî, wek aliyê kurd tevî van gotûbêjan dibin, Kamiran Bedirxan di çar hejmarên *Serbestîyê* de daxwaz û dîtinên xwe yê li ser vê babetê tîne ziman û dibêje:

¹⁹⁴ Dr. Nûrî Dêrsimî, *Hatiratim [Bîranînên Min]*, Weşanên Doz, 1997, Stenbol, r. 84-85

“Pêr hejmara nû ya rojnameya *Îstîqlalê* hate belavkirin, di nav de xerîteyekî balkêş ji bo xwendevanan bi unwanê “dê şiklê nû yê xerîteya dinyayê çawa be”, ji “Jurnal” a ku li Parîsê tête weşandin hatibû neqilkirin. Nûha em dê beşek ji wê xerîteyê bînin ber çavê we; ev beş di bin unwanê Ermenîstanê de, Kurdistan jî digre nava xwe.

Divê li Kurdistanê, mewcudîyeta dîrokî û nifûsa milletên di pênc wîlayetên navborî de li gor ûsilên îlmî bête mihafezekirin û parastin. Millet û mîllîyeta kurdan bête beyankirin û ragehandin. Xweşî û aramîya kurd û tirkên jî bi vî awayî çêdibe, tenê bi vî awayî.

Mixabin ev xala girîng û zindî, vê gavê tête îhmalkirin. Milletên ermen û kurdan bi muhabbeteke dêrîn bi hev ve girêdayî ne, tenê kurdek jî nîne ku bixwaze hiqûqê vê milleta ezîz bête binpêkirin. Lêbelê divê hiqûqê milletê kurd jî bête parastin û rê li ber îhmalkirina vê hiqûqa muqader bête girtin. Heqê ku heq be muhterem e û piştî ku nifûs jî bête qebûlkin, hereketê yekane yê ku ji bona heq bête kirin, qebûl û tayînkirin e.

Wîlayetên Kurdistana Tirkîyeyê ji Erzerum, Wan, Bedlîs, Diyarbekir û Elezîzê pêk tînin û rastîyên di derheqê van wîlayetan de ji alîyê gelek pispor û mutfekîrên Awrupayî ve bi awayekî zanistî hatine beyankirin û îzehkirin.

Em hêvîdar in ku îdare û şiklê nû yê Kurdistanê, li gorî pirranîya nifûs û esasên îlmî û dîrokî be.

Dema ku mewzu muxtarîyeta ermenan be, bêtir behsa sê wîlayetan dibe; Wan, Bedlîs û Erzerum. Lêbelê di van her sê wîlayetan de jî, xelkê ermen ne qasê nivê xelkê din e. Li gor lêkolînerê îngilîzî Linc, hejmara ermenan ne zêdeyê ji % 37an e. Bi dîtina pisporê Rusan jî, rêjeya ermenan digîje hetanî ji %39an. Lêbelê li gor agahdarîyên nivîskar Ardofê endamê rêxistina Taşnaqiyan, hejmara ermenan ji %20 e.”¹⁹⁵

¹⁹⁵ Kamiran Âlî Bedirhan, *Kürdistan-I, Serbestî*, no: 186, 26 Kanûn-î Evvel 1918

“Li gorî meqaleya nivîskarê navdar ê Rus Mr. Oçîn ku di rojnameya “Newiye Vermiyo” de hatiye belavkirin, dibêje: Di wîlayetên wekî Wan, Bedlîs û Erzerumê de pîranîya nifûsê kurd in.

Ji ber vê, muxtarîyetîya Ermenîstanê, ji muxtarîyetîya Kurdistanê pêve ne tiştek e.

Mîralayê Îngilîzî Trotter jî di lêkolîna xwe ya li ser wîlayetên Şerqê de dibêje: Her çiqas li Ermenîstanê geryam jî, min Ermenîstanek nedît.

Nivîskarê navdar ê Amerîkayê Web Word jî dibêje: Ermen tenê di nehiyeyek de jî pîrranîya nifûsê teşkîl nakin. Dema em bala xwe bidin vê rewş û van rêjeyan, dîyar dibe ku ew kesên li paytextên Awrupayê propaganda muxtarîyeta Ermenîstanê dikin, çiqas xîyalperest in.

Muxtariyeteke wisa, tenê tête wateya erêkirina serdestiya kurdan.”¹⁹⁶

“Profesor Cons Mol, di pirtûka xwe ya li ser Antolyayê de ku ji gotarên rêzekonferansên wî yên Londrayê pêk hatîye, dibêje: Yên ku dixwazin behsa Ermenîstanekê bikin, ez li wan deran ewqas geriyam ne ku Ermenîstanek, rastê pîrranîbûna ermenan jî nehatim.

Li bajarê Wanê ermen kêmanî bûn, li Diyarbekir û Mamuretûl Azîz û Bedlîs û Mûsilê jî wisa ye, li Erzerumê jî hemû deran bêtir kêmanî bûn.

Nûha em dê behsa kîjan Ermenîstanê bikin?”¹⁹⁷

“Rojnameya “*Jurnal Deba*”, beyanata berfireh a serokê delegasyona Kurd ji bo Konferansa Sulhê ya Parîsê (Şerîf Paşayê Kurd) çap kirîye û dibêje; li gorî navero-ka pirtûkên bi wêne yên ku di pêşiya Herbê Umûmî de hatine çapkirin, pîrranîya nifûsê xelkê şeş wîlayetên başûrê Anatolyayê, ji kurdan pêk tê.

Piştî belavkirina vê beyanatê, rojnameya *Mayn* jî di sermeqaleya xwe de li ser rewşa mewcûd weha gotîye: Ne ku rewşa piştê Herbê Umûmî, berîya pêkhatina tehçîr û kuştinan jî, pîrranîya nifûsê wîlayetên navborî, ne er-

¹⁹⁶ Kamiran Âlî Bedirhan, *Kürdistan-II, Serbestî*, no:188, 28 Kanun-î Evvel 1918

¹⁹⁷ Kamiran Âlî Bedirhan, *Kürdistan-III, Serbestî*, no: 193, 2 Kanun-î Sanî 1919

men bûn. Ji ber vê, ku bêjin bila pirranî bikeve bin hûk-
mê kêmanî, ev ne adilane ye û ne mimkun e.’

Dawîyê em wisa bawer dikin; îro ji bo kurdan ew heqên
esasî yên ku hatine erêkirin û qebûlîkirin, dê bi awayek
berfireh roj bi roj bi pêş kevin, di demeke kin de kurd jî
wekî hemû milletan dê ji hiqûq û rastiyên rewşa dîrokî
û îroyîn, ji pirranîya nifûs û mewcudîyeta xwe ya mîllî
îstifade bikin.”¹⁹⁸

3. 8. Rewşa bîr û raya di Kurdistanê de

Kamiran Bedirxan di nivîsên xwe yên *Serbestîyê* de, behsa
rêjeyek pirr zêde ya nameyên xwendevanan dike ku ji Kur-
distanê ve ji bo rojnameyê hatine rêkirin. Naverok û babeta
pirranîya wan nameyan, bîr û rayên kurdên li Kurdistanê tîne
ziman. Ji ber vê, Kamiran Bedirxan bi sernivîsa “*Rewşa bîr
û raya di Kurdistanê de*”, meqaleyek nivisandîye û di nav de
behsa naveroka wan nameyan dike. Ji wan nameyan yek jî, li
ser navê Elî Kurdî, ji qeza Kebana Elezîzê hatîye rêkirin. Ka-
miran Bedirxan, bi giştî behsa wan nameyan dike û bi taybetî
jî li ser nameya Elî Kurdî dibêje:

“Ji Kurdistanê ve nameyên bêhejmar ji me re tên. Xwe-
dîyên van nameyan, endamê tebeqeyên muhtelif ên ci-
vakê ne û di qenaet, nêrîn û şiroveyên wan de yekgirti-
nek balkêş xuya dibe.

Nameyên ku bi navên cihê cihê ji me re hatine rêkirin,
wekî mecmuayek zihnîyetên ku bi hev re difikirin û tev-
digerin e.

Em wisa dibînin ku di navbera qenaetên me û qenaetên
welatîyên ku ji muqaderata dilêş a dîrokê hişyar bûne
û ji karesatan ders wergirtine de, samîmîyet û hevgir-
tineke kûr heye. Vê yekgirtinê dilînî û xweşhalîyek ru-
hanî da me.

Qenaetên muşterek ên kurdan ev in. Di nameya ku bi
navê Elî Kurdî ji Kebanê ve hatîye rêkirin de, eynen
wisa dibêje:

¹⁹⁸ Kamiran Bedirhan, *Kürdistan, Serbestî*, no: 462, 7 Nisan 1919

'Ez naxwazim behsa rabihurîya Kurdistanê bikim. Lewra di rewşeke dilşewat de bû. Em ji sazîyên medenîyetê yên wekî dibistan, medrese, rê, kanî, xestexane, kitêbxane, xanîyên seadetê, teraqî û muvaffaqîyetê mehrûm bûn.

Di halê hazir de jî, ji ber şer û tehcîrkirinê, welatîyên me di halekî sefil û sergerdan de ne.

Milleta me rastê muameleyên bêmerhamet û zalim hatine û ji wasîteyên jîyanê yên wekî ga, hesp, pez û wd. hatine mehrûmkirin; hemû serwetên wan ji destê wan hatine girtin.

Zulm û facîayên ku bi serê ermenan ve hatine, bêteredûd bi serê kurdan ve jî hatine.

Berîya çar salan zulma ku tenê li Bedlîsê hate serê şêx û eşrafan, her alîyê Kurdistanê tarûmar kirîye.

Tenê li navenda wîlayeta Bedlîsê, ji alîyê zabitên bêwijdan ên Îttîhad û Terakkî ve ji milleta me yê kurd 12.000 hatine kuştin.

Rehma Xwedayê gewre, li ser şehîdên ezîz û birayên me yên paknijad ên qehreman be ku mirinê tercîhê jîyana bindestî kirin.

Bala xwe bidin van bûyerên dilêş, bi her awayî hewl didin ku kurd careke din nebin pêleyistika li ber destê bêwijdanan. Ji bo ku Kurdistan; bi mal, can û hemû hebûna xwe ve bi şerefa xwe bijî, amade ye ku her fedekarîyê bike. Em bi her awayî piştgirîya we dikin.'

Ev peyv, bi bawerîyeke bêguman û ji kûrayîya ruh ve hatine gotin.

Eger hûn bixwazin ez dikarim bi rêzikekê daxwaza hemû kurdan ji we re bibêjim: "Mirin lêbelê mirineke muhterem û azad." Ev dengê ku ji navenda Kurdistanê ve tête, rewşa bîr û raya îroyîn gelek baş dide nîşandan û heq e. Em vê heqîqetê dubare dikin û her dem dibêjin. Kurd dixwazin jiyanekê azad û rêzdar bijîn, dê hîç demekê tecawizê hiqûqê eslî yê milletekî nekin.

Di qabîliyetên hizrî yê çalak û armanca kurdan de, memleketek mezin ê berfireh (yekgirtina osmanî), xîyalên millî yê ronîdar, nikare ji xwe re bingeha geşbûn û îstînatê [xwesipartinê] bibîne.

Bila her millet azad be, hemû heq bêne qebûlkin û hîc kesek tecawizê heqê kesekî din neke. Em hiqûqa xwe ya millî dixwazin. Her millet vê dixwaze û bi vî ruhî tev digere. Ew ên ku bibêjin kurd heqê xwe yê millî naxwazin, kenîna mirov bi wan tê.

Divê em xwe biparêzin li hemberî manîpulyasyonên nîşandana nefretê. Dê heqê millî yê kurdan, ji aliyê rêvebirên adil û rêzdarên hêzên gewre yê cîhanê ve bête qebûlkin. Daxwazên me heq in, em bi rehetîya wijdana heqaniyetê li benda biryara adilane ya îstîqbalê ne. Enîya her kurdekî vekirî ye, bawerîya wî temam û wijdana wî musterîh (rehet) e.”¹⁹⁹

3. 9. Reformkirina zimanê kurdî

Xebatên li ser kultur û pêşxistina zimanê kurdî, piştî Meşrûtiyetê bi awayekî hîn serûber û bi rêxistinî hatin kirin.

“Piştî îlankirina Meşrûtiyetê, ji bo îsleh û standardkirina kurdî, Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û hin rêxistinên din hatibûn damezirandin. Van rêxistinan di dema destpêkirina Şerê Giştî de xebat û weşana xwe dabûn rawestandî. Bi dawîhatina Şerê Giştî şûn ve, van rêxistinan bi belavkirina kovara *Jînê*, dest bi berdewamkirina xebata berê kirin.

Komeleya navborî ji berê ve dixebitî ku li ser esasê cihê nivîsandina herfan, gramereke zimanê kurdî binivîsîne û bide çapkirin. Alfabe hatîye amadekirin û hetanî çend rojên din dê bête çapkirin. Alfabe ya ku niha tê çapkirin, ji alfabe ya berê bêtir mifedar û mukemeltir e. Em mutesebis û nivîskarên wê pîroz dikin.”²⁰⁰

¹⁹⁹ Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'da Fikir Durumu [Kurd û Kurdistan: Rewşa bir û raya di Kurdistanê de]*, Serbestî, no: 477, 26ê Nisana 1919

²⁰⁰ *Kürd Lisanının Tedvini [Standardkirina zimanê kurdî]*, Serbestî, no: 480, 4ê Gulana 1919

Kamiran Bedirxan jî di nivîsa xwe de behsa girîngîya xebata vê komeleyê û karê standardkirina zimanê kurdî dike û dibêje:

“Em bi balkêşîyeke mezin civîn û xebata li ser şiklê grammer û îslehkirina herfên zimanê kurd dişopînin ku di navenda Cemîyeta Tealîya Kurdistanê de berdewam dike.

Di cedwela xebata ku ji bo temînkirina pêşkevtina de-haya neteweyî ya kurdan tête kirin de, girîngîpêdana îslehkirina herfan, sererastkirina grammerê hêjayê memnunîyeteke fewqalede ye.

Êdî naveroka azadbûn, bextîyar û mesûdbûna milletan, rasterast meseleyeke perwerde û ronahîya medenî-bûnê ye.

Ew milletên ku zimanê xwe reforme bikin, qafdeyên gramera xwe sererast bikin, herfên sade û sivik çêbikin, hîç astengek li ber îstiqbal û pêkhatina hêviyên wan namîne. Di halê hazir de ew milletên ku bi eserên xwe yê medenî bûne sebebê heyretê, ew jî demekî ji aliyê îlmî, sinayî, komelayetî û sîyasî ve di rewşek gelek perîşan de bûn.

Ev rêya rizgarî ya ku îro em pêde diçin, her milletekî di vê rê de tûşê problemên gewre û hetta ji yê me gewretir jî bûne.

Ji bo serkevtin û bidestxistina mewqîyeke rêzdar, her daîm fedekarîyek mezin lazim e. Di rastîyê de şerefa serkevtinê, bi têkoşîn û hewldana ji bo berhemanîne mimkun dibe.

Ne mimkun e ku mirov bi hewldaneke biçûk muwaffaq bibe.

Îro zanistîya giştî temîna paşeroj û îqbalê cemîyetan e, kurd jî girîngîya vê yekê dizanin û nîşana wê ya herî girîng jî, têkoşîn û hewldana wan a ji bo îslehkirina zimanê kurdî ye.

Di vê xebatê de xusûsiyetek tewr girîng ê ku komîsyon dîqet bike ev e: Alfabeya ku ji bo xwendin û nivîsandina

kurdî bête duristkirin, divê gundî jî karibin di demeke kurt de bi wê alfabeyê hînê xwendin û nivîsandinê bibin.

Li gorî agahdarîyên me, heyeta navborî piştî gelek tecrûbeyan, bi wergirtina biryara îslehkirina meseleya herfan, îstiqameta xebatê dîyar kirine.

Meseleyeke tewr dijwar a komeleyê jî, şikl û rêbaza alfabê ye; gelo ev alfabe dê ji milê çepê ber bi milê rastê ve yan ji milê rastê ber bi milê çepê ve bête nivîsandin. Dema em bala xwe bidin girîngîya vê babetê, divê em bi hîssa faalîyeteke azamî û têgihîştineke nûjenîyê tevbigerin.

Divê em bala xwe bidin girîngîya rewşê, bi nûjenî û hîssên xebateke azamî tevbigerin.

Ji xeynî serkevtinê, divê her qenaet û îctihadên batil ji bo hîssên nûbûnê bêne fedakirin.

Esasen dîne Îslamê jî dibêje; bi şertê ku mixalifê emir û hukmên bilind ên îlahî nebe, li gorî pêdivîyên zeman, usilên minasib tetbîq dibin.

Hetta mirovên alim, mutefekîrên maqûl û nûjen, karin bibin mutefîq û tesdîq bikin ku ev yek li gorî Quranê ye jî. Di vê xebatê de, pêwîst e em berê xwe nedin wan rêyên ku qebûlkirina wan ne mimkun be, bi şertê ku pêjnên ruhî û temayulên kurdan rencîde nebe, em karin usilên musaîd ên ku hînbûn û perwerdeyîya kurdî hêsantir bikin bînin wucidê. Bi rastî selehîyet û ehlîyeta ew şexsîyetên ku bi van meseleyên îlmî re meşxul in; têrî serrerastkirina reformekirina ziman, rêkûpêkkirina herfan dike û ev bûye mecburîyetîyeke pêdivî.

